



Naverok

Sal 5 • Hejmar 17 • Havîn 1999

Hesenkêf dê di bin avê de bimîne! 3

Osman Aytar

Ez şelafiyê naxwazim 9

Werger, Mustafa Aydogan

Ji "El Kamil fi el tarîx" 16

Emîn Narozi

Edebiyat û hîndariya zanistiyê 27

N. Zaxuranî

Bîranîna sibehekê 35

Siddik Bozarlan

Li rê 42

Werger, Serdar Roşen

Dema ku hêj dê were pêşeroj e yan paşeroj e? 46

Zeynelabidîn Zinar

Piştî darbeya 12ê îlonê li Ewrûpayê ziman û edebiyata kurdî 51

Zekî Bozarlan

Şihrek ji Îbrahîm R.Zaxoyî 71

Şihrek ji Xidirê Ūso 73

Kitêbeke nû "Autobîografiya Ebdurrizaq Bedirxan" 75

Malmîsanij

Gawestî 77

Huseyîn Kîşnîş

"Bi haweyê tirkî!.." 79

Laleş Qaso

Sal 5
Hejmar 17
Havîn 1999

Xwedî

Komeleya Nivîskarên Kurd
li Swêdê

Redaksiyon

Laleş Qaso
A. Gernas
Zinar Soran

Şertên abonetiye

Salek: 200 SEK
Niv sal: 100 SEK
Hejmarek: 50 SEK
*Ji bo welatên din mesrefa
posteyê lê zêde dibe.*

Îlan

Rûpelek: 1 000 SEK
Niv rûpel: 500 SEK
Çarîk rûpel: 200 SEK

Pergala rûpelan

Laleş Qaso

Rismê bergê pêşî

yê jor: Hesenkêf (Gabriel, 1932)
yê jêr: Hesenkêf (N. Bilici, 1999)

Postgiro

46 32 31-1

ISSN

1400-528X

Çap

Apec-Tryck

Berpirsiyariya her nivîsê, ya nivîskarê/mivîskara wê ye.

Navnîşan • Adres • Adress:

Box 2015, 176 02 Järfälla/SWEDEN

Hesenkêf dê di bin avê de bimîne!

Osman Aytar

Dewleta Tirkiyê îsal dest bi avakirina Santrala Hîdroelektrîk û Bendava Ilisuyê ku beşek ji projeya GAPê¹ ye dike. Projeya Ilisuyê dê li ser ava Dîcleyê li herêma Hesenkêfê ava bibe û piştî Santral û Bendava Atatürkê, santral û bendava herî mezin e.² Li gor plana îroyin, bajarê Hesenkêfê dê temamî di bin ava bendavê de bimîne.

Tirkiyê di sala 1996an de bi riya "yap-işlet-devret" (çêke-birêvebibedewrke) xwest ku ji Ilisuyê re şîrîkên navneteweyî bibîne. Konsorsiyûma ku ji şîrketên Îswîçreyî, Sulzer Hydro û ABB (şîrketeke Swêdî-Îswîçreyî) pêk tê peyman çêkir. Hin şîrketên din jî, wekî nimûne Balfour Beattie ji Îngiltereyê, Impregilo ji Îtalyayê, Skanska ji Swêdê û Nurol, Kiska û Tekfen ji Tirkiye, wekî aliyên din dê di avakirinê de cih bigirtana. Paketa fînansmanê dê ji aliyê Banqeya Yekîtiya ya Îswîçreyê (Union Bank of Switzerland-UBS) bihata organîzekirin. Lê şîrketan ji ber rewşa siyasî ya Kurdistanê Bakur "garantiya rizîkoyê" ji hukûmeta Îswîçreyê dixwestin. Parlamentoya Îswîçreyê jî di dawiya sala 1998an de ev garantiya da şîrketan û bi vê biryarê pêvajoya avakirina Ilisuyê dest pê kir. Li gorî planan avakirin dê di nava 1999an de dest pê bike û di nava 2006an de temam bibe.³

Avakirina Ilisuyê jî wekî projeyên GAPê yên din bêyî ku lêkolîneke bi rêk û pêk di derbarê tesîrên santral û bendavê de bê kirin dest pê dike. Herçend berdevkên dewletê dibêjin ku wan hin "lêkolîn" çêkirine jî, li gor hin pivanên navneteweyî ku Tirkiye bixwe jî teref e, di vî warî de texrîbatên mezin dê bîn holê.

Wekî proje, Santral û Bendava Ilisuyê ji destpêkê heta nuha di plan û programên di derbarê GAPê de cih digirt. Herweha ji destpêkê heta nuha jî êşkerekê bû ku ger ev proje li gor plan û programan bê çêkirin dê bajarekî wekî Hesenkêf di bin avê de bimîne. Dewletê biryara xwe ya ku di sala 1978an de

Hesenkêf wekî warekî ku divê bê parastin îlan kiribû jî da aliyekî û ziddê wê tiştan dike. Herçend demekî li Istenbulê ji bo xelaskirina Hesenkêfê komiteyek ava bû û nuha jî ji bo Hesenkêfê însiyatîfek hebe jî dewleta Tirkîyê guhdariya kesî nake. Bi navê parastina "tarîxa Tirkî" be jî di rapora parlamentoya Tirkîyê ya di derbarê jîngehê (1991)⁴ de hate xwestin ku Hesenkêf di bin ava Bendava Ilisuyê de nemîne, lê yên xwedî desthilat di planan de guhertin çê nekirin. Carcaran hin reaksiyonên ku ji gelê Hesenkêfê hatin jî tesîr li ser planan çê nekirin.

Rewş îro hatiye wê merheleyê ku êdî talûke di musteweya planan de nin e, hêdî hêdî dê derbasê jiyane bibe û ger rê li ber neyê girtin ava Bendava Ilisuyê wê wekî hûtekî bajarê Hesenkêfê daqultine.⁵ Bi navê "kolînên arkeolojîk ên xelaskirinê" hin tişt hatine kirin û hin teklîf hene ku jimayîyan ji cihên wan barbikin, lê ev gav û pêşniyar ji rastiya bûyerê pir dûr in. Çûnkî bajar bixwe dê di bin avê de bimîne. Di vir de ji bo dewletê him berjewendiyên aborî him jî yên siyasî giring in, bi gotineke din di gel berjewendiyên aborî aliyekî mîrata Kurdistanê tê texribkirin, aliyekî din jî ava Kurdistanê li hember Suriyê û Îraqê tê bikaranîn. Ji bo şîrketên navneteweyî jî berjewendiyên aborî giring in. Ji bo vê yekê jî guh nadin hin prensîbên ku di peymanên navneteweyî de hene.

Wekî santral û bendavên din tesîrên projeya Ilisuyê yên li ser jiyana xwezayî û mirovî jî giring in. Lê ji ber ku min di nivîseke xwe ya din de ku bi sernivîsa "Di pratîka GAPê de girîngiya pirsê jîngeh" di hejmara 8an ya Çirayê de hatibû weşandin, behsa van tesîran bi awayekî giştî kiribû û ew ji bo Santral û Bendava Hesenkêfê jî aktûel in, li vir ez dê nekevin behsa pirsên weha.

Ji aliyê texribatên tesîrên avakirina santral û bendavan ên li ser mîrata tarîxî û kulturî, Hesenkêf dê nebe nimûneya yekemîn. Di avakirina hin santral û bendavên din de jî, wekî santral û bendavên Keban, Karakaya û Atatürk, hin bajar, gund, jimayiyên tarîxî û kulturî di bi avê de man. Bajarekî wekî Samsatê û warê wekî Newala Çolî jî tê de gelek warên antîk di bin avê de mabûn.⁶

Bajarekî antîk, muzeyeke servekîrî

Li vir êz dê bi dûrûdirêj behsa tarîxa Hesenkêfê nekim, ji xwe mebesta vê nivîsê jî ne ev e û ev dikare bibe mijara nivîseke din. Lê cardin jî ji bo ku musteweya talûkeya ku nuha li pêşiya Hesenkêfê ye bi xetên giştî bê

fêmkirin pêwistî bi hin agahdariyan heye.

Hesenkêf bi mîrata xwe ya tarîxî û kulturî ne tenê di medeniyeta Kurdistanê de herweha ya di Mezopotamya û herêmê de jî xwediyê cihekî giring e. Hesenkêfî ji Asûriyan heta Kurdan ji gelek medeniyetan re malîtî, heta ji hinekan re paytextî kiriye.

Li gor hin agahdariyan Hesenkêf xwediyê tarîxeke zêdeyî pênc hezar sal e. Di van pênc hezar salan de gelek medeniyet û kultur hatine, jiyane û li gor xwe mîratên giranbuha li dû xwe hîştine. Bîzansî, Abbasî, Merwanî, Sasanî, Asûrî/Suryanî, Artûkî, Eyyubbî û Kurd ji van ên herî bi navûdeng in.⁷

Li gor Ansîklopediya Îslamê di Çaxê Pêşî yê Klasîkî de navê bajêr Cefha (Cefa) bûye û di belgeyên Konsilê Khalkedonê (nuha navê wê "Kadiköy"e) de navê wî wekî merkeza Metraniya (piskoposîya) Suryaniyan derbas dibe. Di wê demê de gelek dêr li herêma Hesenkêfê hebûne. Hesenkêfî desthilatdariya Ebbasiyan, Hemdaniyan, Merwaniyan û Artûkiyan jiyaye û ji Artûkiyan re paytextî jî kiriye. Ji ber şikeftên xwe yê bi navûdeng ku ji bo parastinê cihên baş bûne, her dem bala hukumdarên kîşandîye ser xwe. Hesenkêf carek ji aliyê Îlhaniyan hatiye wêrankirin. Herçend di destpêka sedsala 16an de ketiye destê Safewiyan jî, ew dem dirêj neajotiye û di sala 1516an de bi alîkariya hin beg û serokeşîrên Kurdan, Hesenkêf ketiye destê Osmanîyan.⁸

Li gor çavkaniyeke din berî desthilatdariya Îslamê, Hesenkêf di destê Bîzansiyan de bûye. Di pey desthilatdariyên Emewîyan, Ebbasiyan, Hemdaniyan û Artûkiyan, Hesenkêf di sala 1232yan de ketiye destê Eyyubiyên ku beşek ji berdewamiyên xanedaniya Selahaddin Eyyubi bûne. Herçend piştî sala 1260î demek Moxalan, di navbera 1461-1482yan de Akkoyuniyan li herêmê desthilatdarî kiribe û texrîbatên mezin dabin herêmê jî heta sala 1524an desthilatdariya hukumdarên Eyyubîyan dewam kiriye. Piştî ku Osmanîyan li herêmê li gor berjewendiyên xwe sistemê daniye, Hesenkêf bûye qezayekî wîlayeta Diyarbekirê û giringiya xwe ya siyasî jî wenda kiriye.⁹ Di demên dawî yê Osmanîyan de Hesenkêf êdî bajarekî ku girêdayî qezayê Mîdyatê bûye. Di dema komara Tirkîyê de jî heta sala 1990î Hesenkêfî ev statuya xwe domandiye û di 1990î de bûye qeza û bi wîlayeta Batmanê ve hatiye girêdan.¹⁰

Hesenkêf îro jî bi jimayiyên pir û kela xwe yê bi navûdeng; bi jimayiyên mizgef, qesr, tîrb, zaviye, hemam û avahiyên xwe yê antîk, yanê bi kurtayî bi mîrata xwe ya tarîxî û kulturî wekî muzeyê servekirî tê qebûl kirin. Ev

çend wêneyên¹¹ ku em li vir diweşînin nîşanên wê yekê ne da ku mîratekî çawa nuha li ber talûkeyê ye. Herçend hin beşên jimayiyên ku di wêneyên Albert Gabrieli¹² de hene nuha nemabin jî, Hesenkêf hîn jî wekî muzeyeke servekirî tê qebûlîkirin.

Ji van Pira Hesenkêfê ku di dema xwe de bi navûdeng bûye, cara pêşîn di dema êrîşên Moxolan de xera bûye. Ji ber ku di hin çavkaniyan de pesnê vê pirê tê dayin û bi gotinên xweşik behsa wê tê kirin, wekî nimûne di *Şerefnameya Şerefîxanî û Cihannûmaya Katîb Çelebî* de, tê gotin ku piştî êrîşên Moxolan Pira Hesenkêfê hatiye tamîrkirin, lê tarîxa xerakirin an jî xerabûyina vê pirê nayê zanîn. Tiştê heye ku di dema seyheta General Moltkeyê¹³ de Pira Hesenkêfê li ser ligan nebûye. Gabrieli di sala 1932yan de di rismekî temsîlî de cihên hilweşiyayî yên pirê tamam kirine.¹⁴

Hesenkêf divê bê xelaskirin

Di vê pirsê Hesenkêfê de jî careke din derket holê ku di vî warî de berê herkesî divê Kurd bixwe, bi partî, rêxistin, komel, waqîf û sazîyên din ên xwe xwediyê helwesteke eşkere û aktîf bin. Parastina jiyana xwezayî û mirovî, parastina mîrata tarîxî û kulturî di gelek peymanên navneteweyî de pir bi zelalî hatiye îfadekirin ku Tirkiye bixwe jî di beşek mezin ên wan de şîrîk e divê êdî bibe beşek ji karûbarê rojane û dîrûdirêj.

Dikare bê gotin ku li Kurdistanê tu garantiya jiyana mirovî tune ye, Kurd bixwe ji hemû maf û azadiyên neteweyî û demokratîk bêpar in. Ev rast e û li gor baweriya min pirsên mîrata tarîxî û kulturî, pirsên parastina jiyana xwezayî û mirovî jî bi vê rewşê ve girêdayî ne. Pirs û pirsgirêkên weha, riyên çareserîkirina wan ne li hember hev in, ne jî alternatîfê hev in; ew hevûdu tamam dikin.

Ji ber vê yekê jî bi helwest û hewldana ji bo Hesenkêfê divê di vî warî de rûpeleke nû bê vekirin. Tû hedef û karûbarê siyasî, desena çalakîyên rojane û berjewendiyên partîtî, grûbî û şexsî divê nebe asteng ku di vî warî de vatînî û berpîrsiyarî neyên bicihanîn.

Bûyer û pirs eşkere ye. Gelek tişt di bin avên bendavên Kebanê, Karakayayê û Atatürkê de man. Nuha jî Hesenkêf li ber talûkeyeke mezin e. Li gor planan li herêmên din jî talûkeyên weha dê derkevin pêşîya me. Ji bo vê yekê jî xelaskirina Hesenkêfê dê eslê xwe de ne tenê bi wê ve sînorkirî be, dê bikaribe bi xwe re encamekî wusa bine ku dewleta Tirkiyê û hin şîrketên navneteweyî nikaribin bi vê rehetiyê bi mîrata me ya tarîxî û kulturî



Bazara kevn a Hesenkêfê (Gabriel, 1932)

bileyizin, wê qetil bikin û jiyana xwezayî û mirovî ya li Kurdistanê bixin bin talûkeyên mezin.

Jêrenot:

¹ *Güneydoğu Anadolu Projesi - GAP* (Projeya Anadoluya Başûrê Rojhilat), ji aliyê dewleta Tirkîyê li Kurdistanê Bakur li ser avên Ferat û Dîcleyê tê avakirin. Li gor planên resmî GAP ji 22 bendav û 19 santralên elektrîkê pêk tê.

² Li gor planan ji Santral û Bendava Ilisuyê dê salê 3 milyar û 830 milyon kîlowattseat enerjî bê bidestxistin.

³ Ongan, Ali, "İsviçre de GAP'a Ortak Oldu", *Özgür Politika*, 3 Aralık 1998, Almanya; dokumenteke agahdariyê ji grûbeke İsviçreyê ya bi navê *Berne Declaration*, November 1998.

Li gorî bangeke rêxistina *Friends of the Earth* (March 1999), hukûmeta Îngiltereyê jî piştgiriya xwe daye şirketa Îngilîz a ku dê di avakirina Ilisuyê de cih bigre. Nuha û di pêvajoya avakirinê de mumkun e ku hin şirketên welatên din jî beşdarî karûbarê avakirinê bibin.

⁴ Somersan, Semra (1993), *Türkiye'de Çevre ve Siyaset*, Istanbul: Metis Yayınları, rûpel 237-238

⁵ Li gor hin agahdariyan, beyî bajarê Hesenkêfê, 67 nehiye, gund û mezra jî dê bîn avê de bimînin.

⁶ Ji bo agahdariyên berfireh ên derbarê xesaretên projeyên GAP'ê ên li ser mîrata kulturî û tarîxî binêre: Aytar, Osman (1995), "GAP û Mîrata Kulturî", *Çira*, hejmar 1, adar 1995, Stockholm, rûpel 81-86; Aytar, Osman (1991), *Kürdün Makûs Talihi ve Güneydoğu Anadolu Projesi*, İstanbul: Medya Güneşi Yayınları

⁷ Somersan, 1993:238

⁸ *İslam Ansiklopedisi*, Cilt 5, Kısım 1, Milli Eğitim Basımevi, İstanbul 1977, rûpel 452-454

⁹ Pêvajoya ku di encamê de nemana giringiya siyasî ya Hesenkêfê bi xwe re tine, ji gelek aliyan balkêş e û ew di *Şerefnameya Şerefxanî* de weha tê behskirin: Piştî ku Osmanî Hesenkêfê jî tê de li herêmê desthilatdariya xwe pêk tînin jî hukumdarên ji Eyyubîyan li Hesenkêfê desthilatdariya xwe didomînin. Piştî mirina Melîk Xelîl, kurê wî Melîk Husên tê li ser hukum û ew du birayên xwe digre davêje hepsê, birayekî wî yê din, Melîk Silêman jî direve diçe ba Begêbeganê Diyarbekirê Husrev Paşa û ji wî alîkarî dixwaze. Husrev Paşa, gazî Melîk Husên û herdu birayên wî yê girtî dîke û li Diyarbekirê biryara kuştina Melîk Husên dide û hukumdariya Hesenkêfê jî teslîmî Melîk Silêman dîke. Lê piştî wê jî di nava birayan de problem dom dîkin. Qebîle û eşîrên herêma Hesenkêfê jî ji ber kuştina Melîk Husên ji Melîk Silêman nefret dîkin û li hember wî dest bi mixalefetê dîkin. Ji ber sedemên weha Melîk Silêman ditirse û diçe Diyarbekirê, kiltîna Kela Hesenkêfê teslîmî Husrev Paşa dîke û hukumdariya eyaleteke din ji wî dixwaze. Bi emrê Sultan Silêmanê Osmanî, berpirsiyariya Ruhayê didin Melîk Silêman (Şerefxan, 1990, *Şerefname - Kürt Tarihi*, İstanbul: Hasat Yayınları, rûpel 184-186). Piştî vê buyêrê êdî giringiya siyasî ya Hesenkêfî namîne û wekî qezayek di sîstema îdarî ya Osmanîyan de cihê xwe digre.

¹⁰ Zengin, Burhan (1994), *Hasankeyf Tarihi ve Tarihi Eserleri*, Ankara, rûpel 22-74. Li gor jimara 1990'î nufûsa Hesenkêfê 4 399 e. Hesenkêfê ji Diyarbekirê 110 kîlometere, ji Cizîrê jî 85 kîlometere dûr e.

¹¹ Di gel ku kopiyeyên wêneyên Gabriel ba min jî hebûn û min çend hebên wan di pirtûka xwe ya li ser GAP'e (1991) de weşandibûn jî, ji ber ku kopiyeyên wan ên ku di kitêba Zengin (1994) de hebûn hîn baştir bûn, min ew kopiyeyên bikaranîn. Wêneyekî jî min ji xanîm Nedret Bilici girt ku bixwe îsal çûye Hesenkêfê. Ji ber vê wêneya herî teze ez spasîya wê dikim.

¹² Albert Gabriel, arkeolog û dîrokanê senatê ye. Gabriel, li ser Hesenkêfê xwediyê xebateke berfireh e û di gelek lêkolînan de wekî çavkaniyeke giring tê qebûl kirin. Gabrielfî xebata xwe ya ku li ser Hesenkêfê di sala 1932yan de kiriyê, di sala 1940î de li Parisê bi navê *Voyages Archeologique Dans la Turquie Orientale* wekî kitêbê çap kiriyê.

¹³ Moltke di nameya xwe ya ku di 1'ê Gulana 1838'an de li Cizîrê li kêleka ava Dîcleyê nivîsandiyê behsa Hesenkêfê jî dîke. Moltke behsa xerabûyîna û texrîbbûna bajarê kevîna dîke û herçend pir bi temamî li ser lingan nemabe jî pesnê Pira Hesenkêfê dide (Moltke, Feldmareşal H. von, 1969, *Türkiye Mektupları*, İstanbul: Remzi Kitabevi, rûpel 167-168).

¹⁴ Aslankara, M. Sadîk, "Dicle Kırısında Bir Taşbaskısı", *Cumhuriyet Dergisi*, Nisan 1995 (jimara destpêka mehê), İstanbul, rûpel 16-17

Ez şelafiyê naxwazim

Nivîskar: **Azîz Nesîn**

Wergêr: Mustafa Aydogan

Ket hindurê servîsa weşanê. Li servîsa weşanê, em neh heval dixebitin. Ev cara yekem bû ku min ew didît. Gava ew ket hindur, heval hemû rabûn ser xwe. Bi dû tevan re jî ez rabûm ser piyan. Ji ber ku min nizanîbû, bê ew kî bû, ez ê qet ranebûma.

Ji hevalan yekî niqurçand min û got:

- Şişşş, Cazim Beg...

Gava min navê "Cazim Beg" bihîst, ez çeng bûm ser xwe. Peryên mêrik ji 20-30 milyonî zêdetir in. Bi ser de jî patronê me ye.

Bi dengekî bilind got:

- Rûnin!

Em hemû bi hevdu re rûniştin, bi tenê Şewkî li ser piyan ma.

Cazim Begê gotê:

- Ev rabûna ser piyan çi ye... Ez ji şelafiyê hez nakim...

Şewkiyê ku hîn li ser piyan bû, digot:

- Li ser seran ezbenî, li ser seran. Em ê rûnin, ezbenî! Heqê cenabê te yî mezin û hêja heye, begefendî...

Lê dîsa li ser piyan çik sekinibû. Ger bi tenê weha çik sekinîba, dîsa baş bû, destên xwe danîbûn ser bişkoka çakêt a pevxistî, situyê xwe xwar kiribû, duta bûbû.

Şewkî beg şêfê servîsa me ya weşanê ye. Ev tişteki eşkere bû, Cazim begê nedixwest ku ji ber dewlemendbûna wî, şelafî jê re bê kirin.

Eferim ji mêrik re. Ez li Şewkiyê ku li hember wî destên xwe dane ser hevdu dinihêrim, lê qet fêhm nake.

Hercar peyvên Cazim begê dubare dike û dibêje:

- Belê, begefendî. Herkes bila li karê xwe binihêre.

Cazim begê bi taybetî ji wî re jî bi dengê hêl got:

- Rûne!

Şewkî got:

- Tu emir dikî, ezbenî, ez ê rûnim.

Lê dîsa rûnenişt. Rezaletiya weha nehatiye dîtin. Mêrik eşkere dibêje ku ez ji şelafiyê hez nakim û ew hîn jî situyê xwe xwar dike û dibêje, belê ezbenî.

Ger li ba min ba, min ê bi dawa wî bigirta, bikişanda û bi ser de bikira bire bir:

- Rûne kuro, rezîl!

Cazim beg bi yekcarî hêrs bû.

Got:

- Rûne, yaho! Ez ji tiştên weha hez nakim... Rûne û karê xwe bike!

- Li ser seran, ezbenî, tu emir dikî...

Dibêje, lê rûnane. Dibe ku Cazim beg biçuya, an jî tiştêk ji yekî ji me bipirsiya, lê hingî li Şewkiyê ku situyê xwe û piştê xwe xwar kirine, dinihêre, şaş maye. Ne dikare biçê û ne jî tiştêkî ku dixwaze bipirse.

Vê carê bi dengê nerm got:

- Rûne, birayê min. Ez rica dikim, rûne... Xwe eciz neke.

Şewkî jî got:

- Ez rica dikim, ezbenî, estexfurulah... Eciziya çi... Bila em di hurmeta li hember cenabê te yê mezin de qusûrê nekin...

Cazim begê xwe negirt û kenîya, lê kenekî xerab bû. Pir eşkere bû ku hêrs bûbû.

- Navê te Şewkî beg bû, ne weha?

- Belê, ezbenî.

- Şewkî beg, ez ne ji axavtinên weha û ne jî ji merasîmên weha hez dikim.

- Ez tika dikim, ezbenî, çawa dibe, estexfurulah... Ez tika dikim, ma qet weha dibe.

Şeytan dibêje ku rabe û bi piştê xwe du şîrmaqan biavêjê, bi milê wî bigire û wî bi rûniştîkirin bide! Hevalan ji bo Şewkiyê şêfê servîsa me ya weşanê digot, şelaf, lê min bawer nedikir....

Hîn meheke min jî çênebûbû ku min li vira dest bi kar kiribû.

- Rûne, birayê min!

- Ma qet çêdibe, ezbenî, ez di hizûra cenabê te de fedî dikim ku rûnim. Destûrê bide min ku ez li ser piyan rawestim. Ez weha bêtir rehet im.

Li ber digere, hema tu nemaye ku bigirî...

Cazim beg hêrs bû. Gava fahm kir ku ew ê nikaribe Şewkî bi rûniştkirin bide, piştî xwe da wî û berê xwe bi me vekir û got:

- Ez ji şelafiyê hez nakim, we fahm kir? Careke din, gava ez têkevim hindur, divê tu kes ranebe ser piyan. Bila herkes bi karê xwe mijûl bibe.

Gava Cazim beg bi wê hêrsê di derî re derket, Şewkiyê ku hîn li ser piyan bû, bi dû wî re got:

- Belê ezbenî, li ser seran...

Em çûn firavînê. Min ji hevalan, ji Kerîm re got:

-Yaho, ev çi zilamekî şelaf e... Min yekî weha ne dîtiye û ne jî bihîstiye! Kerîm got:

- Modeya şelafiya weha hilat. Jê re dibêjin, şelafiya rojhilatî.

- Ma şelafiya rojhilatî û rojavayî jî heye? Ji xwe, ev şelafî mexsûsî rojhilatê ye.

- Naaa... Weha nebêje... Şelafiya ewrûpayî jî heye. Modeya şelafiya rojhilatî derbas bû, kevin bû... Te fahm kir? Modeya wê hilat. Pêwîstiya her mirovekî bi şelafekî heye. Tu hîn nuh hatiyî, tu nizanî. Heçî Cazim beg e, dibêje ku ez ji şelafiyê hez nakim. Lê bila têkeve destê şelafekî ewrûpayî, tu wê çaxê wî bibînî. Tew gava mirov dewlemend be, divê ileh ji xwe re şelafekî peyda bike. Cazim begê me mirovekî pir reben e. Bîst-sîh milyonên wî hene, malê wî, milkê wî, çiftlika wî, apartmanên wî, erebeyên wî, jina wî, metresên wî hene, lê qet ne bextiyar e. Ji ber ku şelafekî wî tune ye. Gava hertim dibêje "Ez ji şelafiyê hez nakim", mahneya wê ew e ku "Ez şelafekî li gora dilê xwe peyda nakim". Dilê min pir bi vî rebenî dişewite. Ma karê sekreterên ku li ba milyonerên emerîkî dixebitin, çi ye? Şelafî. Lê şelafiya wan, şelafiya rojavayî ye...

Min got:

- Kerîm, te ev ilim xitim kiriye.

Got:

- Min xitim kiriye... Min hem ilimê vî karî xitim kiriye û hem jî felsefeya wî... Tu ê bibînî, di nêzik de gelek tişt dê çêbibin.

Hîn di ser axavtina me re hefteyek derbas nebûbû, gelek tiştên ku Kerîm digot, ew ê di nêzik de çêbibin, dest pê kir. Meaşê min du sed û pêncî lire bû. Meaşê Kerîmê ku berî min bi sê mehan dest bi kar kiribû jî bi qasî yê min bû. Piştî wê axavtinê bi hefteyekê, meaşê Kerîm bi derbekê re bû sê sed lire. Yê

ku ev du-sê sal in dixebitûn û hîn jî sê sed û pêncî lire diket destên wan, dest pê kir û di ber xwe de peyivîn. Hîn ew di ber xwe de dipeyivîn, meaşê Kerîm bû çar sed. Meaşê Şewkiyê şêfê me jî çar sed bû.

Ha ha, Kerîm bi pênc sed lîreyî li ser serê me bû şêf û Şewkî jî bû cîgirê wî. Tew Kerîm ji hefteyê rojekê, andu rojan dihat kar. Pir neçû, Kerîm bi heft sed û pêncî lîreyî tayinî servîseke din bû.

Her ku meaşê Kerîm zêde dibû, mesafeya di nav me û wî de jî zêdetir dibû. Hevalên wî yên kevin jê re digot; Kerîm beg. Tew gava Şewkiyê şêfê servîsa me ye kevin, Kerîmê ku berê li ba wî dixebitî, dibîne, bişkokên xwe pev dixin û bi wî re weha dipeyive; "Befendiyê min, cenabê te ye mezin".

Me carekê bihîst ku Kerîm bi Cazim begê re çûye Ewrûpayê gerê. Piştî ku ji gerê vejeriyan, bi qasî ku me bihîst, meaşê Kerîm bûbû du hezar lîre. Lê di du hezaran de jî nesekinî. Tiştê ku min cara talî bihîst, pênc hezar bû. Tu kesî pê nizanîbû bê wî çî kar dikir... Dihat gotin ku ew sekreterê Cazim begê ye, alîkarê wî ye, wekîlê wî ye... Gava Cazim beg ne hazir bûya, Kerîm ji berdêla wî hemû karên wî dikirin. Dû re, ev hat guhertin. Êdî gava Kerîm ne hazir bûya, Cazim begê ji berdêla wî karên wî dikirin.

Ev Kerîm ne yekî weha jîr û jêhatî, ne jî zane ye, çî hunerên vî mêrikî hebûn, tu kesî fahm nedikir. Min dizanîbû ku ew bi saya şelafîya rojavayî weha bilind bûye. Lê min nizanîbû, bê ev şelafîya ewrûpayî karekî çawa ye. Min di dawiyê de, ew jî fahm kir.

Pênc-şeş mieseseyên Cazim begê hebûn. Devera ku me lê kar dikir, karê wî ye herî kevin bû. Ji herkesê ku li mieseseyê dixebitî re hat gotin ku salvegera damezrandina mieseseyê ya bîstî dê bê pîrozkirin. Heryekî ji me meaşek îkramîye stend. Wê şevê, bi ser de jî li restoranta otêleke ji wan otêlên mezin, ji bo heystê kesî ziyafetek jî hat dayin.

A, ez di wê ziyafetê de fêr bûm ku bê şelafîya ewrûpayî, wê sira biserkevtina Kerîm çî ye. Li serê maseya ziyafetê Cazim beg rûniştibû û li kêleka wî jî Kerîm. Ez li aliyê Kerîm î çepê û bi sê kursiyên jê wê de rûniştibûm. Min pir meraq dikir, ji ber vê yekê, min guhê xwe dida her gotina Kerîm û min bala xwe baş dida her tevgera wî. Tam gava Cazim begê bi mebesta noşkirinê rahişt qedehê, Kerîm bi destê wî girt û got:

- Nabe! Tu dizanî ku tu pê diêşî...

Cazim begê got:

- Ez rica dikim, qedeheke bi tenê...

Kerîm sert bû:

- Gava mirov got; nabe, nabe... Tu dizanî, ger tu dixwazî vexwe... Lê dû

re, neke sūcê min. Tu dizanî ku ji bo dilê te ne baş e!

Cazim begê qedeha ku ji bo noşkirinê rakiribû, danî cîhê wê û li ser kursiya xwe rûnişt.

Carekê, Cazim begê got:

- Hindur germ e, wê pencereyê vekin!

Bi gotina wî re, Şewkiyê şelafê røjhilatî berî garsonan ji maseyê çeng bû.

Ji aliyekî ve bang dikir û digot:

- Tu emir dikî, ezbenî.

Û ji aliyê din ve jî ber bi pencereyê ve dilezand.

Dengê Kerîm î sert hat bihîstin:

- Bihêle! Pencereyê veneke!

Dû re, berê xwe bi Cazim begê vekir û got:

- Yahoo, tu çi dikî? Weleh, tu wek zarokan î... Te xwêdan daye, ruhê min...

Ma tu dizanî ku ger nuha pencere bê vekirin, dê çi bibe?

Cazim begê got:

- Weleh, min xwêdan nedaye.

- Çawa te xwêdan nedaye. Ma qey ez nizamim bê te xwêdan daye, an na, ruhê min...

Cazim begê av dixist qedeha xwe. Kerîm bang kir:

- Êêêê!... Tu çi dikî, ji bo xatirê Xwedê, ma qey tu dîn bûyî?

Cazim begê got:

- Qet. Ez avê dixim qedehê.

Kerîm serê xwe vir de û wê de kil kir:

- Hela, hela... Bi navê Xwedê, tu ecêb î... Ma ez dihêlim ku tu avê vexwî?

Madem tu tî bûyî, ji bo çi tu ji min napirsî? Garson! Zû, şûşeyeke sodayê bîne!...

Cazim begê bixwesta çi bike, Kerîm nedihîşt. Kerîm çi bigota, wî jî wek berxikan bi a Kerîm dikir. Car carinan, wek zarokên şûm delalîyê xwe li Kerîm dikir û digot:

- Destûrê bide, ez qedehê vexwim, ez rica dikim...

- Nabe, me got nabe, nabe, ruhê min... Tu qet guh nade siheta xwe...

Kerîm bi rehetî dikarîbû berevajîya tiştê ku bîstikeke berê kiribû, bikira. Kerîmê ku bîstikeke berê, nehîşt pencere bê vekirin, nuha tevî ku herkesî xwêdan dabû, ji Cazim begê re got:

- Ma ne germ e? Tu eciz bûyî...

Cazim begê got:

-Naaa... Ez eciz nebûme!

- Tu eciz bûyî, eciz bûyî... Ez dizanim. Bila wê pencereyê vekin.
Şelafê me yê rojhilatî Şewkî kêr û çetel ji nişka ve ji destê xwe avêtin û pengizî.

Got:

- Tu emir dikî, ezbenî!

Û ji bo vekirina pencereyê baz da.

Cazim begê got:

- Yaho, min çend caran got!... Ez ji şelafiyê hez nakim!... Bihêle, ezbenî, garson dê pencereyê veke. Çi ji te re?

Şewkî got:

- Li ser seran, tu emir dikî. Ez ê rûnim. Ez rica dikim ku tu ê xwe eciz nekî!

Cazim begê ji Kerîm pirsî:

- Ma destûr heye ku ez çixareyekê bikişînim?

Kerîm got:

- Lê bi tenê yekê. Ger tu bixwazî yeke din jî bikişîni, ez nahêlim... Îro, ev bû çixareya çaran.

Guhên min û çavên min wer li wan bûn.

Carekê Kerîm got:

- Yaho, min çend caran ji te re got ku gava tu diçî ziyafetan, van kincên sport ên rengê qahweyî li xwe neke... Îlelah... Mû bi zimanê min ve şîn hat. Tu ji zewqê qet fêhm nakî... Ger ez te deqîqeyekê bi tenê bihêlim, tu ê ilehî çewtîtiyekê bikî.

Min li Cazim begê nihêrî. Zirmilyoner bûye zarokekî şûm.

Got:

- Bibuhure, min ji bîr kir...

Kerîm ji yên li ser maseyê re got:

- Weleh, ev zilamekî wek zarokan e! Hûn pê nizanin.

Şelafê rojhilatî Şewkî xwe avêt ortê:

- Ez rica dikim, ezbenî, estexfurulah!

Cazim beg bi ser wî de rabû:

- Hiş, tu dengê xwe meke! Ev çi zilamekî şelaf e, ya rebî. Ez wek zarokan im, hi... Helbet, ez wek zarokan im... Ger ne ji Kerîm begê bûya, ez heta nuha, çend caran nexweş ketibûm û miribûm...

Kerîm li saeta xwe ya destan nihêrî û got:

- De heydê, rabe ser xwe! Wexta te ya razanê hat. Heydê rabe...

Cazim begê situyê xwe xwar kir û got:

- Em piçekî din jî rûnin!

- Naaaabe... Saet neh û nîv... Heta em bigihên malê, ew ê bibe deh. Tew em dereng jî man... Saet tam di dehan de, divê tu têkevî nav nivînan. De heydê, rabe...

Gava Kerîm rabû, destê xwe avêt qedehê. Min tavilê bi destê wî girt û got:

- Tu çi dikî, ji bo xatirê Xwedê... Ev demek e ku ez bala xwe didimê, ev bû qedeha pêncan. Ma tu li siheta xwe qet nafikirî? Destê xwe hilîne!

Ez baş bi ser wî de rabûm. Kerîm li ber min geriya:

- Ez rica dikim, ez ê vêya jî vexwim!

- Vê carê tişt pê nayê, lê ez careke din nebînim.

Kerîm destê xwe danî ser girmilê min û ez xewle kirim û got:

- Eferim! Te ferqa navbera şelafiyê rojhilatî û rojavayî tavilê fahm kir... Hîn gelek ders hene ku divê em ji rojavayê bistînin. Em hîn nizanin şelafiyê jî bikin. Meaşê te çi qas e?

- Du sed û pêncî...

- Min meaşê te kir pênc sed. Sibehê, ji berdêla Şewkî tu ê bibî şêf, ew ê jî bibe alîkarê te...

Şewkî bazdabû û hatibû ber derî û ji Cazim begê re şelafî dikir.

- Xwedê emirê dirêj bide, begefendiyê min... Tu sax bî, her hebî. Te di ziyafeta îşev de, em bextiyar kirin.

Min bi ser wî de bang kir:

- Xwe ji wira bide alî, ya ya şelafî!... Te şelafî jî rezîl kir, xwe bide alî!... Bicehime, bila çavên min careke din bi te nekevin.

Not: Ev çîroka ha ji kitêba Azîz Nesîn bi navê Fîl Hemdî hatiye wergirtin

JÎ "EL-KAMIL FÎ EL-TARÎX" A ÎBN EL-ESÎR¹

Piştire kete sala sê sed û çil û diduyan (342/953)

Reva Deysem ji Azerbaycanê

Wergera ji Erebî: Emîn Narozî

Di vê salê (342/953) de Deysem ibn Ibrahîm Ebû Salim ji Azerbaycanê reviya; ji xwe me berê qala vegirtina wî ya wê derê kiribû.

Sedemê reva wî ji wê derê jî ew bû ku yek ji Serdarên Rukn el-Dewle ibn Buweyh bi navê Elî ibn Mîsekî hatibû girtin, lê ew ji hebsê filitî û berê xwe da çiya. Wî ji wê derê hinek kes li dora xwe civandin û çû ba Wehsûzanê birayê Merzuban, pê re bû yek û li hember Deysem alîkariya hev kirin. Piştire Merzuban keleya Sumeyrimê vegirt - çawa em dê bibêjin - û nameyên wî yên ku xwe xelas kiriye, gihîştin cem birayê wî û cem Elî ibn Mîsekî, herweha wî ji Deylemiyan re jî nivîsand û wan bi aliyê xwe ve kişand, lê haya Deysem ji xelasiya wî tinebû û wî texmîn dikir ku yên şerê wî dikin Wehsûzan û Elî ibn Mîsekî ne.

Wezîrekî wî (Deysem) bi navê Ebû Ebdullah el-Ne'îmî hebû, wî çavê xwe berda malê wezîr û ew da girtin. Piştire yekî kire katib ku ji el-Ne'îmî re binivîse, lê El-Ne'îmî hîle lê kir û li gor dilê wî bersîv dayê ta ku dawiyê katib ji bo dana mal kire kefilê xwe. Deysem rabû ew berda û ew zivirand ser halê wî.

Piştire Deysem ji Erdebîlê çû û ew (katib) danî dewsa xwe ku wî malî jê bistîne, lê el-Ne'îmî rabû katib kuşt û bi malê xwe ve reviya çû cem Elî ibn Mîsekî. Nêzî Zencanê ev nûçe gihîşte Deysem, ew ji wir zivirî Erdebîlê, lê Deylemiyan li hember wî xirecir derxist ew rabû wî bi qeweta malê ku pê re bû ew ji hev bela kirin. Di wê navê de xebera çûna Elî ibn Mîsekî ku bi hejmareke hindik ve ber bi Erdebîlê ve diçû, gihîşte wî. Ew jî rabû ber pê ve çû, ew giştin hev û şer kirin. Deylemî derbasî hêla Elî bûn û Deysem jî şikiya, ew bi hinek Kurdan ve reviya çû Ermenîstanê û milkê wê derê yê ku kete destê wî bire wir.

Paşê jê re xeber hat ku Merzuban ji keleya Sumeyrimê derketiye û berê xwe daye Erdebîlê, çûye Azerbaycanê vegirtiye û bi aliyê wî ve leşker

rêkiriye. Ew êdî nema dikaribû xwe ragire, rabû ji Ermenîstanê reviya Bexdadê û di wê salê (342/953) de gihîşte wê derê. Me'z el-Dewle derket pêşiyê, qedrê wî girt û qencî pê re kir; ew li cem wî di jiyaneke xweştrîn de ma.

Piştî xelkê wî û hevalên wî yê Azerbaycanê gazî wî kirin, ew jî di sala 343/954an de ji Bexdadê bi rê ket û ji Me'z el-Dewle alîkariya leşker xwest lê nedayê çiku hingê Merzuban bi Rukn el-Dewle re li hev hatibû û bûbû xezûrê wî û ji ber vê yekê jî Me'z el-Dewle nikaribî diji Rukn el-Dewle derkeve. Deysem çû Mûsilê cem Nasir el-Dewle ibn Hemdan û jê alîkarî xwest, lê wî jî nedayê, ji wir jî rabû çû Şamê cem Seyf el-Dewle û heyanî sala 344/955an li wê derê ma.

Yekîti çêbûye ku li Bab el-Ebwabê hinek li hev civiyane û çûne avêtine ser Merzuban û ew jî çûye wan. Hinek ji pêşewayên Kurdan jî xeber şandine pey Deysem ku ger ew were Azerbaycanê dê ew ji bo vegirtina wê pê re alîkarî bikin; ew jî rabûye çûye bajarê Selemasê vegirtiye. Merzuban yek ji serdarê xwe şandiye şerê wî lê hevalên serdêr ji Deysem ewleyî xwestine û çûne hêla wî, Serdêr jî şikiyaye û bi paş ve zivirîye, Deysem jî li Selemasê maye.

Dema Merzuban ji rewşa xariciyan vale bûye hingê dageriyaye Azerbaycanê, gava nêzîkî li Deysem kiriye ew ji Selemasê derketiye qesta Ibn el-Deyranî û Ibn 'Hacîq kiriye û çûye Ermenîstanê, çiku ew bi wan bawer bûye. Li ser vê Merzuban rabûye li Ibn el-Deyranî Ferman kiriye ku Deysem bigire, serê pêşî wî ew parastiye lê piştî ji tirsî Merzuban ew girtiye. Dema wî ew girtiye Merzuban lê ferman kiriye ku wî bibe cem, pêşî dîsa wî ew parastiye û nebiriye lê dawiyê mecbûr bûye û ew biriye cem. Wextê Merzuban ew teslîm girtiye hingê çavên wî kor kirine, ew bê zerar hiştiye û paşî avêtiye zindanê. Bes Merzuban piştî miriye û hingê hinek jî hevalên wî ji tirsî derxistina serêşiyên Deysem rabûne wan ew kuştine.²

Piştî Kete Sala Sê sed û Pêncî û Sisiyan (353/964)

Serîhildana Neca, kuştina wî û vegirtina Seyf el-Dewle ya hinek ji Ermenîstanê

Ji xwe me di sala 352/963yan de qala kirinên xulamê Seyf el-Dewle ibn 'Hemdan bi gelê 'Heranê û destdanîna ser malê wan kiribû. Dema ew malê zahf kete destê wî ew pê xurt bû û di ser xwe re çû, wî ji Mezinê xwe re spas

nekir, înkariya wî kir, çû Meyafarqînê û ji wir berê xwe da welatê Ermeniyân. Ji xwe zilamekî Erebb ku bi Ebû el-Werd dihate nasîn gelek dever jê zeft kiribû, Neca pê re şer kir; Ebû el-Werd hate kuştin û Neca dest danî ser keleyên wî û deverên wî yên Xilat (Exlat) Melazkird (Melazgir), Mûş û yên din. Bi vê re malekî pir ji yê Ebû el-Werd jê re civiya û ew rabû wî dijî Seyf el-Dewle serî rakir.

Li ser yekîti çêbûye ku Me'z el-Dewle ibn Buweyh ji Bexdadê çûye avêtiye ser Mûsil û Nesîbînê (Nisêbînê) ew vegirtine û - çawa me di nêzik de got - Nasir el-Dewle jê derxistiye. Li ser vê yekê gava ew hê li Nesîbînê bûye Neca jê re nivîsiye û şandeye cem ku ew wî dijî mezinê xwe Ibn Hemdan alîkar û piştgir hesab dike. Lê dema Me'z el-Dewle zivirîye Bexdadê û ew û Nasir el-Dewle li hev hatine hingê Seyf el-Dewle ji bo serîhildana Neca û derketina ji ber emrê wî çûye şerê wî. Wextê ew gihîştiye Meyafarqînê Neca ji ber destê wî reviyaye û Seyf el-Dewle jî ew kele û deverên ku ji Ebû el-Werd sitandibûn zeft kirine. Hinek ji hevalên Neca ewleyî jê xwestine wî ew kuştine lê dema birayê Neca êminî jê xwestiye wî qencî pê re kiriye û hisyeta wî girtiye. Wî şandiye pey Neca, jê re hem xweş kiriye û hem jî wî tirsandiye ta ku wî anîye cem xwe pê re qencî kiriye û wî danîye ser karê wî.

Piştê di sala 354/ 965an de xulamên Seyf el-Dewle li Meyafarqînê di mala wî de êrîşî wî kirine lê xistine, li cem wî ew kuştine û ew bi ser Seyf el-Dewle ve terabûye. Wan Neca derxistiye biriye avêtiye ciheke ava çolikê, heya sibehê li wir maye piştê ew derxistiye û biriye veşartîye.³

Têkçûna Ibrahîm ibn el-Merzuban

Di vê salê (355/965) de Ibrahîm ibn el-Merzuban li Azerbaycanê têkçû û çû Reyyê. Sedemê vê jî ew bû ku dema Ibrahîm, çawa ku me di sala 349/ 960î de got, ji ber Cestan ibn Şermezîn şikiya reviya çû Ermenîstanê û dest pê kir ku xwe bide hev û ji bo veqera li Azerbaycanê xwe amade bike. Serokên Ermenîstanê yên hingê Ermenî û Kurd bûn, wî ji wir mirov şande cem Cestan ibn Şermezîn û pê re li hev hat; li ser vê yekê gelek kes hatin li dora wî kom bûn.

Yekîti li ser çêbûye ku hingê Isma'îlê kurê apê wî Wehsûzan miriye û Ibrahîm jî çûye Erdebîlê vegirtiye. Ebû el-Qasim ibn Mesîkî⁴ derbasî hêla Wehsûzan bûye û pê re çûye. Ibrahîm ji wir çûye ba apê xwe Wehsûzan û doza xwîna birayên xwe lê kiriye, apê wî Wehsûzan jê tirsiyaye û digel Ibn

Mesîkî derbasî welatê Deylemê bûye. Ibrahîm dest daniye ser aqarê apê xwe, hevalên wî perçiqandine û dest daniye ser malê wî yê ku berê ji xelkê sitandibûye.

Wahsûzan jî mirov civandine û ziviriye keleya xwe ya Teremê, wî Ebû el-Qasim ibn Mesîkî bi leşker ve şandiye ser Ibrahîm. Ibrahîm jî derketiye pêşiya wan û bi hev re şerekî zor kirine, Ibrahîm şikiyaye wan daye pey lê negihîştinê, ew bi tenê çûye heya ku gihîştiye Reyê cem Rukn el-Dewle. Rukn el-Dewle qedrê wî girtiye, qencî pê re kiriye û ji ber ku mêrê xweha Ibrahîm bûye zêde hisyeta wî girtiye, gelek perû danê û mehrîvanî lê kiriye.⁵

Dijîtiya navbera zaruyên Nasir el-Dewle û mirina bavê wan

Sedemê dijîtiya navbera zaruyên Nasir el-Dewle ew bû ku; wî Bajarê el-Rehbeyê, yê Mardînê û yên din dabû kurê xwe Hemdan û li ser vê yekê jî zaruyên Nasir el-Dewle: Ebû Texellub, Ebû Berekat û xwişka wan Cemîle ku ji Fatîmeya qîza Ehmedê Kurdî bûn; ew Fatîmeya ku desthilatdariya Nasir el-Dewle di destê wê de bû. Ew digel kurê xwe Ebû Texellub bû yek û çawa me got, wan Nasir el-Dewle girt. Li ser vê Nasir el-Dewle jî lê geriya ku wan bide girtin û name ji kurê xwe Hemdan re şand da ku xwe pê bihêz bike, lê zaruyên wî bi nameyê hisiyân û nehiştin ku bigihîjê. Herweha wan jê fikara kir û xwestin ku xwe jê biparêzin û ev tirsê wan bû sedemê ku wî bibin têxin keleya Kewaşê.

Ev nûçe gihîşte guhê Hemdan, ev pir li zora wî hat û ew bû neyarekî eşkere ji wan re. Ew ji wan tevan mêrxastir bû û dema apê wî Seyf el-Dewle miribû ew ji el-Rehbeyê çûbû Reqeyê û ew zeft kiribû. Ew rabû çû Nisêbînê yên ku bi xebera wî dikirin li hev civand û ji xweh û birayên xwe xwest ku bavê xwe berdîn û wî bînin cihê wî. Ebû Texellub çû şerê wî û berî ku Hemdan bigihîje el-Reqeyê şikiya, Ebû Texellub dakete wir û dora wî girt lê piştê ew li ser dexlan li hev hatin û heryek ji wan çû cihê xwe. Nasir el-Dewle el-Hesen ibn Ebû el-Hîca Ebdullah ibn Hemdan ibn Hemdûn el-TeXellubî çend mehan jiya û di rebî' elewwele (meha sêyemîn ji salnameya koçî ya hîvê ye - Narozî) sala 358/968an de mir û li girê Tobetê ku dikeve rojhilatê Mûsilê, hate veşartin. Ebû Texellub milkê birayê xwe Hemdan zeft kir û birayê xwe Ebû Berekat şande wî, dema ew gihîşte el-Rehbeyê gelek ji hevalbendên Hemdan çûne aliyê wî hingê ew şikiya û çû Iraqê xwe avête Bextiyar. Ew di remezana sala 358/968an de gihîşte Bexdadê, Bextiyar qencî pê re kir qedrê wî girt û gelek peruyên hêja jê re birin. Çiqas mayê ku ji yên weke wî re pêwîst be bi

xwe re bir û bavê Şerîf el-Redî Neqîb Ebû Ehmed Mûsewî şande cem Ebû Texellub da ku bi birayê xwe re li hev bê. Ew li hev hatin û Hemdan zivirî el-Rehbeyê, çûna wî ji Bexdadê di cumadelulaya (meha pêncemîn ji salnameya koçî ya hîvê ye -Narozî) sala 359/969an de bû.

Gava Ebû Berekat bihist ku birayê wî Hemdan bi vî awayî tê ji el-Rehbeyê derket û Hemdan ketê. Birayê wî Ebû Texellub şande bal ku pê re bicive lê wî vê yekê nekir, Ebû Texellub rabû dageriya û birayê xwe Ebû Berekat şandê. Dema Hemdan pê hisiya ew jê derket, Ebû Berekat ew vegirt cihgîrekî ku wê biparêze bi hinek leşker ve danî ser û zivirî el-Riqeyê, piştê ji wir jî çû 'Erbanê.

Wextê Hemdan ku hingê li beriya Tedmurê bû, bihîst ku ew jê dageriyaye di meha şabanê (meha heştan ji salnameya koçî ya hîvê ye -Narozî) de zivirî wê derê û bi şev gihîşte wir. Hinek ji xulamên wî derketin ser sûrê, derî jê re vekirin û ew jî kete hundur; tu kes ji leşkerê ku lê bûn pê nehisiya. Wextê bû sibe ferman kir ku li borîzanê bixin, leşkerê ku li el-Rehbeyê bû ji hev cuda bi derva ve bazdan ji wan werê ku dengê borîzanê ji wir ve tê û kijan ji wan ku gihîştin cem Hemdan wî ew dîl girt ta ku hemiyan girt, hinekan ji wan kuşt û hinekan jî hişt. Dema Ebû el-Berekat ev bihîst zivirî Qerqîsya û ew û birayê xwe Hemdan bi tenê hev dîtin, lê li hev nekirin û Ebû Berekat ji Hemdan re got: "Ez dê herim 'Erbanê û bişînim cem Ebû Texellub belkî ew bersîva daxwaziya te bi de".

Ew zivirî 'Erbanê û Hemdan jî di bihorekî Firatê de derbas bû û da pey birayê xwe Ebû Berekat, ew li 'Erbanê gihîstê û ew jî xwe ewle bû. Ebû Berekat bê sûr û mertal rastî wan hat û bi wan re şer kir, şer di nav wan de germ bû û Ebû Berekat xwe li nav wan qelapt; birayê wî Hemdan derbek avêtê lê xist û wî girt. Ew di wê rojê de ku siyê remezanê bû mir, di tabûtekê de wî birin Mûsilê û li girê Tobetê li cem bavê xwe hate veşartin.

Ebû Texellub xwe amade kir ku here Hemdan lê birayê wî Ebû el-Fewaris Muhemmed ji bal çû Nisêbînê û gava çû wê derê ji birayê Hemdan re nivîsî û wî kişkişî ser Ebû Texellub kir. Ebû Texellub pê hisiya şande pey jê xwest ku here balê da ku erdê wî zêde bike, dema gihîşte cem ew girt û şande keleya Kewaşê ku girêdayê bi Mûsilê vebû û dest danî ser malê wî ku buhayê wî pênc sed hezar dînar bûn.

Gavê wî ew girt hingê herdu kurên Nasir El-Dewle Ibrahîm û Huseyn ji tirsê Ebû Texellub çûne cem birayê xwe Hemdan, gihîştinê û pêkve çûne Sincarê. Ebû Texellub jî di meha remezanê ya sala 360/970î de ji Mûsilê çû pêşiya wan lê taqeta wan jê re tinebû. Birayên wî Ibrahîm û Huseyn jê

daxwaziya vegerandina cem kirin lê ji bo ku wî bixapînin, baweriyê bidinê û duvre rewşa wî xera bikin. Wî ew qebûl kirin, ew reviyane cem û gelek ji hevalên Hemdan jî bi wan re çûn, Hemdan jî hingê ji Sincarê zivirî 'Erbanê. Hevalbendên Hemdan ewleyî ji Ebû Texellub xwestin û hîleya birayên wî ya Îbrahîm û Huseyn ku dê lê bikirina jê re gotin; wî xwest ku wan bigire lê ew tirsyan û reviyân:

Piştî Nemayê xulamê Hemdan û nazirê wî yê el-Rehbeyê dest danîn ser hertiştê wî yê wê derê û reviyân çûn cem hevalên Ebû Texellub yên li Herranê ku bi hevalbendê wî Selamet el-Berqê 'îdî re bûn. Ew çax Hemdan mecbûr bû dageriya el-Rehbeyê û Ebû Texellub jî çû Qerqîsya û nijdeyekê şand ku li Firatê derbas bûn û li Rehbeyê avêtin ser Hemdan bê ku pê bihise. Ew bi reva rev filitî, Ebû Texellub ew der zeft kir sûrên wê nû kirin û zivirî Mûsilê. Ew di zulhicceya (meha yazdemîn ji salnameya koçî ya hîvê ye - Narozi) sala 360/970î de kete wê derê.

Hemdan di dawiya zulhicceya 360/970î de digel birayê xwe Ibrahîm xwe avête Bexdadê cem Bextiyar, birayên wan Huseyn bi xwe, xwe avêtibû birayê xwe Ebû Texellub û fitilî bû cem. Bextiyar gelek peruyên hêja da Hemdan û birayê wî, qencî bi wan re kir û hisyeta wan girt.⁶

Çûna Ibn el-'Emîd bi aliyê Hesenweyh ve

Di vê salê (359/969) de Rukn el-Dewle leşkerekî giran bi wezîrê xwe Ebû el-Fedl ibn el-'Emîd re şande ser welatê Hesenweyh.

Sedemê vê yekê jî ew bû ku hêza Hesenweyhê kurê Huseynê Kurdî xurt bûbû, lê ji ber ku Rukn el-Dewle bi tiştên jê grîngtir ve lepikî bû û ji ber ku wî jî li hember leşkerê Xorasanê bi Deylemiyân re alîkarî dikir, Rukn el-Dewle jê re kêmasî dikişand û ji xurtbûna wî re çavên xwe digirt. Çendî ku hingê wî diavête pêşiya qefleyên kerwan û bazirganan, ji wan xwêgî (baca rê û erdiye) distand jî û ev xeber digihîştin guhê Rukn el-Dewle jî lê wî jê re dengê xwe nedikir.

Vêca demek hat ku di navbera wî û Sehlan ibn Musafir de jî dijîtî derket û Sehlan çû pê re şer kir, lê Hesenweyh zora wî bir û Sehlan û hevalên xwe reviyane cihekî û tê de kom bûn; Hesenweyh rabû çû dora wan girt, gelek qirş û qal, giya û devîk civandin, li hawîrdorê hevalên Sehlan gerand û agir berdayê ku hingê wext jî havîn bû. Rewşa wan pir xerab bû, ew hatin ber mirinê û dema helaka wan diyar bû hingê ewleyî jê xwestin, wî ew da wan û wan ji aliyê paş ve girt.

Dema Rukn el-Dewle bi vê yekê jî hisiya êdî pê re hew qedand û hingê li Îbn el-‘Emîd ferman kir ku here ser. Ew di meha muherremê (meha pêşî ya salnameya koçî ya hîvê ye. - Narozi) de çûyê û kurê wî Ebû el-Feth jî ku xortekî ji nava xwe razî bû, pê re bû. Ewê ku xortaniyê û fermankirinê ew tor kiribûn û torîtiya wî jî wisa jê diyar dibû ku bavê wî pê dikeribî û ji ber wê jî êşa wî ya Niqris⁷ û nexweşînên wî yên din lê zêde kirin. Dema ew gihîşte Hemedanê li wir mir û kurê wî kete cihê wî; ew li ser dana hinek mal bi Hesenweyh re li hev kir û zivirî Reyê ber xizmeta Rukn el-Dewle.

Bavê wî dema mirina xwe digot: ”Ji kurê min pê ve kesî min nekuştiye û ez ji wî pê ve ji kesî din natirsim ku malbata el-‘Emîd xerabike û bibe tineyiyê”; wisa jî derket.

Di Ebû el-Fedl ibn el-‘Emîd de gelek çêyiyên cîhanî ku ji bilî wî di kesî de neciviyabûn hebûn mîna tevdira başiyê siyaseta îdarî û nivîsîn ku herawayê bedewiyê tê de hebûn. Ew di gelek zanistiyên de şareza bû, mîna wîje (edebiyat) ku ew yek ji zanayê pê bû, jiberkirina helbestên Erebi ku kesî bi qasî wî ew jiber nekiribûn û serpehatiyên pêşiya ku ew bi awayekî rast bi wan zanebû û gelek marîfetên din; ji bilî xuyê xweş î nerm bi hevalên xwe re li civatan, ji bilî mêrxasiya temam û zanîna bi awayên cengê û dorvegirtinê. ‘Edu el-Dewle pê dişewirî û siyaseta melîkiyê û hizkirina zanistî û zanayan jê fêr dibû. Temenê Ibn el-‘Emîd ji 60 salî bihûrî bû û 24 salan wezîrî kiribû.⁸

Destdanîna ‘Edu el-Dewle ya li ser Milkê Hemdaniyan (Benî ‘Hemdan)

Dema Ebû Texellub û Bextiyar şikiyan ‘Edu el-Dewle rabû berê xwe da hêla Mûsilê; wî ew û deverên pê ve girêdayî tev di 12yê meha zelqeyê (meha 11an ji salnameya koçî ya hîvê ye - Narozi) de zefî kir. Ebû Texellub texmîn dikir ku dê ew jî mîna wan kesên din yên berê demeke hindik li wir bimîne piştê dê ew wî mecbûrî lihevhatinê bike û vegere. Lêbelê ‘Edu el-Dewle xwe ji wî awayî ve piştrast kiribû, çiku dema ew hatibû Mûsilê wî bi xwe re zexîreya leşker, êmê dewarên xwe û kesên ku Mûsilê û deverên pê ve qenc dinasîn bi xwe re anîbû. Ew dilbicih li Mûsilê rûnişt û nijdevanan şande ser Ebû Texellub. Ebû texellub şande cem û xwest ku herêmê jê deman bike lê ‘Edu el-Dewle nedayê û got: ”Ev diyar bi min ji Îraqê xweştir e”.

Merzubanê kurê Bextiyar, Ebû Ishaq û Ebû Tahirê kurên Me‘z el-Dewle, diya wan ku diya Bextiyar bû jî û lêzimên wan jî bi Ebû Texellub re bûn. Ebû Texellub çû Nesîbînê (Nisêbînê), ‘Edu el-Dewle nijdeyekê di bin pêşikvaniya

dergevanê xwe Ebû 'Herb Texan de şande Cezîreya ibn 'Umer [Cizîra Botan] û nijdeyek jî Ebû el-Wefa Tahir Muhemmed danî ser û şande ser riya Sincarê bi pey Ebû Texellub xist. Ebû Texellub bi lez çû heya gihîşte Meyafarqînê û li wir ma, malbata wî jî pê re bû. Dema bihîst ku Ebû el-Wefa ber pê ve diçe wî bi malbata xwe ve berê xwe da Bedlîsê; wê hingê Ebû el-Wefa gihîşte Meyafarqînê lê deriyên wê lê hatin girtin, ji xwe ew keleyeke asê ji yên Rûmê yên kevn bû, wî dev jê berda û da pey Ebû Texellub.

Hingê Ebû Texellub ji Erzena Rûmê derbasî hêla Heseniyyeya qezaya Cizîrê bûbû û hilkişiya bû keleya Kewaşê û der û dorên wê, malê wî yê ku li wan deran hebû girtibû û bi xwe re biribû. Ebû el-Wefa jî dageriya Meyafarqînê û dora wê girt.

Dem a nûçeya çûna Ebû Texellub ya ber bi keleyên xwe ve gihîşte 'Edu el-Dewle ew bi xwe rabû çûyê, lê negihîstê, bes gelek ji hevalên wî hêviya ewleyiyê jê kirin û ew jî zivirî Mûsilê, bes bi serdarekî re ku navê wî Texan bû, leşker xiste pey Ebû Texellub. Ew di rê de averêyî Bedlîsê bû wî dizaniya ku kes li pey naçe lê Texan li pey çû; ew rabû ji Bedlîsê reviya û qesta welatê Rûmê kir ku xwe bigihîjîne şahê wan yê navdarê bi Werd el-Rûmî. Ew ne ji malbata şah bû lê bi zor şahîti zeft kiribû û di nav Rûmiyan de jî li ser wî dubendî derketibû, hinek ji wan jî zaruyên şahên xwe yên din kiribûn qral û li ser vê jî şerê nav wan dirêj bûbû. Werdî Ebû Texellub kiribû xezûrê xwe ku pê xwe xurt bike, lê qederê wisa kir ku Ebû Texellub hewceyî alîkariya wî bû.

Dem a Ebû Texellub ji Bedlîsê derket leşkerê 'Edu el-Dewle gihîştinê, ji ber ku wan timahiya malê pê re dikir û bihîstibûn ku pê re gelek mal hebû. Dem a wan êrîş birê serdarê wan gazî kir: "Dest nedin wî malî ew yê 'Edu el-Dewle ye", hingê wan jî dev ji şer berda.

Wextê Ebû Texellub dît ku ew şer nakin rabû êrîşî wan kir, ew şikiyan û gelek ji wan hatin kuştin. Ew ji wan filitî dakete kelata Ziyad ku niha bi Xertebert tê nasîn. Wî şande pey Werdê ku me li pêş qala wî kir, lê wî ew tiştê ku li benda wî ye, yanî yekîtiya Rûman ya li pêşberî xwe jê re diyar kir, jê alîkarî xwest û got: "Gava ez vale bibim ezê dagerim cem te". Li ser vê yekê Ebû Texellub hinek ji leşkerê xwe jê re şand, lê li ser yekîti çêbûye ku Werd bi xwe şikiyaye û dem a Ebû Texellub pê hisiyaye hingê ji alîkariya wî bêhêvî bûye û ziviriye welatê Îslamê. Ew daketiye Amedê û du mehan li wir maye ta ku Meyafarqîn hatiye vegirtin.⁹

Piştire kete sala sêsed şêst û sisiyan (368/978)

Vegirtina Meyafîrîn, Amîd (Amed) û deverên din yên Diyarê Bekir (Diyarbekrê) ji aliyê 'Edu el-Dewle ve

Dema Ebû el-Wefa' ji pey Ebû Texellub zivirî, dakete Meyafarqînê ku waliyê wê hingê Hezarmerd bû. Wî bajêr lê girt û sê mehan bi zêdeyî şerê Ebû el-Wefa kir lê piştire Hezarmerd mir û ev yek ji Ebû Texellub re hate nivîsîn. Wî ferman kir ku xulamek ji yê 'Hemdaniyan bi navê Mu'nis têkeve cihê wî; ew bû waliyê wê û ji Ebû el-Wefa re riya tu hîleyî nema. Ew jê geriya û şande pey zilamek ji rîspiye bajêr ku navê wî Ehmed ibn Ebdullah bû, wî kişande cem xwe; wî jî jê re erê kir û dest pê kir gelê bajêr bi bal Ebû el-Wefa ve kişand, wan jî qebûl kir û hêza wî xurt bû. Wî şande cem Mu'nis û jê mifteyan xwest, ji ber ku hevalbendên wî pirr bûn wî nikaribû nehêle, rabû ew jê re şandin û jê ewleyî xwest. Ehmed ibn 'Ubeydullah ji bo vê yekê şande cem Ebû el-Wefa; wî ewleyî da wî û da xelkê bajêr giş û wan jî jê re deriyên bajêr vekirin û ew sipartin wî.

Ebû el-Wefa demekê li Meyafarqînê ma û nijdevanên xwe şande ser keleyên der û doran û ew hemî vegirtin. Dema Ebû Texellub vê yekê bihist ew û xweha xwe Cemîle ji Amedê berê xwe dane hêla el-Rehbeyê û emir li hinek ji malbata xwe kirin ku ji Ebû el-Wefa ewleyî bixwazin wan jî weha kir. Piştire Ebû el-Wefa çû dora Amedê girt, wextê gelê wê ev yek dît ew jî li pey Meyafaqîniyan çûn û bajêr bi ewleyî spartinê. Ebû el-Wefa deverên Diyarê Bekir yên din jî vegirt; hevalên Ebû Texellub û mirovên wî qesta Ebû el-Wefa kirin û jê ewleyî xwestin, wî jî ewleyî da wan, qencî bi wan re kir û zivirî Mûsilê.

Ebû Texellub dema çû el-Rehbeyê ji wir peyam şande cem 'Edu el-Dewle û jê hêviya mehrîvanî û bexşînê kir. Wî cewabeke baş da peyaman û deverên ku bixwaze dayê lê bi şertê ku here xwe bavêje derîzana wî. Ebû Texellub ji vê re erê nekir û çû Şamê cem xwediyê Misrê el-'Ezîz Billah.¹⁰

Mirina 'Hesenweyhê Kurdî

Di vê salê [369/979] de 'Hesenweyhê kurrê 'Huseynê Kurdî yê Berzîkanî, ('Hesenweyh ibn el-'Huseyn el-Kurdî el-Berzîkanî) li Sermacê mir. Ew serokê leşkerê Berzîkaniyan bû ku bi navê hêza "el-Berzîniye" hatibû bi nav kirin. Herdu xalên wî, Wendad û Xanemê kurên Ehmed jî, serdarên hinek

leşkerên din bûn ku bi navê hêza "el-'Eyşaniye"¹¹ hatibû bi nav kirin. Wan nêzî pêncî salî li ser hêla Dînewerê, Hemezanê [Hemedanê], Nîhawendê, Samîxanê, hinek hêlên Azerbaycanê û heyanî bigihîje tixûbê Şehrezorê mezinatî kir.

Her yek ji wan serleşkeriya çend hezaran dikir, Xanem di sala 350/961ê de çû ser dilovaniya xwe û kurê wî Ebû Salim Deysem îbn Xanem, li Keleya Qessanê li cihê bavê xwe rûnişt, heyanî ku Ebû el-Fet'h îbn el-'Emîd wî ji ser hukm avêt û keleyên wî yên Qessanê, Xanemabazê û yên din paqij kir. Di sala 349/960î de Wendadê kurê Ehmed mir û kurê wî Ebû Xenaîm Ebdulwehhab kete cihê wî, ew li cihê wî ma hayanî ku Şazinxan l l ew dîl girt û teslîmî 'Hesenweyh kir ku kele û milkê wî tev jê sitand.

Hesenweyh merivekî bextvekirî, siyasetzan û xuyweş bû, ew serdestê kar û barê xwe bû û nedihîşt ku merivên wî diziyê bikin. Wî keleya Sermacê bi kevirên sîmetrîk avakiribû û li ser vê avahiyê li Dînewrê camiyek jî çêkiribû. Hesenweyh heyanî sala mirina xwe ku me li jor got, gelek xêr û xêratan li Mekke û Medîneyê jî dikir.

Piştî mirina wî, zaruyên wî ji hev qetiyar, hinek ji wan bi aliyê Fexr ed-Dewle ve û hinek jî bi ser 'Edud el-Dewle ve çûn. Zaruyên wî ev bûn: Ebû el-'Ula, 'Ebdurrezaq Ebû el-Necm Bedr, 'Asim, Ebû 'Ednan, Bextiyar û 'Ebdulmelîk.

Bextiyar bi mal û zexîreyê ve li keleya Sermacê dima. Wî pêşî ji 'Edud el-Dewle re name rêkir û diyar kir ku ew dixwaze têkeve bin emrê 'wî, lê piştî fikrê xwe guhert û berê xwe jê dagerand. Hingê 'Edud el-Dewle leşkerekî giran rakir û berê xwe da ser wî û birayên wî, dora wan girt û keleyên wan tev ji wan sitandinin. 'Edud el-Dewle ji nav hemiyar birayê wan Ebû el-Necm Bedr îbn 'Hesenweyh hilanî, zîlam danê û ew xurt kir. Ebû el-Necm Bedr jî wê herêmê tev zeft kir, Kurdên din ên navçeyê jî xistin destê xwe û rewşa xwe xweş li hev anî. Ew mirovekî aqilmend, jîr û zana bû.10

Jêrenot:

1. Ji ber ku berê di hejmara kovara Çirayê ya dehan de hinek cihên vê berhema Îbn el-Esîr hatibû weşandin û hingê li wir li ser vê berhemê û xwediyê wê û herweha li ser awayê wergerandina van cihên ku tê de qala Kurdan dike jî agahdariyeke kurt hatibû dayin, min li vê derê pêwîst nedît ku ez wê careke din dubare bikim. Çendî ku hinek tiştên wê yên di heqê Hesenweyhê Kurdî de û yên din jî mîna bin agahdariyên Îbn Xeldûn jî lê ew ji du berhemên ji hev cuda ne bes Ibn Xeldûn hinek tiştên xwe ji Ibn el-Esîr girtiye. Bi hêviya bexşîn, dil- û bihnfirehiyê ji xwendevanan.

2. Ji berhema Îbn el-Esîr ya el-Kamil fî el-Tarîx Dar Sadir, Dar Beyrut, Beyrût, 1966,

beşa sala 342/953yan, c. 8, rûpelê 500 d. (didomîne) hatiye wergerandin.

3. Ji berhema Îbn el-Esîr ya el-Kamil fî el-Tarîx, Dar Sadir, Dar Beirut, Beyrût, 1966, beşa sala 353/964yan, c. 8, r. 551 d. hatiye wergerandin.

4. Li gor çapa C û P "Muşteki" yan jî "Misteki" û "Meseki" ye, li gor ya B jî "Meski" ye. (Îbn el-Esîr, El-Kamil fî et-Tarîx, Dar Sadir, Dar Beirut, Beyrût, 1966, c. 8, r. 569) Li pêş di rûpelê 500î de "Miseki" derbas bû (Li berhema jorî li rûpelê 500î ku dibe yê pêşî yê vê nivîsê binihêre!)

5. Ji berhema Îbn el-Esîr ya el-Kamil fî el-Tarîx, Dar Sadir, Dar Beirut, Beyrût, 1966, beşa sala 355/965an, c. 8, r. 568 d. hatiye wergerandin.

6. Ji berhema Îbn el-Esîr ya el-Kamil fî el-Tarîx Dar Sadir, Dar Beirut, Beyrût, 1966, beşa sala 358/968an, c. 8, r. 593 d. hatiye wergerandin

7. Niqris êşek e ku li paniya ling û li guzekê dixê. (Mevlût Sarı, El-Mewarid, Arapça - Türkçe Lûgat, Bahar Yayınları, İstanbul, 1984, r. 1549)

8. Ji berhema Îbn el-Esîr ya el-Kamil fî el-Tarîx, Dar Sadir, Dar Beirut, Beyrût, 1966, beşa sala 359/969an, c. 8, r. 605 d. hatiye wergerandin

9. Ji berhema Îbn el-Esîr ya el-Kamil fî el-Tarîx Dar Sadir, Dar Beirut, Beyrût, 1966, beşa sala 367/977an, c. 8, r. 692 d. hatiye wergerandin

10 Ji berhema Îbn el-Esîr ya el-Kamil fî el-Tarîx, Dar Sadir, Dar Beirut, Beyrût, 1966, beşa sala 368/978an, c. 8, r. 695 d. hatiye wergerandin

11. Li gor çapa C, A û B "el-'Îsaye" ye. (Binêre Îbn el-Esîr ya el-Kamil fî el-Tarîx, c. 8, r. 705)

12. Di çapa C de "el-Şazîn'han" e û di ya B de jî "el-Şazîncan" e. (Binêre Îbn el-Esîr ya el-Kamil fî el-Tarîx, c. 8, r. 706)

13. Ji berhema Îbn el-Esîr ya el-Kamil fî el-Tarîx Dar Sadir, Dar Beirut, Beyrût, 1966, beşa sala 369/979'an, c. 8, r. 705 d., hatiye wergerandin.

Edebîyat û hîndarîya zanistîyê

N. Zaxuranî

Mirov bi saya îmajên bi reng zimankî ku bi alîkarîya wan tekstên edebî têne hunandin, hînî naverok û kapasita karînên (îmakanên) edebî yên ku dibine wesîte ji bo hîndarîya zanyarîyê dibe. Ji ber ku ji alîkî ve îmajên bi reng zimankî jiyana civakî li gel dorbera wê didine nasandin, ango wê bi hemû alîyên wê karakterîze dikin, ji alîyê din ve jî, îmajên bi reng zimankî kar û barê zimên bi gelek alî û bi awayekî konkret radixin ber çavan.

Ji bilî vê yekê jî, di serpêhatina vegotina berhemên edebî de mirov bi saya hebûna zimanê xwe fonksîyona xwe ya ji bo kar û barê edebî bi cih tîne. Ev yeka ha jî, pêşiyapêşî ji bo vegotina bi dilşewatî ya bi reng lîrîkî herweha ji bo çalakîyên kesên di berhemên dramatîkî de û ji bo pêşkêşkirina di serpêhatina berhemên bi reng epîkî de tê vegotin, dikare bê gotin. Herweha karakterên ku di serpêhatina çirokan, destan û romanên de têne hunandin, bi alîkarîya dîyalog û monologên wan, ango bi alîkarîya peyvên ku diaxifin û diramin, têne şirove kirin. Herdem metnê berhemeke edebî bi alîkarîya kesên ku xwe bi saya zimanî îfade dikin, tê pê. Ji ber ve yekê jî, ziman ji bo rapêçana berhemên hunerî yên bi reng edebî ne bi tenê dibe wesîte ku mirov bi alîkarîya wî îmajên bi reng hunerî diafirîne, lê di hema demê de ew mîna objeyeke ku tekstên edebî radixe ber çavan dêrdikeve pêşberî mirovî.

Gava mirovê hunermend hewl dide ku zimanî mînsa objeyeke ku tekstên edebî yên bi reng edebî radixe ber çavan destnîşan bike, bi alîkarîya vê yekê şematîzmekirna îmajên zimankî kêmtir dike û bikaranîna wan bêtir sehl dike. Bêguma, gava nivîskar hewl dide ku îfadeyên zimankî raxîne ber çavan, ne bi tenê bandorê li ser fantasîya xwendevanî dike, herweha li ser pêjnên wan yên hiskirinê jî, bandorekê dideyne: Ji ber ku struktura vegotina hunerî bi awayekî ji awayan his an jî tonê / dengê mirovê ku diaxife jî tesbît dike.

Bela vê yekê jî, herçiqas edebîyat bi awayekî fizîkî / cismanî mirov nikare pê bihise jî û xwendevan bi tenê bi alîkarîya guhdarkirinê pê şa dibe jî, deng

an jî tonê mirovî tènê meydanê. Ji ber ku vergerandina tekstên edebî yên bi reng his an jî tonî ji bo leyîstikvan û bîneran gelekî girîng î bi reng jîyanî ne. Lê bêguman ev yeka ha ji bo xwendevanan jî gelekî girîng e.

Biqasî ku edebîyat diyardeyên (fenomenên) jiyana civakî bi alîkarîya zimên radixe ber çavan, ewqasî jî kar û barê ku bi alîkarîya zimên tê pê jî radixe meydanê. Vêca, dê ji ber vê yekê bê ku edebîyat bîrewerîya mirovantîyê ya bi reng civakî û hebûna mirovî ya bi reng xwezayî bi awayekî bi reng hunerî vedibêje û ji xwe re dike mijar.

Mîna ku baş tê zanîn, ziman wek goşt û xwînê bi ramandina mirovî ve bi awayekî organîkî girêdayîye. Ji xwe yek ji fonksiyonê serekî yê zimên ew e ku prosesa ramandinê li dar bixe. Bela vê yekê jî, edebîyat mîna bîrewerîyeke bi reng civakî bi awayekî yekser prosesên ramandinê ji nû ve diafirîne. Ev yeka ha, li ba şaxên din yên huner ne bi awayekî rast û rê, ji berevajî bi awayekî îndîrek nêzîkî ramanadina mirovantîyê dibe. Mînak, gava ku mirov li melodîyeke Mehemed Şêxo yeke bi dilşewat guhdarî dike, mirov bi pîkolî û çavsorîya li ser welêt dihise. Bî saya vê yekê jî, mirov liqayî êş û keserên gelê xwe dibe. Bivê nevé ev yeka ha jî mirovî bêtîr nêzîkî xebata bi reng niştîmanperwerî dike. Lê, li himberî vê yekê gava ku mirov li bajarên Kurdistanê liqayî peykerên “Beton Misto” dibe, mîna mirovekî kurd mirov hemû çepelî û zordarîya kolonyalîzmê di nav rûdêna wî de dibîne. Ji ber ku peykerê wî ji bo me kurdan tê wateya dûrutî û dagirkerîyê. Lê çî heye ku di van berhemana de bi awayekî konkret tu ramandin ji nû ve nayêne afirandin. Li pêşberî vê yekê, berhemên edebî hê ji serdemên kevnar ve prosesên ramandinê di monolog û diyalogên qahramanên berhemên bi reng lîrîkî û çalakîyên qahramanên berhemên bi reng epîkî de têne xwîya kirin.

Heta carinan di berhemên hunerî de yên ku bi alîkarîya zimanî têne pê, ramanên ku ji alîyê fîguran ve nehatine ramandin jî, ji alîyê hunermendî ve têne vegotin. Hê di çirokên bi reng gelêrî de ramanên ku mîna tasawûr ji alîyê rovî, gur an jî pira sêhrdar ve dihatin tasawûr kirin, ji alîyê çirokvanî ve dihatin pêşkêş kirin.

Bi piranî, berhemên edebî nerîn û ramanên qahramanên berhemên bi reng hunerî yên felsefî, civakî, olî, axlaqî, evîndarî û dîrokî di nav rapêçana xwe ya hunerî de bi cih û war dikin. Trajedyên kevnar an jî destanên mîna Memê Alan di vî warî de berhemên hêrî ber bi çav in. Ji bilî vê yekê jî, di berhemên edebî yên ku xwedîyên misteweke global in, pirsgirêkên felsefî û yên reng bi entelektûalî dibin mijar ji naveroka wan re. Mîna mînak mirov dikare Fausta Goethê û berhemên Sartrê yên ku ji pevçûn û gotûbêjên bi reng

ramanî dagirtîne, bide. Bi saya berhemên weha yên bi reng hunerî mirov hînî kar û barê serdema wan yê di warê hunerî, felsefî û entelektûalî bibe.

Di serpêhatina berhemên edebî de prosesên bi reng ramanî bi alîkarîya vegotina îmajên bi reng hunerî mirov dikare jiyan û ramanên qahramanên berhemên hunerî li gel çalakîyên wan yên cur bi cur raxîne ber çavan. Lê belê, divê bê zanîn ku îfadeyên qahramanên bi reng lîrîkî bi tenê ramanên wan naraxin ber çavan, herweha bandor, daxwazî, lêgerîn û kelecane wan jî, bi gelek alî şirove dikin. Mirov dikare bibêje ku di vê pevgerêdanê de jî berhemên edebî ji berhemên din yên bi reng hunerî bêtir xwedî karî in. Ji ber ku berhemên resm û yên plastîkî nîyet û hisên mirovan bi awayekî nerast û rê angê bi alîkarîya helwdan û îfadeyên rûkî radixin ber çavan. Mînak, gava ku mirov li tabloya Mem û Zînê dinere, ji ber gelecîya gelecane mirov dibîne bê çî tabloyeke bi dilşewatî ye, lê mirov nizane bê Mem û Zîn li ser çî diramin, hevî û daxwazên wan çî bûn, evîna wan ya dijwar çî anî bû serê wan.

Lê, li pêşberî vê yekê, mîna cureyekî hunerî edebîyat li gel vegotina rast û rê helwdan, rabûn û rûniştin û îfadeyên rûdênkî, bi alîkarîya hewldanên nivîskarî ku dixwaze di serpêhatina berhemên edebî de vebêje, pêşkêş dike. Herweha bi alîkarîya tasawûr û ramanên ku qahramanê berhemê dibêje, prosesên ramandinê yên dil û hinavkî bi awayekî konkret û rast û rê vedibêje, radixe ber çavan.

Bêguman, nivîskar bi alîkarîya vê yekê îfadeyên zimankî yên mirovan bi kelecane û bi gelek alî di serpêhatina hunandina tekstên xwe yên edebî de vedibêje. Bela vê yekê mirov dikare bibêje ku nivîskar bi alîkarîya vê vegotinê xwe berdide nav kûrahîya gîyana (rihê) mirovî. Vêca, mîna ku bi hêsanî tê xuya kirin, ev cidabûna ku dibe bingeh ji bo hunerê ku bi alîkarîya zimanî têne pê û bi saya vê yekê hunerên zimankî ji yên ekspresîf tê cida kirin.

Herçiqas muzîk û dans (dîlan û govend) ji hemû hunerên din bêtir xwe berdidin nava qorzîkên dil û giyana mirovî jî, lê divê newê ji bîr kirin ku dema hunerên ekspresîf (yên bi îfade û his û pêjn) vê yekê pêk tînin, bi alîkarîya îmajên giştî jiyan mirovantîyê bi xetên wê yên serekî aks dikin. Bi vî awayî jî, ev akskirin herçiqas bîrewerîya mirovî ya bi reng civakî ronî dike jî, peywendîyên rast û rê yên bîrewerîyê yên bi fenomenên konkret re nayêne li dar xistin. Mînak, gava ku mirov li melodîya Saîd Yusuf ya bi navê “Dawetek li gundê me ye rabe da em herin dawetê” guhdarî dike, mirov bi hemû dansa wê ya payebilind dihise, mirov bi dilşahîya hisî ya evîne şa dibe, lê mîna ku tê zanîn mirov nikare vê şahîya stranê bi rewşeke dîyar ve an jî

bi îmajeke konkret ve girê bide. Bêguman, guhadar kê m -zêde bi coşa hisî ya bi reng evînî tasawûr dike, ango dibe ku guhdar xwe di nav pêlên heyecana muzîkê de winda bike, ji vê yekê wîrdetir, mest û dilşa bibe. Bela vê yekê jî, mirov dikare bi hêsanî bibêje ku muzîk bi alî'karîya tasawûrên weha yên bi vî rengî bandora (tesîra) xwe li ser giyana guhdaran dideyne.

Lê, mirov nikare vê yekê ji bo tekstên edebî jî bibêje. Ji ber ku rewş di tekstên edebî yên bi reng hunerî de cida ye. Hisên mirovî li gel îrada wî di metnên edebî de bela ku bi serpêhatina jiyana civakî re bi gelek alî û bi awayekî organîkî girêdayî ne, bi awayekî rast û rê mîna fenomenên konkret têne raxistin. Mînak, heger ku em şîra Melayê Cizîrî ya bi navê “Xema işqê perirêhtim ez hebîba xemrevîn kanî” bêne bîra xwe : Melayê Cizîrî di vê şîra xwe de bi awayekî BOTANî ji bo evîna “Hebîba xwe ya xemrevîn” serî hildaye. Gava ku mirov vê şîra wî dixwîne, his û pêjnên wî yên dilşikestî ku ji dorbera xwe digre, di nav rapêçana çarînên wî de dibîne. Hingî Melayê Cizîrî di nav pêlên evîna “habîba xwe ya xemrevîn” de serxweş û mest dibe, êdî ew ne bî tenê li dîlbera xwe dike hawar û qêrîn, herweha ew li pêşberî Mîr jî serê xwe bi gilî û gazinkî radike. Ji ber ku ew dibêje:

“Xeber bit ba şker xayê şepal û xûbû zêyîn bayê
Ko Mîr e belkî bîr nayê esîrek wî dizindanî
Esîrim lerze û tavî me taqet vê re pernavî
Di hebsa wî qet min navî dikim firyad û evxanî
Min navit ku ez firyad kim li zilma dîlberê dad kim
Seher dê şûbhê ferhad kim bidim rih ji kovanî”

Bêguman, gava ku mirov van çarînên Melayê Cizîrî dixwîne, mirov dibîne ku şair peywendîyên di navbera jiyana rojane ya civakî û bîrewerîya xwe ya bi reng şairî bi awayekî tekûz danîye. Ji xwe, bingehê hunerê ku bi alîkarîya peyvên li hevhatî tê danîn, li ser vê yekê tê ava kirin. Ji ber ku di edebîyatê de her hiseke şairî dibe refleksek di bîrewerîya şairî de ya li pêşberî fenomenên civakî ku herdem di tevgêrê de ne.

Herçiqas, gava ku mirov van çarînên Melayê Cizîrî dixwîne, mirov ji ber qêrîn û hawara Melayê Cizîrî bêzar bibe jî, dîsa jî mirov pariyekî bi dijwarî be jî, amanca çarînên wî fêhm dike.

Naxwe, tekstên edebî xwedî karînên ku prosesên ramandinê yên jiyana civakî li gel rastîya dorbera mirovî bi awayekî rast û rê û yekser şanî mirov

bide û li gel hemû xeml û xêza jiyana civakî ya ku xweşîyê û dijwarîyê di nava xwe de dirapêçe, raxîne ber çavan. Ji bilî vê yekê jî, tekstên edebî his û nîyetên mirovî yên ku bi gelek alî û bi awayekî organîkî bi ramanên mirovî re girêdayî ne, bi metodeke azadî cesûr mîna dayikeke ku pêçeke xwe himbêz dike, di nav rapêçana hunandina xwe ya bi reng hunerî de bi cih û war dike.

Di hema demê de, metnên edebî bi alîkarîya vê cih û warkirinê him mirovî di mistewa ferd de û him jî mirovî di mistewa civakî de li gel çalakî, bûyer, pevçûn bi awayekî berferêh û bi piralî li gor pîvanên estetîkî aks dike. Bela ku mirov nikare tekstên edebî di hecm û mekanî de bi sînor bike, nivîskar bi alîkarîya vê fersendeyê prosesên civakî û bûyerên bi reng netewî yên ku di çarçoweya dîrokeke konkret de têne meydanê, bi awayekî berferêhî bi zehv alî şîrove dike. Bi rastî jî, gava ku mirov di vî warî de tekstên edebî bi tabloyên resm an jî bi hunerê tîyatroyê re muqayese dike, mirov dibîne ku berhemên edebî bêtir dikarin fenomenên jiyana mirovantîyê yên ku di serpêhatina jiyana civakî de peyde dibin, aks bikin, ji vê yekê wirdetir wan bi gelek alî şîrove bikin, da ku xwendevan bikaribin wan fêhm bikin. Dê ji ber vê yekê bê zanayê serdema ronakbîrîyê Lessing di vî warî de bi mafdarî weha digot: “Îmajên necismanî yên zimankî bêyî ku zararê bidin hevdû bi kapasîta herî fereh dikarin bêne ba hev.”

Naxwe, mîna şaxekî hunerê edebîyat xwedîyê rengê netewî û navnetewî ye, ango xwedîyê rengê bi reng globalî ye. Edebîyat bi alîkarîya zimanî rastîya jiyana civakî dikare aks bike, bela vê yekê jî tu sînor li pêşberî hunerê ku bi alîkarîya zimên tê hunandin, nîne. Vêca bi saya vê yekê, huner fonksîyona xwe ya bi reng zanistî bi hemû hêza xwe di warê hunerî de pêk tîne. Bêguman, di vî warî de ji alîyê mirovê hunermendî zana ve gelek tişt hatine gotin. Mînak, sertaca felsefa îdealîst ya Alman, Hegel digot ku edebîyata bi reng hunerî ew e ku: ” Her naverokê.... bi herawayî/şiklî dikare bistire û bîne zimanî.” Bi rastî jî, edebîyat bê fantasî/xeyala mirovî çawa bê sînor e, herweha edebîyat jî, di kar û barê xwe yê bi reng hunerî de mirov nikare bi tixûb bike. Dê qey ji ber vê yekê bê ku Çernîşevskî ji bo karînen edebîyatê ango yên hunera bi zimên bê çiqasî dewlemend in, weha diramî:” Hemû hunerên din nikarin sedyêke ku hunera bi zimankî ji me re dibêje, bibêjin.”

Hê di destpêka jiyana bi reng dîrokî ya mirovantîyê de di nav rapêçana berhemên hunerî de çalakîyên qaramanan dihate aks kirin, hoyên ku ji bo çalakîyên qaharamanan dibûne sersebeb, dihatine karekterîze kirin û dorbera

van çalakîyan mîna tabloyeke dihate resm kirin. Mînak, di “Îlîasa” Homeros de ji alîkî ve sersebên gîyanî (rihî) yên çalakîyên qahramanan dihatine destnîşan kirin, ji alîyê din ve jî, cihana wan li gel dorbera wê ya objektîfî bi awayekî zelal î vekirî dihate raxistin. Herweha di demê piştire yên bi reng dîrokî de gava ku berhemên giran biha yên bi reng hunerî dihatin afirandin - mînak”Komedyaya îlahî” ya Dantê, “Mem û Zîna” Ehmedê Xanî, trajedyên Shakespearê û “Don Kîşota” Cervantes - mirovî bi pêşkêşkirina îmajên xwe yên dewlemend î bi nirx şaş dikin.

Lê divê bêzanîn ku karînen edebîyatê yên ku raxistina dîyardeyên civakî û hîndarîya zanistîyê pêk tînin, di sedsala 19an de - çî li Rusyayê û çî jî li welatê ewrûpa - bi saya geş û balbûna tevgêra edebî ya realîst bi awayekî gelemperî bêtir bi kapasîta hate bikaranîn. Ji ber ku gava mirov berhemên edebî yên Balzac, Standahl û Dickens dixwîne, mirov dibîne ku van nivîskarên bi nav û deng bi alîkarîya berhemên xwe jiyana welatê xwe û ya serdema xwe bi awayekî bi rêk û pêk î bi detay şirove kirine. Vêca, heger ku mirov Mem û Zîna Ehmedê Xanî mîna ansîklopedîya jiyana gelê kurd binirxîne, dê mirov di vê pevgirêdanê de rastîyeke bi nirx dest nîşan bike. Ji ber ku Ehmedê Xanî nexwestîye bi tenê evîna Mem û Zîna bi alîkarîya îmajên xwe yên bi reng hunerî vebêje, herweha wî hewl daye ku rewşa gelê Kurdistanê ya serdema xwe li gel pîrsgirêk û dijwarîyên wê raxîne ber çavan. Lê mixabin, pîştî ku ew çû ser dîlovanîya xwe raman û hêvîyên - yekitîya gelê Kurdistanê, serkêşîyeke bi rêk û pêk, hînbûna ilm û îrfanê û yên din - wî di warê jiyana de ji alîyê rewşenbîrên me kurdan ve bi awayekî organîkî nehatine jiyandin da ku mirov bi alîkarîya wan bikaribe pîrsgirêkên gelê Kurdistanê çareser bike.

Taybetmendîyeke edebîyatê ew e ku edebîyat di nav rapêçana metnên xwe de hemû cureyên pîrsgirêkên civakî, netewî û navnetewî bi cih û war dike. Mirov dikare bibêje ku edebîyat ji vî alî ve gelekî rengîn î dewlemend e. Nivîskarek dikare di nav rapêçana metnên berhemên xwe de nerînen xwe yên cur bi cur - çî yên çivakî û çî yên netewî - bi kirasekî îmajî vebêje. Lê, nivîskarên ku nerînen xwe rast û rê vedibêjin, nehindik in.

Bêguman, nivîskar bi alîkarîya van nerînen xwe yên rast û rê di nav hunandina tekstên edebî de qahramanên xwe yên fiktîf bi zehv alî taswîr dikin, çalakîyên wan li gel dorbera wan ya bi reng civakî di çarçova pîrsgirêkên bi reng dîrokî de bi awayekî karakterîstîkî şirove dikin. Mirov di vî warî de bi sehlî dikare gelek mînakan bide, lê bi ya min mînaka herî ber bi çav şîira Seydayê Tîrêj ya bi navê “Ey bilbilê dilşadî hele wer bike fîgan” ku li ser

trajedîya 1975an hatîye vegotin, mirov dikare li ser raweste. Dewleta Îraqê li himber tevgêra netewî ya ku di bin serokatîya Mustafa Berzanî de dihate birêvebirin, di hemû warê jîyanê de hatibû zewirandin. Lewra kolonyalîstên Baxdayê dikirin û nedikirin zora tegêra netewî nedibirin. Le çî heye ku dagirkerên Îraqê konjektûra siyasî ya ku li Rojhilata Navîn û li cihanê zal bû, baş ji bo meremên xwe yê barbarî bi qerêj bi kar anîn. Dagirkerên Îraqê ji alîkî ve têkilîyên xwe bi Sovyeta “sosyalît” re xweş dikirin, ji alîyê din ve jî peywendîyên xwe bi şahê Îranê, bi pêçekên moxolan re û ne rast û rê be jî bi revebirina Emerika ve serast dikirin. Vêca, pîştî vê yekê, gava ku tevgêra kurd çî li Rojhilata Navîn û çî ji li seranserê cihanê di hêla siyasî de hate îzole kirin û gava ku mirov nejrûbûna rêvebirina tevgêra netewî ya 75an ku ne dost û ne jî dijminên xwe yê - lewra berpirsyarên van rêxistinên hê di rojên ku em têde dijîn jî siyaseta xwe ya li derva li ser hevkarîya bi dewleteke dagirker re dideynîn - sereke bi awayekî ku ji wan dihate xwestin, neveqatandin, têne ber çavên xwe pirsgirêk ji mirovî ve zelatir dibe. Bela vê yekê, ji ber ku ew nexwedîyê strarêjîyeke netewî bûn, trajedîya me kurdan ya 75an bû rastîyeke bi reng jîyanî yeke tehlî bi reng jehrî. Hê jî, serok û berpirsyarên vê trajedîyê li şûna siyaseteke netewî siyaseta xwe ya bi reng herêmî - bahdina, soran - bi rê ve dibin û ji ber vê yekê jî dibin sersebebê “brakujî”, alozî, tevlihevî û kambaxîyê li seranserê Kurdistanê. Mirov îro roj nikare bi dilşadî bibêje ku berpirsyarên trajedîya 75an dev ji vê siyaseta xwe berdane.

Di vê navberê de Seydayê Tîrêj hew xwe digre û dibêje:

“Ey bilbilê dilşadî hele wer bike fîgan
 Dêrde me giran e, ey bira birîna me kur e
 Gorî te bin cergo dilo û hinav û him can
 Dengê te ye xweştir ji ney û nayû bilûr e

Çar hawîrdorê me diz û keleş in, tev de dijmin
 Me ji hev diqetînin birr bi birr heyf û mixab in
 Qet çar û umîda me nemaye bilbilê min
 Meydan e ji bo hirç û çeçel rovî û keftar

Meydan e ji bo hirç û çeçel rovî û keftar
 Gorî te me bilbil ji serdarê tu wer xwar
 Da pêk ve mijul bibin çend salê di dijwar
 Îro li me ferman e li ser gerdenê şûr e”

Bêguman, mabesta Seydayê Tîrêj bi hevoka “Meydan e ji bo hirç û çeçel rovî û keftar” serokên dewletên kolonyalîst yên ku her çar kenarên welatê me bi darê kotekê zeft kirine, bi xwe ye. Van çeçel, rovî , hirç û keftaran bi hemû hovîtiya xwe hewl didin ku tevgêra rizgarîxwaz ya gelê Kurdistanê bi hev re vemirînin. Gava ku mirov li ser vê şîra Seydayê Tîrêj dirame, mirov dibîne ku Seyda hewl daye ku bi alîkarîya vê şîra xwe mîna pîrsgirêkeke netewî li ser trajedîya 75an di nav rapêçana peyvên hunerî de mijûl bibe. Lewra şîra Seydayê Tîrêj trajedîya 75an bi hemû aliyên wê ji xwe re dike mijar. Gava ku nivîskar weha bi vî rengi nerînen xwe bi awayekî rast û rê pêşkêş dikin, berhemên edebî di warê analîz û ronakbîrîyê de him ji aliyê mijar û him jî ji aliyê naverokê ve bêtir bi wate dibin. Lê mirov vê yekê nikare ji bo şaxên huner yên din bibêje. Ji ber ku hunera edebî bi hêsanî rê dide şair ku nerînen xwe bi goşt û can bike. Nivîskar dikare nerînen xwe yên bi reng felsefî, civakî, dîrokî, epîkî û dramatikî pêşkêş bike.

Ji aliyê din ve jî, gava ku mirov li ser metnê şîra Seydayê Tîrêj di warê zimên û kompozîsyonê ve dirame, mirov dibîne ku teksta şîra Seydayê Tîrêj bê bi çî kurdîyeke Petî (fesih) hatiye afirandin. Lewra peyvên tekstê hema bibêje hemû bi kurdîyeke sadeyî bi reng gelêri ne. Gava ku mirov metnê vê şîra Seydayê Tîrêj bi tekstên şîrên Melayê Cizîrî an jî yên Ehmedê Xanî re muqayese dike, mirov dibîne ku Seyda ji berevajîya Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî metnê şîra xwe xwerû bi kurdî nivîsandîye. Jî ber ku Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî di serdema afirandina şîrên xwe de gelek peyvên bi farisî û erebî bi kar anîne.

22 / 01 / 99

Stockholm

Bîranîna sibehekê

Siddik Bozarslan

Nêzîkî mala me, bi qasî dused metroyî dûr bi navê 'Quleteynê' goleke piçûçik hebû ku heywanên me ji wir av vedixwarin. Ava vê golê wek avên kaniyên din ên gund ji bin erdê derdiketin, bi coyêke piçûk de diherikîn, diçûn û zivistanan germ dibûn û havînan jî sar dibûn. Bi taybetî dema berf zêde diket, hilm ji wan avan dihat. Car carê min û hevalên xwe me xwe ji malê vedizî û bêxebera dê û bavên xwe em diçûn ser Quleteynê û hema di carekê de me xwe tazî dikir û me xwe davêt nav avê. Av ji bo me zarokan bûbû wek pêşberikek. Yekî ji me cilên xwe derdixist, xwe dixist bin avê û zarokên din jî digel hev û bi dengekî bilind wek qoroya musîkê dest bi jimareyê dikirin û digotin: Yek, du, sê, çar, pênc, şeş, heft, heşt, neh û deh û her weha berdewam dikirin. Kî ji me di bin avê de zêde bimana, pêşberik wî qezenc dikir. Di van pêşberikan de berf û serma çibûn me qet nizanibû ango me nedihesibandin. Piştî ku em bûn neh-deh salî, carina jî em diçûn Kaniya Gund û Kaniya Extanê ku golên wir piçekî mezintir û kûrtir bûn. Me ev pêşberik li wir dubare û sêbare dikirin. Gundiyên ji wan kaniyan ava vexwarinê danîn malên xwe. Lewra çûyîn û hatina wir zêde bûn û nedibû ku em pir caran herin wir. Xortên panzdeh-şanzeh salî û jortir û zilaman jî dema cenabeta xwe derdixistin, sibehan zû beriya ku keç û jin herin avê bînin, diçûn wir û xwe dişuştin. Nîşana xortaniyê ku êdî dibûn mêr ew bû ku dema şeytan bi wan dikeniyên û sibehan ew diçûn li kaniya gund cenabeta xwe derdixistin; mezinan fêhm dikirin ku êdî filan xort an bêvan xort bûye zilam.

Dema ku me ew pêşberik çêdikirin, li erdê derdora Quleteynê, Kaniya Gund û Kaniya Extanê bi hindikayî nîv metro berf hebû. Ez wan pêşberikên xweşik tu carî nikarim ji bîr bikim û xweşikiya wan deman mumkun nîne ku ez ê bikaribim bi çend gotinan an bêjeyan bînim ziman û raxim ser kaxizan.

Car carê, êvaran berfê destpêdikir û heta sibehê dibariya. Dema em roja din sibehê radibûn, me didît ku bi qasî nîvê qama mirovekî an derdora 50-60 ango 70-80 santîman, heta metroyekê berf ketiye û derdora malan her alî ji berfê hatiye xemilandin. Di demên weha de rehmetiyê bavê min û birayê

min ê mezin, carina jî digel pismamê min bi bêran destpêdikirin û rê vedikirin heta Kaniya Gund an jî Kaniya Extanê. Diya min û jinên din jî cer û satilên xwe yên avê digirtin û li pey mêran dimeşîyan. Ava xwe dadigirtin û dizivirîn malên xwe. Her weha hewcedariya ava vexwarinê ji bo malan danîn şûnê. Piştî ku zilam digel jinan dizivirîn malê; karê zilaman yê duwemîn jî ew bû ku herin ser xanî û bi micerfan berfê paqij bikin. Piştî berf paqijkirinê îcar dor dihat ser loxê. Hewce bû ku bi qeys ser xanî bihatana loxkirin da ku ava bin berfê li ser xanî necive û dilopên avê nehên hundurê malê. Ji ber ku xaniyên gund hemû ji axê hatibûn çêkirin; dema berf ango baran bibariyan karê zilaman ew bûn ku ser xanî lox bikin. Dema ez jî li derdora deh-yazdeh salî bûm, di karê berf paqijkirinê de bi kêfxweşî beşdar dibûm. Digel berf paqijkirinê hêdî hêdî loxkirina ser xanî jî hîn dibûm û carina digel bavê xwe ango birayê xwe yê mezin bi awayekî pir dîqet karê loxkirinê jî min pêk dianî. Lê karê loxkirinê ne hêsan bû. Carina mirov dikaribû bişemite û ferên qeys ji loxê derkeve û ji nişka ve lox biherike here. Wê demê tehluka hebû ku lox biherikiyaya xwarê. Lewra di karê loxkirinê de nedibû ku mirov bi lez here û were. Hewce bû ku bi gelek dîqet û hêdî hêdî ev kar pêk bianiyan.

Li gundê me dibistan tunebû. Yekemîn car min û xwarziyê xwe Behrî me dest bi dibistanê kiribû. Em her roj seetekê ji gund diçûn qezayê û piştî dibistanê seetekê jî ji wir dihatin gund. Di wan rojên berfepûk ên dijwar de em çend caran ji xenaqê xilas bûbûn. Lewra pirî caran ku berf dibariya û telukeya pûkandina berfê hebûyaya, em digel mezinan ango bi hindikayî bi mezinekî re diçûn qezayê û dihatin. Pirî caran jî birayê minî mezin Bakî digel me dihat û diçû. Jiber ku dikaneka wî yê cildirûnê li qezê hebû, ew jî her roj diçû qezê û êvaran jî dizivirî gund û pirî caran jî digel me dihat û diçû.

Dema berf li erdê pir dibû û ezman sayî dibû, berf hişk dibû, dibû wek tehteke qerase yê bê serî û bê binî. Wan deman di newal û gazên riya qezê de me çenteyên xwe yên dibistanê dixist binê xwe û wek tawik ewana bi kar danîn û me xwe gêr dikir. Di demên weha de me ji xwe re riyek didît ku em digel birayê Bakî neçin qezayê. Êdî wer bûbû ku em bi tenê di ciyên duz de dimeşîyan, lê di hemû serberjêran de û bi taybetî di serberjêra Newala Xizêfê de heta binê Xincisê ser riya papûrê me xwe gêr dikir. Êdî wer dibû ku di çend hefteyan de çenteyên me dibûn wek seradan û diqetiyan û em neçar diman ku çenteyên nû bistînin. Lê ev jî ji me re dibûn sedemê gelşên mezin da ku birayê minî dikandar hêrs dibû û carina jî li me dixist û em didan ber şimaqan. Belam qeweta wî ya kirinê zêde tunebû. Wî bi zora belayê debara malê

dimeşand. Lewra dema pir hêrs dibû da me dîsa çente qetandiye, carina em didan ber şimaqan an bi guhên me digirt dikişand û digot carekê din bi çenteyên xwe li ser berfê xwe gêr mekin. Min û xwarziyê xwe me digel hev soz dida ku carekê din em ê xwe bi çentikan gêr nekin. Lê dîsa me bi ya xwe dikir û ew qebeheta xwe dubare û sêbare dikir. Carina jî wî ceza dida me da ku em bi tena serê xwe neçin dibistanê, divê em digel wî herin. Bê guman dema ku ew digel me dihat, me ji tirsê wî newêribû bi çentikên xwe ve xwe li ser berfê gêr bikira. Ew rewşa me heta buharê ku berf êdî diheliya berdewam dikir.

Demên zivistanê lîstikên me yên berfê pir bûn. Me bi topên berfê têra xwe dileyîst. Me ji berfê xanî ango mirovên ji berfê çêdikirin. Ew xanî û mirov bi rojan heta bi hefteyan li erdê diman, heta ku nermayî çêbûbûya û berf biheliyaya. Me bi wan lîstikan hem li gund û hem jî li dibistanê dileyîst.

Piraniya zarokan heta bi tevayî em xwedanê meymûnan bûn jî. Li ser cemedê me meymûnên xwe berdidan û zîrekiya xwe nîşanê hev û du dida. Yên ku meymûnên wan û benên wan ên badanê baş bûn û di warê benpêçana meymûnê de zîrek bûn, herî zêde meymûnên wan li ser cemedê digeriyan û herî dawiyê diketin. Bi taybetî dema wan meymûnên xwe davêtin ser cemedê û dengê vizênîyê ji wan dihat, hevalên hawirdor jî bi heyîrmayî li wan temaşe dikirin. Ew jî di nav me zarokan de bûbûn sedemên pêşberikan. Ew pêşberika meymûnê, carina li gund destpêdikir û heta qezayê û nêzîkê dibistanê berdewam dikir. Bi taybetî di nav zarokên piçek mezin de ew pêşberik carina dibûn qumar jî. Yanê ewana li ser meymûnan jî dileyîstin. Bê guman wek qumara li ser peran di wê qumarê de jî yên ku wenda dikirin, meymûnên xwe didan yên serketî. Di wan lîstikan de çend carekî min jî meymûn qezenc kiribûn. Ji ber ku meymûna min jî baş bû û ez bi xwe jî bi kêrî wê lîstikê dihatim. Lê piranî min nedixwest wek qumarê li ser meymûnan bileyîzim. Carina em jê têr nedibûn ku piştî xilasbûna dersan di riya dibistanê de û bi taybetî di Kuça Kazim de, heta dikana birayê min ev pêşberik berdewam dikir. Bê guman ev jî carna dibûn sedemên ku em ji dersê dereng bimînin û dereng herin dikin. Ew rewş pirî caran dibûn sedemê pevçûn û hêrsbûna birayê min. Belam ez û xwarziyê xwe li cem wî wek şagirtî dixebitîn. Nedibû ku em dereng bimana. Ji ber sedemê lîstika meymûnan ku em dereng diman û bi taybetî li ser îxbara birayê minî herî piçûk Mehrem, du-sê caran birayê min li bêrîkên min nêrîbû; meymûna min a xweşik jê derxistibû, avêtibû sobeyê şewitandibû û derdê serê derdan di ser de jî guhên min kişandibû ango min dabû ber şimaqan. Belam min meymûna xwe

nedabû Mehrem da ku ew jî pê bilîze û ew jî her weha bi îxbarê tola xwe ji min sitandibû.

Dema berf li erdê pir diket û hişk dibû, me li gund bi tawikan xwe berdida. Bi awayekî din ew ji bo me zarokan û heta ji bo mezinan jî dibû sporeke xweşik. Li pêşiya mala me hetanî Kaniya Extanê çend derên serberjêr hebûn ku têra xwe dirêj bûn û ji bo bi tawikan xwe berdanê ango gêkirinê derên gelek baş bûn. Ji bo me zarokan tawikên piçûk hebûn. Ji bo mezinan jî tawikên mezin hebûn ku ewana di karên malê de jî dihatin bikaranîn. Carina dema pêwistî hebûya, gundiyan bi wan tawikan ji çiya êzing dianîn. Bi taybetî darên pelan ku ji bo heywanan gelek pêwist bûn, bi saya wan tawikên mezin dianîn malê. Carina me sê-çar zarokan digel hev bi wan tawikên mezin ve me xwe gêr dikir. Lê ji ber ku tehlukeyên qeza çêkirinê hebûn, pirî caran ji mezinan yek jî digel me siwar dibûn.

Di zivistanan de û bi taybetî demên ku berf pir diket, nêçîrvaniya kew, keroşk û roviyan jî tenê para mezinan bûn. Yên ku ji nêçîrvaniyê his dikirin û ew kar ji xwe re kiribûn wek nexweşiyekê; carina du-sê rojên wan li derve di kozikan de derbas dibûn. Ew pirî caran tî û birçî jî diman, lê nedihatîn malê. Belam van kesan heta tişteke negirtana nedixwestin bi dest vala vegezin malên xwe.

Di nêçîra çûkan de em piçûk jî beşdar dibûn û me ji wê zewqê nesibê xwe distand. Me zarokan di bin pêşevaniya mezinan de li pêşberî malan wek lebig (kemîn) mekevek dadanîn. Wek rext hinik ka û genim li bin mekevê radixist. Mekev dev vekirî dima û em diçûn çend metroyê dûr disekinîn û bi benê mekevê digirt ku em vî benê bi mekevê ve berê girêdabû û amade kiribû û li benda kombûna çûkan diman. Dema çûk bihatana ser rext û têra xwe kom bibûna, wê demê me ji nîşkave benê mekevê dikêşand û mekev di carekê de bi ser çûkan de diket xwarê. Êdî xilasiya çûkên ku diketin bin mekevê tunebûn û ewana hemû dibûn nêçîra me. Paşî me tek û tek ew çûk ji bin mekevê derdixist û serê wan jê dikir. Piştî ku karê serjêkirinê tewa dibû, îcar dor dihat purtkirin û paqijkirina çûkan û herî dawiyê me carina li hundur û carina jî li derve li ser berfê agir vêdixist û nêçîra xwe kebab dikir û bi zewqeke mezin dixwar.

Li vir hewce ye ku ez behsa berfedimskê jî bikim ku tama wê hin jî di devê min de ye. Dema berf nû diket, me zarokan berf dixwar û me her tim dixwest em berfê bixwin. Dema me zêde berf dixwar, em bi kuxukê jî diketin. Lê dê û bavên me her tim ji me re digotin ku berfa ewelîn ku dibare, zekem e, divê mirov nexwe. Ji bilî wê jî ewana dîsa digotin ku zêde berfê

nexwun, hûn dikarin nexweş bikevin. Piştî ku berfa duwem û sêyem diketin, dor dihat çêkirin û xwarina berfedimskê. Mezinekî an mezineke malê diçû derve, ji ser daran berfa paqij dixist tepsiyekê, bi qasî ku têra nifûsên malê bikiraya tije dikir û dianî malê. Dayîka min dîms dixist nav berfê û li me hemûyan parve dikir. Em jî bi kevçiyên diketin ser û me têra xwe berfedimsk dixwar.

Li nêzîkî mala me darên tû, beyiv, gûz, mazî, elûce, hincas, benav, hewr, hincîr hebûn. Çend sed metro dûrî mala me bexçeyekî me yê xweş jî hebû ku bavê minî rehmetî bi keda xwe emrê xwe dabû pê da ku her roj xweştir bibe. Li wir darên hewr, beyîv, gûz, hinar, sêv, biyuk, tû, xewx, elûce, hincas, mişmiş, hincîr û hwd. yê cûre cûre hebûn. Li gor beşn û ziravî ango qelindiya wan, ewana hemû di bin berfê de reng û wêneyên cuda cuda didan derdora xwe û xwe di nav erd û ezmên de dixemilandin. Guliyên daran wan dixemiland û wan dikir wek bûkên cilspî ku dawetên xwe çêkiribûn û şeva ewil di odeyên xwe de, bi evîneke mezin û dev biken li benda zavayên xwe bûn da têkevin gerdekê.

Seet derdora 09an ez ji xew rabûm. Bi rohnîbûna odeyê ve têgihîştim ku berf bariye. Ez berî ku rabim ser piyan, min li şibakê temaşe kir. Guliyên daran mizgîniya berfê dan min û ew texmîna min rast derxistin. Piştî du-sê deqîqeyê temaşekirinê ez ji nav livîna xwe derketim. Ez li pêşberê şibakê rawestiyam, min li derve nêrî. Guliyên darên çaman û hewran ji berfê xwar bûbûn û şewqa xwe ya sipî didan hundirê odeya min a razanê. Min demeke kurt di şibakê de temaşeyê derva û darên çaman kir ku li nav bexçe bûn û li pêşberî odeya min bûn. Paşî ez çûm odeya mezin a runîştinê û li wir li pêşiya çibaka belqonê rawestiyam. Min hema di carekê de deriyê belqonê vekir û li nav derî rawestiyam. Ez nîv taziyî bûm; bi qasî pênc deqîqeyan min temaşeyî derve kir. Şaxên daran têra xwe berf girtibûn û ji giraniya berfê hemû xwar bûbûn. Ew berfa bi bereket wer nexşeyeke xweşik dabû derdorê ku mirov ji temaşekirinê qet têr nedibû. Li nav belqonê jî qasî çar tilî berf girtibû.

Berfa ku şilek bû û hûrik hûrik hin jî dibariya, di 4ê meha 12an 1998 roja îne êvarê destpêkiribû û bi taybetî piştî seet 24ê şevê, yanê destpêka roja semiyê ya 5.12.199'an zêde bûbû, rengeke nû dabû tebîeta Stockholmê. Dar û ber, her derê Stockholmê ji şipîbûna berfê bi carekê ve hatibû xemilandin. Ew wêneya xweşik, hema di carekê de ez bêhiş kirim. Ez bûm wek serxweşkî ku lîtreyeke şereba frensî ya meşhur a bi navê Chateau Petit Village vexwaribe û ketibe nav xeyal û ramanan. Bi hîsên tevlîhev ên kêfê û keserê

çavên min kelegirî bûn, ji histiran tije bûn. Bi wan hîsan min ji belqonê berepaşkî du gav avêtin hundirê odeyê û li ser kursiyê runiştim ku li nik qompîtora min bû. Li pêşiya şibakê, nêzîkî deriyê belqonê ez bi qasî nîv seetekê runiştî mam. Min di nav xeyalên xweşik û keseran de cixareyek kêşand. Paşî ez çûm metbaxê û min qehweyek çêkir. Di nav çar pênc deqîqan de digel fincana qehwê ez carekê din zivîrîm odeyê û dîsa ez li pêşiya şibakê li ser kursiyê runiştim. Ez digel vexwarina qehwê cixareyêke din kêşandim. Lê ji xeyalan him kêfxweş bûbûm û him jî ji keseran min dixwest têra xwe bigiriyama.

Ev xeyalên tevlîhev ku min bêhiş xistibû, wek şerîda sînemayê di ber çavên min de çûn û hatin û di carekê de ez ji Stockholmê, ji taxa Brommayê dûr xistim û ber bi Kurdistanê ve birim. Ez birim ta Eqroya min a rengîn, axa bav û kalan, da û dapîran ku ez li wir ji dayîk bûbûm û tevayîya temenê min ê zaroktî û xortaniyê li wir derbas bûbû. Ew Eqroya rengîn ku ji qezayê qederî seetekê dûr bû û li kambaxa çiya, li derekî bilind avabûbû û hawirdorê wê bi hemû dar û daristan, kevir û latên reşbelek ve hatibûn xemilandin. Li wir zivistanan bi hindikayî nîv metro û pirê caran jî metroyek heta metroyek û nîv û du metroyan berf dibariya. Wan deman hemû hawir dor çîl spî dibû heta ku çavên mirov didîtin. Min û dememsalên xwe me rojên xweş û şahiyê, nexweşî û keseran derbas kiribû.

Dema min li belqonê û li pêşberî belqonê ji derve temaşeyî derve kir û darên hewr û çaman bi xemilandîna berfê ve dît; di nav fikir û ramanan de min darên me yên Aqroya rengîn û yên taxa Brommayê muqayese kir. Bêguman ferqiyeta di nav daran de zêdetir, ferqiyeta coxrafyayê û iklimê bû. Li Eqroya rengîn di sê mehên zivistanê de jî gelek caran roj derdiket û carina bi hefteyan me li tava rojê temaşê dikir. Ger em ji bo sê mehan bihesibînin, rehet dikarim bibêjim ku nîvê demsala zivistanê rohnî derbas dibû û nîvê wê jî di tarîtiyê de xilas dibû. Bi awayekî din me hesreta rojê, tavê û ronahiyê zêde nedidît. Serma û tarîtiya zivistanê Eqroyê tameke xweş didan payîz, bûhar û havînan. Bi taybetî havînen ku me ji german nikaribû em li derve bimînin û hema li her derî xwe davêt bin siyekê, tama zivistanê xweştir dikir. Lê li Swêdê û bi taybetî li Stockholmê zivistan û tarîti ne wek a Eqroya min bû. Li vir gelşa herî mezin tarîti bû û mirov her tim bi hesreta rojê, ronahiyê û tavê diman. Belam ji bilî zivistanan di payîz û bûharan de jî tav û roj zêde tunebû. Lewra coxrafi û iklima welatê min û vir qet naşibin hev û nayê muqayesekirin.

Di temaşekirina berfbarîna taxa min a Brommayê de dema bi xeyalên xwe yê zarokiyê ve ez carekê din çûm Kurdistanê û ew hîs bi qompîtora xwe min kêşand ser kaxizan; bi keserên ji Eqroya rengîn bi salan dûrketin ve çavên min tije histir bûn. Min çiqasî dixwest herim Eqroya xwe carekê din bibînim. Wek ez ji malbata xwe pêhesiyame, di van şeş-heft salên dawiyê de cendirmeyên dewleta Tirk, wek bi hezaran gundên din Eqroya min a rengîn jî şewitandine, dar û ber têde nehiştine. Wer bûye ku êdî jiyana wir bûye wek cehenemekê. Êdî bê destûr mirov nikare ji qezayê here Eqroyê. Hewce ye mirov ji qereqola cendirman destûrê bistîne da diçe bo çî û çiqas li wir dimîne, bi xwe re çiqas xwarin û vexwarin û hwd dibe, divê bi daxwaza erzuhalan ev bê nivîsandin. Yanê bi awayekî din, çûyîn û hatina Aqroya rengîn û gelek gundên Kurdistanê yê din êdî ne hêsan e, girêdayê destûra dewletê ye û mirov nikare bi kêf û têra xwe xwarin û vexwarinê jî bistîne. Bi awayekî din, dewleta Tirk ambargo daniye ser hemû gundên welatê min. Hey felekê em hatin ketin çî halî. Welat û gundên me hemû wêran bûne û derdê serê derdan em li ser axa bav û kalên xwe bûne wek maciran. Lê macirên bê nasname û statu ku wek di qampên êsîrgehan de dijîn. Bi awayeke pir vekirî û zelal gundî û hemwelatîyên min ên kurd, li ser axa bav û kalên xwe wek hêsîran dijîn, ger mirov bikaribe ji wê re bibêje jiyân.

Bi van hîsan ez rabûm min kompîtora xwe vekir û bi navê bîranîna sibehekê di rupelekî nû de dest bi nivîsandina van hîsên xwe kir. Bîranîna wan deman û raxistina wan a ser kaxizan bi serê xwe hewcedariya nivîsên dirêj in. Li vir ez tenê qîma xwe pê tînim da ji bo bîranînên zarokatiyê ya demên berfê bi çend gotinan bînim ziman ku wek şerîda sînemayê ya zindî hin jî di bîra min da ye.

Li rê

Yaşar Kemal*

Werger: Serdar Roşan

Doxrişme avêt palgeha erebeyê, navrana şelwarê xwe ji hev vekir, pereyên di bêrika xwe de hemî vala kirin navrana xwe û dest bi jimartina wan kir. Serê bergîran di ber wan de hêdî hêdî simên xwe di nav axpînkê li ser rê de ber bi pêş diavêtin.

- Li ser hev şeş çewal, ji xwe re got. Ji bo her yekî du lîre? Dike donzdeh...? Pere careke din jimartin. -Neh lîre! Ka her sê lîreyên din? Mîn hinek xwarin xwar, şerbet û qeşa kirî... Welhasil... dev jê berde! Bi lez pereyên xwe xistin bêrika xwe û ji bêrika xwe ya din qutiya titûnê derxist; hêdî hêdî cixareyek pêça. Paşê bêlê ku lê mêze bike bi kibritê cixareya xwe pêxist û bi kêfxweşî kişand.

Rê di nav zeviyên şewitî û bi axpînkê re yên ku lê pembo, garis û berbiroji dihatin çandin, dibuhurî; ji ber tozê rengê erebeyê kifş ne dibû; erebe, erebeajo heta pirêze jî di nav tozê de mabû. Di bin germa rojê de şitilên pembo çilmisibûn; gunehê wî bi wan hat. Di dilê xwe de "xwezî hinek baran bibariya" got. Yekcaran bi zîqînê erebe radiwestiya û hespan xwe dirêjî garisê kesk yê li kêleka rê dikir. Ji bilî ku carinan erebeajo digot -daah- tişteke ne dikir, mîna ku çu leza wî tune be. Piştî bîstekê hesp cardin bi rê diketin.

Kelkela nîvro, tu sura ba tune bû. Her çi qasî bergîr hêdî hêdî diçûn jî lê di nav xwîdanê de mabûn; toza ku ji erdê radibû bi çermê wan yê şil ve dizeliqî. Di rûyê erebeajo yê tozgirtî de jî xetên xwîdanê dixuyan.

Gava careke din hesp rawestiyar wî serê xwe rakir, got: Dah.

Di wê navê re çavên wî bi jinekê ketin. Wê xwe da kêleka rê da ku ji erebeyê re rê vebe. Çarşefek lê bû, heta bi rûyê wê jî pêçayî bû. Jinik pêxwas bû, li ser erdê sincirî, bi tirs û lerz piyên xwe diavêtin.

Wî bi destê xwe îşaret da wê; jinik li erebeyê siwar bû û li paş wî rûnişt.

Erebeajo cardin got:

- Daaah! Hesp wek berê bi rê ketin.

Li pêş, hinekî ji rê dûr dareke tuyan ku ji tozgirtinê sipî dixuya, hebû. Darê bi siya xwe ya reş ve ew vedixwandin. Hespan bi lez berê xwe da bin darê.

Gava erebe li bin darê rawestiya erebeajo ji cihê xwe hil bû; cara pêşîn awirek da jinikê. Wê wisa çarşef li xwe pêçabû ku wî ne karî çavên wê jî bibîne. Wî kîsek ji tûrê êmê hespan derxist û vekir. Tê de nanekî sipî û helaw hebû.

Got:- Xwîşkê kerem bike, xwarinê bixwe.

Jinikê bi serê xwe îşareta na da ê.

Wî bêî ku bilezîne bi tenê xwarin xwar. Gava wî xwarina xwe xilas kir, cardin destê xwe xist nav tûrê êm û jê kîsekî tije xoxên ku li ber germê di ser hev de germixî bû bûn, derxist. Wî çend hebên ku zêde ne perixîbûn neqandin û li ber jinikê danîn. Piştî wê li wî, wê xox hildan û bêî ku çu gotinekê bêje dest bi xwarina wan kir. Wî xoxên perixî yên mayî xwarin, paşê pal da û çavên xwe girtin.

Gava wî çavên xwe vekirin siya dara tuyê ji ser wan çûbû; di bin kelkela rojê de bûn.

-Daaah! mîratino daaah! got û awirek bi lez da paş xwe. Jinik li cihê xwe bû; te digot qey qet xwe ji cihê xwe ne livandiye. Cara pêşîn bû ku wî qamçî di piştî bergîran de şidand.

-Daaah!

Gava ew gihîştin ser riya bi axpînk hesp vegeyriyan ser meşa xwe ya berê.

Erebeajo cardin pereyên xwe ji bêrika xwe derxistin û berdand navrana şalwarê xwe. Di bin bêdengiya giran de jimartina pereyan, zêde bi deng bû; piştî ku careke din jimartin ew xistin bêrika xwe; bi nermî carekê qamçî hejand û li jinika li paş xwe zivirî. Jê pirsî:

- Vê kelkelê tu ji ku têyî, bi ku de diçî?

Wê bi dengê kirî pir nizim got:

- Ji bajêr.

Heta hukimê dîtina çavan digihîşt deşta mezin ya bêdawî li derûdora wan xuya dibû: bi erdê qehweyî yê cotkirî, zeviyê kesk, zadê zer yê ku di bin rojê de dibiriqî, û li pêş wan riya bi axpînk mîna xetekê di deştê de dirêj dibû.

- Tu ê herî kîjan gundî?

- Kirmitli.

- Ez jî ji Hemiteyê me.

Jinikê got: - Du gund ji yê me wêdatir, ne wisa?

Erebeajo got: -Du gund.

Bêdeng man. Paşê erebeajo cardin got:

- Di vê germê de li bajêr çî karê te hebû?

Jinikê dengê xwe ne kir. Wî da aqilê xwe ku wê ne bihîst, pirsî xwe tekar kir. Ji ber ku ew hîn jî bêdeng bû, erebeajo hêrs bû; lê jê re bû bû meraq. Di

dawiyê de wî got:

- Xwîşkê, ma tişteki ku nayê gotin?

Wê li wî mêze kir.

- Na birê min, got. Ma çima dê neyê gotin?

Erebeajo bi birûyên gur mirovekî hûr û bejinkurt, stûdirêj û zeîf bû. Şalwarekî reş û gomlekekî hevrişim î zer lê bû. Şewqeya wî nû bû, bi hêla rastê ve xwar dabû serê xwe.

Jinikê bi dengê lertzok got:

- Çavên mêrê min birijin, wî ez berdame. Ez mecbûr bûm ku herim ji cem hukumetê ewraqên xwe bînim.

Li dûr, hêla başûr, cihê deryaya Sipî, li asoyê ewrine sipî en piçûk xuya dibûn. Bayekî sivik ji hêla rojava hat û hinek toz ji erdê rakir û bihurî.

Erebeajo got:

- Te di vê germê de xwe wisa pêçaye, tu ji germê mirî. Çima tu çarşefê ji xwe nakî? Ma dê kî te li ser vê riya tenha bibîne?

Gava wê çarşev ji hev vekir, berê xwe da erebeajo, piçek nefes hat ber wê; û erebeajo niha cara pêşîn bû ew didît. Rûyê wê sor bû bû; çavên wê reş û mezin, lêvên wê qalind bûn. Li gora rûyê wê yê fireh çeneya wê pir zirav bû. Qevdên wê qalind û kimaxên wê dagirtî bûn. Mircanên xwîdanê bi qirika wê ya dirêj û zirav ve xuya dibûn. Jinik spehî bû.

Erebeajo ji gavê carekê li jinikê fedikir, paşê serê xwe dizivirand; çavên xwe digirtin û digot:

- Daaah!

Careke din bi ser jinikê ve zivirî û mideteke dirêj li wê mêze kir. Jinikê çavên xwe bera ber xwe dan.

Wî got:

- Navê te çi ye?

- Emîne...

- Emîne, tu dizanî, bi rastî jî divê ez bêjim, mêrê te ehmeqekî tamam e.

- Çavên wî birijin, ew bêmeji wisa ye, Emîneyê got. Ehmeqekî tamam...

Gava ew gihîştin ba pirê kêleka Karasu wî doxrişme kişand, hesp ji ber xwe ve sekinîn; bayê rojava gur bû bû, ji erdê toz radikir û hertişt di nav tozê de dihîşt. Li wê derê perê avê bi zilên berz yên gur pêçayî ye. Ji nişkê ve erebeajo qamçî hilda û erebe ajot nav zilan. Erebe ji cihê xwe hilpekiya, jinik bi paş de şûş bû, dikira di erebeyê werbibaya. Erebe paşê rawestiya, êdî ne dikarî di nav zilên gur de here.

Erebeajo got:

- Bila hesp li vir hinekî bêhna xwe vekin. Gava li wê mêze dikir bêhn lê teng dibû, qirika wî ziwa dibû. Jinikê dengê xwe ne kir. Wî cardin got:

- Mêrê te divê yekî ehmeq be. Heke zilam bûya...

- Çu car ne bû! wê got. Ximbikekî genî ye, ji xelkê re dixebite, aqilê wî ji kîsê xelkê ye.

Erebeajo ji erebeyê daket, bêh ku bêhna xwe veke li wê dorê çû û hat, çend car li dora erebeyê zivîrî. Zilek jê kir, parçe parçe qut kir û avêt. Piştî pir bi lez bi qevda wê girt.

- Ev çi ye? jinik qêriya û destê xwe kişand. Xêr e tu çi dikî?

Wî ziq li bîbikên çavên wê nihêrî, erebeajo:

- Wisa neke!

Jinik ji erebeyê daket û ber bi rê çû. Erebeajo bi dû wê de beziya, ji par ve bi nava wê girt.

Jinikê got:

- Tu şêr î, çi yî! wê ew dehf da û bi riya xwe de meşiya.

- Guh bide min, got û da dû wê. Kesekî min tune ye. Ne bav, ne dê ne jî jin. Ez bi tenê me. Ev hesp yên min in; erebejî ya min e; û sê zeviyên min yên mezin li gund hene...

Jinik rawestiya. Erebeajo çû gihîşt wê û cardin hişk bi qevdên wê girtin. Ji kelecana şehwetê wextî ji xwe biçûya. Reşeka zilan, dunya li dora wî zîz dibûn.

- Ma tiştê tu dibêjî rast e? wê pirsî.

- Belê... û çêlekên min jî hene...

- Ma bi rastî jî kesekî te tune ye?

- Na, çu kes! Ez bi tik û tenê me... Wî ew ber bi nava zilan ve kişand, çûn cihekî xewle û tarî.

Gava ew ji nav zilan bi derketin, bayê rojava gur bû bû, derûdor di nav tozê de hîştibû. Erebeajo bi kêfxweşî qamçî dihejand. Te digot qey ew hespên tiral cardin vejyane; û erebe di nav toz û dûmanê de diçû.

Ew di bêhnekê de gihîştin Kirmitliyê. Erebeajo rawestiya û li Emîneyê mêze kir. Wan li hev nihêrî. Emîne bêdeng bû, xwe ji cihê xwe ne livand.

Wî got:

- Ev gundê te ye, ne wisa Emîne?

- Belê, wê got. Lê çu hewildana wê ku ji erebeyê dakeve ne dixuya.

Wî berê xwe guhert û qamçî li piştî hespan şidand.

Ji erdê toz bilind dibû; erebe bi lez di deşta fireh de ber bi Hemîteyê diçû.

* Ji pirtûka *Sari Sicak* ya bi tirkî hatiye wergerandin.

Dema ku hêj dê were pêşeroj e yan paşeroj e?

Zeynelabidîn Zinar

Ev e du-sê sal in ku ew gelşa ji bo dema ku hêj dê were *pêşeroj e yan paşeroj e?* hêjî çareser nebûye, serê xwe girtiye û diçe, li xaza xwe didomîne, bi helebezê gêndir dibe û ranaweste. Ew peyv, li gorî çend kesan, dema ku hêj dê were *paşeroje*, li gorî pir kesan dema ku hêj dê were *pêşeroje*. Pîrbûn û hindikbûna herdu aliyan ne mesele ye ku ka gotina kîjan alî rast e û ya kîjan alî ne rast e. Ya girîng ji me tevan re ev e ku em kesên niha yê ku bi nivîsandinê ve lipikîne, bingeheke rastîn ji nivîşên nûhatî re hazir bikin û heta ku dest dide jî, em zimanê xwe dewlemendtir bikin, peyvikên orjînal ên kevnare peyda bikin û wan di nivîsandinên xwe de daxînin qada jîyanê. Bi vî hawayê me gotî ku em bikin, hingê em dewlemendiya zimanê xwe pêşkêşî medeniyeta dinyayê dikin û cihê wî di nava qedirşinasiya mêjû de jî destnîşan dikin.

Em ê hinekî li ser pîrsa ku peyvika *paşerojê* çi ye û ya *pêşerojê* çi ye dakevin lêhûrbûnekê û çend mînak ji zimanên biraxweyên kurdî û du-sê mînak ji zimanên din jî werbigirin. Îcarê heke ev reşbekekiya me, ger bi hawayekî sererast derkeve holê û ji aliyê zimanzanan ve jî ku bête pejirandin, ewçax bila xwendevan bi xwe biryarê bidin ka kîjan ji van herdu peyvên bi gelş dema ku hêj dê were dide zanîn.

Berî ku em têkevîna nava xax û tozildûmana peyvik û hevokên gelşdar, divê em jibîr nekin ku çiqas peyvên ango bêjeyên ku di piraniya zimanan de hene, du beş in. Hinek ji wan hevmane û hinek jî dijmane ne, yanî *sinonim* û *motsats* in. Hindik ji wan jî hevmane û dijmaneyên xwe nînin, ew wek bêje bi serê xwe ne, ango nav in. Ev hawe, ji bo zimanê kurdî jî rewşa ye û her wisan e jî.

Ji vê yekê zêdetir, ez dixwazim bînim bîra xwendevanan ku çiqas tiştên di vê xwezaya heyî de hene jî, hevber û dijber in. Ji aliyê zayendeyê ve ango nêr û mê ne. Bi ramanêkê din a vêjeyê, ew tişt, hinek baş in û hinek xirab in; yanî xweş û ne xweş...

Piştî van çend gotinan, îcarê em bi hêsanî dikarin bêne ser gelşa xwe ya ku ev bêjeya *pêşerojê* û ya *paşerojê* jî du peyvîne dijber in, ango vajiyên hevûdu ne. Yek roja pêşî (roja ku hêj dê were) û yek jî roja paşî (roja ku bihurîye) dide nîşandan.

Berî ku em bizanibin ka roja pêşî kîjan e û roja paşî jî kîjan e, em ê hin peyvên dijber ango vajiyên hevûdu binivisînin, weke:

QÎZ-JIN

Nimûneya vê, ji stiraneke folklorî diyar dibe:

...

Dêrîsorê piçûkê

Dest bi hine heya neynûkê

Par qîz bû îsal bûkê...

Dêrîsorê mezinê

Dest bi hine heya bazinê

Par qîz bû îsal jinê...

...

KEÇ-KUR

Gava tê gotin ku *zarûke ji filankesê re çêbûye*, tê pirsîn: *Zarûka wê keç e yan kur e?* Û çend peyvên din:

PÊŞ-PAŞ

ROJ-ŞEV

PÊŞEROJ-PAŞEROJ

NERM-HIŞK

SAR-GERM

JIN-MÊR

AV-AGIR

Û gelek bêjeyên wisa...

Çend nimûne ji bêjeyên hevmane ango sinonim:

KEÇ/KIÇ/KIJ/QÎZ/DOT

BIVE-PIVE/QEDEXE

WISA/WERE/WILO/HALKO/HILO/WEHA/WERGÊ

DELAL/RINDIK/XWEŞIK/NARÎN

Û gelek peyvikên wisa yên din...

Gelo Roja Pêşî Kîjan e?

Gelo Roja Paşî Kîjan e?

Yan navê dema ku hêj dê were *paşeroj* e?

Û navê dema ku bihurîye jî ma *pêşeroj* e?

Eger em li rastiya meselê bigerin, bê ku em rik an sîqaltiyekê jî bikin, rastî ew e ku ev bêjeya *pêşerojê* jî û ya *paşerojê* jî nûderketî ne û tenê di nivîsandinên salên 80 û 90î de dikevîne ber çavan.

Navê rêveçûna kaînatê, zeman e. Rêveçûna vê gêtiya ku em lê dijîn, di nava zemanî de çêdibe. Mirovên li jiyane yên serê pêşî, vî zemanê bê serûber ji xwe re dabeşê ser movikan kirine, weke: Sanîye, deqîqe, saet, roj û şev, heftî, meh, sal û sedsal. Mesafeya di navbera her du heb movikan de jî, bi *zeman* an *dem* hatiye binavkirin.

Ji zemanî re ne destpêk hebûye û ne jî wê dawî çêdibe. Lê ev dinyaya ku em lê dijîn, jê re destpêk hebûye û dibe ku di pêş de dawiya wê jî were.

Nexwe em ê bersivan *dema ku hêj dê were gelo paşeroj yan pêşeroj e?* li ser du xalan bipişkêfin:

a) Di zemanî de tiştê ku pêşî û paşî jê re tune.

b) Di zemanî de tiştê ku pêşî û paşî jê re heye.

Bersiva "a"yê ew e ku di zemanî de tiştê ku pêşî û paşî jê re tune, her nefsa zeman bi xwe ye. Guttla vê dinyaya ku em lê dijîn hêj nehatibûye holê jî, zeman hebûye, niha jî zeman heye û ger ev guttl bibe tune jî, wê zeman dîsanê hebe. Çi sanîyeyek an deqîqe, saet, roj û şeveka ku bi ser me ve tê, ew ji me re dema pêşî ye, angu musteqbel (*pêşeroj*) e. Herweha heftî, meh, sal û sedsal jî wusan in.

Mesela em niha di dawiya Sedsala Bîstî de ne. Piştî salekê û nivê din, em ê bikevin Sedsala Bîst û Yekê. Nexwe îro Sedsala Bîst û Yekê ji me re dema ku hêj dê were, demeke li pêşiya me ye. Îcarê ew ji me re *demepêş* e, yan *demepaş* e? Yanî *pêşeroj* e gelo, yan jî *paşeroj* e?

b) Hemû tiştên ku di kaînatê de ne, çi jîndar û çi jîndêr, rêveçûna xwe di nava zemanî de dibihurînin. Ango zeman ji bo wan mînyaye riyekê, ew tînen û tînen re dibihurin û berepêş diçin. Ji van tiştan re çewa ku destpêk çêbûye, eynî

wisan wê dawî jî çêbibe.

Mesela çî jîndarê ku ji maka xwe fek dibe, ew dema ku tê de çêdibe, ew çax an ew roj jê re roja pêşî ye/dema pêşî ye. Ew jîndar di nava zemanî re diçe û rojek bi ser ve tê ku dibe dawiya jiyana wî. Ev yek, ji bo tiştên ne jîndar jî, sufte ye û rewa ye. Mesela tiştên weke axê, kevir, ruhn û hwd di pêvajoya demê de şûfghartî dibin û dikevin kirasekî din. Çawa ku neft hişk dibe û xwe dike mîna kevirêkî hişk, ango dibe komir. Xwelê dişewite û hişk dibe, dibe mînanî kevir an weke hesin. Kevir jî pixpîxokî dibe, hûrohela dibe û dibe mînanî axê...

Pêveçûna jiyana jîndarekî bi demê ve, dema ku çêdibe, em ê demê jê re weke werîsekî bihesibînin û wî pê ve bihinêrin; serê werîs ew dem e ku ew jîndar li wirê çêbûye. Dawiya werîs jî, ew dem e ku ew jîndar li wirê miriye.

Mesela em dikarin bêjin ku: Filakes di 1900î de hatiye dinyayê. Dema ew mezin bûye, hertim li paşîya xwe (li dola xwe) fikiriye û zorî daye xwendinê, perwerdekirineke baş dîtiye, hem jî ji zarûkên xwe re sermiyanekî baş hazir kiriye. Lewra ew ji dema ku hêj dê were re bi umîd bûye ku dê zarokên wî azad bijîn, seqirî bibin û bêteşqe le li jiyane bidomînin. Lê ew kes di 1990î de çûye ser dilovaniya Xwedê. Îcar sala 1900 jê re demepêş bû û sala 1990î jî jê bûye demepaş.

Mîrov dikare di tiştên weke van herdu mînakên li jorê de bibêje ku ez li paşîya emrê xwe difikirim ka wê di zemanê pêş de (di pêşerojê de) çî sosret werin serê min.

Me li jorê got ku peyvika *pêş* û ya *paş* du peyvên dijmaneyên hevûdu ne. Ji her tiştî re çewa ku *pêş* û *paş* hene, jê re rast û çep, jor û jêr jî hene.

Pêş, di laşê jîndaran de ew dever e ku serûçav lê ne. Di jîndêran de jî, tiştên weke çiya, zinar, hîm û gwd, yên ku ber/teref didine wan mîrov in. Ew jîndarê ku me li jorê gotî, gava bi wî berî ve diçe, tê gotin ku *ber bi pêş ve diçe* yanî pêşpêşkî diçe. Lê gava ku bi aliyê tersê wê ve diçe, tê gotin ku *ber bi paş ve diçe*, yanî paşpaşkî diçe. Ev hawe tenê ji bo cih (mekan) dibihure.

Riya vê guttla dinyaya me, zeman e. Her rojêke ku ew dibihurîne, dinya li gorî me diçe dikeve rojêke din (zeman-roj û tiştên wisa *aman* in ango hoker in). Ew roja bihurî, ji dinyayê re dibe *paşeroj* û ew roja ku dê hêj were, ji dinyayê re *pêşeroj* e. Lê ev hawe ji jîndaran re bi tersê wê ye. Çewa ku me li jorê jî gotiye, roja çêbûna jîdarî tê de, ew roj jê re, roja pêşî ye û roja ku tê de miriye jî jê re roja paşî ye.

Tiştên jîndêrên livak, weke çerxa makîneyê, hertim berepêş diçin.

Mesela, gava ku trê n ji Stockholmê dikeve rê û diçe ku here Diyarbekirê, ew berepêş diçe. Dema berik ji devê tivingê derdikeve, berepêş diçe û gwd...

Îcar gotina birêz Mikail Cayetî ku digot: *Peyvika pêşerojê çêkirî ye, ne pêbesta pêbaweriyê ye. Lewra bêjeya pêş û ya rojê pir kevn in. Mesela: Di heyamê ku di baweriyê xelkê çend xweda hebûne, sondeke Kurdan hebûye, gotine: Bi Xwedanê şev û rojan! Ku îro jî ev son xwe li hin herêmên Kurdistanê diparêze.*

Ev yek jî diyar e ku di gelek zimanan de pir bêje hene ku ji du û zêdetir bêjeyan çêbûne, weke rojbaş, reşeroj, şeveroj (roja tarî), şorbenîsk, gewreşêr, şêrzad, mêrxas û gwd...

Ev bêjeyê bi teşele di zimanê kurdî/devoka soranî de *dahatû* ye ku tê wateya dema ku hêj dê were. Di devoka kirdkî (zazakî) de, herwekî di erebî de *musteqbel* tê bikaranîn.

Ev bêje di zimanê erebî de, çewa ku me li jorê jî got *musteqbele*, bi wateya dema ku hêj dê were ye. Di zimanê tirkî de jî *gelecekszaman* tê gotin ku bi wateya dema ku hêj dê were ye.

Ev yek diyar e ku zimanê kurdî, di nêv famîla zimanên Hindoeuropî de cihê xwe girtiye. Di vê famîlê de ji sedî pirtir ziman hene. Û gelek bêjeyên van zimanan yan eynî ne yan jî bi cudatiyeke pir hindik dişûfine hevûdu.

Îcar em ê çend mînak ji hin zimanên biraxweyên kurdî yên Hindoeuropî werbigirin û pêşkêşî xwendevanan bikin:

- Bi inglîzî: *future* ye, bi wateya dema ku hêj dê were ye.
- Bi swêdî: *framtid* e, bi wateya dema ku hêj dê were ye.
- Bi îspanî: *el futuro* ye, bi wateya dema ku hêj dê were ye.

Îcar berî ku em bigehin dawiya nivîsa xwe, em ê wê gelşa ji bo *dema ku hêj dê were* gelo *paşeroj e yan pêşeroj e?* ji xwendevanan re bihêlin û bilanê ew, her yekê wan îcarê li ba xwe biryarê bide. Lê hêvîdar im ku çûna paşpaşkî ya ber bi Çaxê Hesinî ve çênebe û pêş û paş jî li hevûdu neqelêbin.

Piştî darbeya 12ê îlonê li Ewrûpayê ziman û edebîyata kurdî

Zekî Bozarslan

Her çar dewletên ku Kurdistanê di nava xwe de parve kirine, bi hêz in... Her çar dewletên mêtînkar jî, ji bo pelçiqandina gelê kurd; ji bo bidestnexistina mafên wî yên netewî û demokratîk; ji bo, ji holê rakirina ziman, çand û dîroka wî, bi hev re hevkarî dikin. Pêwendiyên her çar dewletan jî bi welatên Ewrûpayê re ba in. Her çar jî bazirganîya xwe bi welatên Ewrûpayê re dikin û mişteriyên çekên wan ên girîng in. Ji ber vê yekê jî, her çar welatên dagirker dikarin, li ser pirsê kurd, bi hêsanî, li polîtîkaya welatên Ewrûpayê tesîr bikin; di qada navnetewî de gelê kurd bi tenê bihêlin û sîyaseta xwe ya nîjadperest li Kurdistanê bidomînin. Her çar dewletên mêtînkar jî bi çekên hin dewletên Ewrûpaya «demoqrata», bi çekên dewleta Emerîqa û Sovyeta kevn, gelê kurd qir dikin, ziman û çanda wî ji holê radikin. Welatên Ewrûpayê; ji bo «çend kurdên belengaz» berjewendiyên xwe yên netewî nadin bin lingên xwe û mafên wan ên netewî û demokratîk neparêzin!.. Çerxa felekê, li her cîyên dinyayê, ji bo kara sermîyandaran digere. Ji ber vê yekê jî dewletên Ewrûpayê li hemberê terora dewleta tirk, faris û ereb; kerr in, kor in û lal in. Li welatên mêtînkar û dîktator, mafê merivî û jîyanê tune, rojê bi dehan meriv li serê kuçan qurbana terora dewleta tirk dibin; bi hezaran gundên kurdan tîrî şewtandin, qeza û bajarên Kurdistanê tîrî valakirin, bi milyonan kurd ji ber terora dewleta tirk, faris û ereb ji welatê xwe koç dikin, bi sedan ciwan di îşkencexaneyên welatên dîktator de dimirin û bi hezaran, bi deh hezaran meriv ji bo mafên xwe yên merivî, demokratîk û netewî di zindanan de dirizin; qet xema «Dinya Azad» û «Ewrûpaya demoqrata» nîne!..

Dewleta tirk piştî darbeya 12ê îlonê ya leşkerî, terora xwe ya dewletê li seranserê Kurdisatanê bela kir. Dewleta tirk li Kurdistanê mafê jîyanê nade gelê kurd; ji ber vê yekê jî, vê carê ronakbîr, welatparêz û şoreşgerên ku ji ber terora dewleta tirk revîyan dervayê welat, hejmara wan zêde ye. Mercên ku kurd bikaribin li welatên cîran û herêmê bihewin, tunebû. Her çiqas helwesta dewletên Ewrûpayê li dijî pirsê kurd neyîn e û piranîya deriyên

welatên wan ji kurdan re girtî ne ; dîsan jî kurdên ku piştî darbeya 12ê îlonê revîyabûn dervayê welat, li çar alîyên Ewrûpayê bela bûn; ji ber ku tu dewleteke dostê kurdan tunebû ku di binê wan hoyên giran de destê xwe dirêjê wan bike.

Piştî ku rêxistinên kurd hatin Ewrûpayê, li Ewrûpayê jî, xebatên xwe yên sîyasî û çandî domandin. Li Ewrûpayê jî, zimanê rêxistinên kurd û xebatên wan ên sîyasî bi tirkî ye, weşanên wan ên navendî û yên girseyê bi tirkî derdiketin; hemû suhbetên xwe bi tirkî dikin. Herwiha piranîya ronakbîr û rêxistinên kurd guh nadin her du himanên netewebûnê yên girîng, ziman û çanda kurd. Her çar dewletên mêtînkar, bi salan e, ji bo ku ziman, çand û dîroka me ji holê rakin û herwiha gelê kurd ji rûyê erdê hilînin, hewil didin. Ji ber ku her du himan jî, ji bo hebûna neteweyan tiştên girîng in. Bê van her du himanan meriv dibe wek neteweyên Emerîka Latîn û wek neteweyên îrland û îskoç. Neteweyên Emerîka Latîn bi hezar kîlometreyan dûrê welatên mêtînkar, ≈spanya û Portekîzê bûn. Em di nava derya agir de dijîn. Welatê me dûrê axa dewletên ku wî di nava xwe de parve kirine nîne; di nava welatê me û di nava axa dewletên mêtînkar de çîyayên asê, çolên bê dawî û deryayên bê serî û bê binî tunin. Welatê me bi axa dewletên dijminê me ve ye. Gelê kurd salê dozdeh meh di bin bombebarana zimanê tirkî, farisî û erebî de ye; her roj bi rêya radyo û televîzyonê, bi rêya dezgehên perwerdê û weşanên din, mêjîyê gelê kurd bi çanda xwe dadigrin. Tiştên ku me û dijminê me ji hev vediqetînin, ziman û çanda me ne; xeyn ji ziman û çanda me, tu ferqeke din di nava me û wan de tune. Ji ber vê yekê jî; divê em li ziman û çanda xwe xwedî derkevin û ji bo berdewamîya neteweya xwe jî, em zarûkên xwe hîne zimanê bav û bavpîrên xwe bikin; an jî em fermana mirina xwe bi destê xwe amade dikin!..

Piştî darbeya 12ê îlonê hejmara ronakbîrên kurd li welatên Ewrûpayê zêde bû. Herwiha xebatên li ser ziman, edebîyat û çanda kurdî jî berfirehtir bûn. Dema kurdan berê xwe dan welatên Ewrûpayê, piranîya ronakbîr, welatparêz û rêberên rêxistinên kurdan berê xwe dan Swêd û li wir bi cî bûn. Hejmara qadroyên sîyasî û ronakbîrên kurd roj bi roj li Swêd zêde bû; herwiha xebatên sîyasî û çandî jî geş bûn. Ji ber pîrbûna ronakbîr û qadroyên sîyasî, Swêd li Ewrûpayê ji xebatên kurdan re bû navend. Ronakbîrên kurd, li Swêd, li ser ziman, edebîyat û çanda kurdî xebatên hêja dikin û gelek kovar, rojname û pirtûkên kurdî derdixin. Di pey xebatên ronakbîrên kurd ku piştî serhildana Şêx Seîd revîyabûn Sûriyê, li wir xebatên çandî kiribûn û herwiha jî, ji gelê kurd re edebîyateke nivîskî ya dewlemend mîrat hiştibûn;

ev cara yekemîn e ku kurd 40 sal di pey xebatên wan de, li dervayê welat, li Ewrûpayê, mercên xebata li ser ziman û edebîyata xwe bi dest dixin...

Bêguman, ronakbîrên kurd berya darbeya 12ê îlonê jî li hin welatên Ewrûpayê li ser ziman û edebîyata kurdî xebitîne; ji bo pêşveçûn û dewlemendbûna wan hewl dane û ji bo ziman û edebîyata kurdî ya nivîskî, kovarên kurdî û yên kurdî-tirkî derxistine.

Li dervayê welat, xeyn ji xebatên rêxistinên kurd, ronakbîrên kurd jî li ser ziman, edebîyat û çanda kurdî xebatên hêja dikin. Helbest, roman, çîrok, destan, kurteçîrok; ji bo zarûkan pirtûkên perwerdê çap dikin û kovar derdixin. Ji zimanên bîyanî pirtûk werdigerînin kurdî. Rojname û kovarên kurdî derdixin. Ji sala 1980î û vê de, li Swêd; bi dehan pirtûkên çîrokan hatine çapkirin. Bi dehan pirtûkên zarûkan, ji zimanên bîyanî, hatine wergerandin. Bi sedan çîrokên gel hatine berhevkirin û çapkirin. Bi dehan kurteçîrok û roman hatine nivîsandin. Ronakbîrên kurd pirtûk ji zimanên bîyanî wergerandine zimanê kurdî. Bi dehan kovar bi kurdî derketine; meriv dikare bêje temamê edebîyata kurdî ya kilasîk, ên ku bi destê kurdan ketin; li Swêd, ji nû ve hatine çapkirin. Xebatên ronakbîrên kurd ên çandî; ziman û edebîyata kurdî li Swêd dewlemend dikin.

Ji sala 1980î heta sala 1990î li Swêd girseyeke sîyasî ya kurdîaxêf hat pê. Li Swêd û li hin welatên Ewrûpayê bi sedan kurdên bakûr; hînê xwendin û nivîsandina kurdî bûn. Kurdên ku kurdî nizanibûn, ew jî kurdî hîn bûn. Ev girseya kurdîaxêf bû xwendevanê kovar, rojname û pirtûkên kurdî. Herwiha hejmara kovar, rojname û pirtûkên kurdî zêde bûn. Bi derketina, kovar, rojname û pirtûkên kurdî re; ziman û edebîyata kurdî ya nivîskî li Swêd hat pê.

Di ziman, edebîyat û çanda hemû neteweyan de weşan rolên girîng leyîstine. Hemû neteweyên dinyayê, dewlemedîya ziman, çand û edebîyata xwe ji rojname, kovar û pirtûkan re deyndar in. Bê weşan zimanekî dewlemend û standart nayê pê. Ji ber ku rojname, kovar û pirtûk bi kurdî qedexe bûn, zimanê kurdî bi pêş neketîye û edebîyateke kurdî ya nivîskî jî nehatîye pê. Çend sal e; ev pêvajoyê ji bo ziman û edebîyata kurdî li dervayê welat dest pê kirîye û dimeşe. Li Swêd, ji sala 1980î heta sala 1995an 9, 10 kovarên bi zaravayê kurmancî, 7, 8 kovarên bi zaravayê soranî û 3, 4 kovar jî bi zaravayê dimbilî derketine.

Di van bîst salên dawîn de, li Swêd; ziman, edebîyat û çanda kurdî bi pêş ve çûn û dewlemend bûn. Xebatên çandî yên ku ronakbîrên kurd li Swêd dikin, tesîra xwe li welatên Ewrûpayê yên din jî dikin. Li Swêd, bingehê

pêşveçûn û dewlemendbûna ziman, edebîyata û çanda kurdî girêdayî yê van her sê mercên jêrîn in:

Tunebûna zixta dijmin li ser ziman, edebîyat û çanda kurdî;
Alîkarîya dewleta Swêd ji bo parastina çanda bîyanîyan;
Li Swêd pîrbûna ronakbîrên kurd.

Ji ber van sedeman ne, ku li Swêd bi sedan pirtûkên kurdî çap bûne; 35 kovar û rojnameyên kurdî derketine; hin ji van kovaran weşana xwe hê didomînin. Ji sala 1990î û vê de 8,9 kovarên kurdî derdikevin.

Ji dervayê xebatên li ser edebîyata kurdî; ronakbîrên kurd li ser ziman kurdî jî xebitîne. Li ser ziman û elfabeya kurdî nivîs, nivîsîne û rêziman çap kirine. Wek ku me li jor jî gotibû; dewleta kurdan tune. Dibistan, zanîngeh û dezgehên li ser ziman, çand û ferhenga wan tunin. Zarûkên kurdan di dibistanên xwe de naxweynin. Xwendekarên kurd di zanîngehên xwe de, ziman, edebîyat, felsefe û dîrok bi kurdî naxwînin, ku bibin zimanzan, edebîyatzan, felsefezan û dîrokan... Ji ber vê yekê jî xebatên li ser zimanê kurdî, xebatên şexsî ne. Her yek bi îmkanên xwe li ser zimanê kurdî dixebite; lêkolîn dike; gramer û elfabeya wê amade dike. Ji van xebat û fedakarîyên şexsî nebin, ziman û edebîyata kurdî bi pêş nakevin û dewlemend nabin.

Zimanzanên kurd ku li Kudistana bakûr zimanzanî xwendibin; di zanîngehên Tirkîyê de pisporên ziman bin, dûre jî li ser zimanê kurdî xebat û lêkolîn kiribin, elfabe û rêzimana wî amade kiribin, tunin. Zimanzanên me; dema ku li Ewrûpayê xwendin û nivîsandina kurdî hîn bûn, an jî dema ku hînê zimanzanên bîyanî bûn; hin zimanzanên me jî dema ku kurdî hîn bûn, pê re jî, dest bi zimanzanîyê kirin; bûn zimanzan!?. Ev jî, di rêzimana zaravayê kurmançî de dibin sebebê pîrsgirikan.

Dezgehên ziman; ên ku ji zimanzanan pêk hatibin, li ser zimanê kurdî bixebitin, lêkolîn bikin, elfabe, gramer û ferhenga wî amade bikin, kêma in; qayîdeyên ziman jî, hê baş rûneniştine. Ji ber vê yekê jî, li dervayê welat herkes, bi hêsanî dikare bibe zimanzan û li gora qayîdeyên devoka xwe, an jî bi devoka bajar û gundê xwe, elfabe û gramera zimanê kurdî binivîse û vana wek keş û îcatên nû bide ber kurdan. Ev jî li dervayê welat; pîrsgirikên giring derxistîye pêşîya rêzimana zaravayê kurmançî.

Li dervayê welat bi derketina weşanên kurdî re; bi zimanê kurdî yê nivîsê re pîrsgirika standartbûna ziman û qayîdeyên wî yê gelemper jî hatin holê. Ji ber ku li Kurdistana bakûr zimanê kurdî; zimanê axaftinê bû; weşanên kurdî tunebûn. Di nava herêmên Kurdistanê de, çûndin-hatin kêma bû; ronakbîr, şoreşger û welatparêzên kurd bi hev re, tirkî qise dikirin. Ji ber vê

yekê jî haya kesî ji qayîdeyên devokên kurmancî, tunebû. Li dervayê welat; bi derketina weşan û edebîyata kurdîya nivîskî re pirsqa qayîdeyên devokên kurmancî û zimanê nivîsê yê hevbeş jî hat holê. Ji ber tunebûna zimanê nivîsê yê hevbeş; hin nivîskar li dervayê welat nivîsên xwe bi devoka herêma xwe dinivîsin. Ev jî ji bo demek, tişteki xwezayî ye; ji ber ku li Kurdistanê zimanê nivîsê tunebû.

Dîroka zimanê nivîsê; ji bo zaravayê kurmancî nû ye. Li Kurdistanê bakûr sed sal e; zimanê kurdî qedexa ye. Dîroka zimanê nivîsê ji bo zaravayê kurmancî li dervayê welat demdemî dest pê kirîye. Ji ber vê yekê pirsên standartbûna zimanê kurdî çareser nebûye. Ji ber tunebûna îmkânên kurdan; ev di demeke wiha kin de gengaz jî nîne. Lê dîsan jî di zimanê kurdî de tevlihevî pir hindik e. Hebûna tevlihevîyan jî, di zimanekî qedexa de, tişteki xwezayî ye. Di pey rojnameya Kurdistan û kovara Hawar ê de, cara yekem e, ku zimanê kurdî di van deh panzde salên dawîn de, li Swêd bi awayekî berfireh mecala xwendin û nivîsandinê bi destê xwe xistîye.

Li dervayê welat piraniya nivîskarên kurd kesên sîyasî ne. Çawa ku li Kurdistanê her serokê komikeke sîyasî dixwest; di bin serokatîya wî û komika wî de Kurdistan rizgar bibe; niha eynî mantiq di pirsqa zimanê kurdî yê nivîsê de jî tê domandin. Niha jî van kesana dixwazîn li dervayê welat; ziman û edebîyata kurdî ya nivîskî di bin rêberîya qayîdeyên rêzimana wan de, an jî di bin rêberîya qayîdeyên devoka herêma wan de bi pêş bikevin.

Ji sala 1980î heya sala 1993-94an kovar, pirtûk, çîrok, kurteçîrok, nivîs û pirtûkên ku ji zimanên bîyanî hatine wergerandin, bi kurdîyeke xwerû ku sedî (%) 90ê kurmancan pê diaxifin, hatine nivîsin. Lê hin nivîskar û zimanzanên nû, qîma xwe bi van qayîdeyên ziman ên gelemper ku sedî 90ê gel pê diaxifin, naynin. Zimanzanên me yê nû, dixwazîn di zimanê kurdî de, keş û îcatên nû pêk bînin. Dixwazîn berê zimanê kurdî ji ser rêya wî ya rast vegefinin ser rêyeke din û herwiha jî di zimanê kurdî de tevlihevî çêdikin.

Ev çend sal e hin nivîskar û zimanzanên me li Swêd di zaravayê kurmancî de tewanga navdêr û sernavên nêr wek ku di sîstema Rojê de, gerestêrka (planet, gezegen) 10an dîbin an jî wek ku di zanist û teknîkê de îcadeke nû pêk anîbin; wan xistine rojeva zaravayê kurmancî yê nivîsê û bi hişkayî wan diparêzin. Van kesan şûr kişandine qayîdeyên devokeke herêmî li ser sedî 90ê kurmancan ferz dikin. Ji bo ku ev qayîde di zaravayê kurmancî yê nivîsê de bi cî bibin, hewl didin û îmkânên xwe yê weşanan ji bo vîya bi kar tînin.

Bi saya serê van nivîskar û zimanzanên me yê nû, di van salên dawîn de,

di zaravayê kurmancî de tam berdan berdanek (qaosek) dest pê kirîye, dere. Li dervayê welat rewşa zimanê kurdî jî kirine wek sîyaseta kurdan a dema 1975-80î. Komikên kurdan yê sîyasî çawa hev di hêla sîyasî de bi hin navdêr û rengdêran tawanbar dikirin, niha eynî tişt di nava devokên zaravayê kurmancî de dest pê kirîye. Niha jî gel ji bo qayîdeyên ziman bi pêşîra hev digre; hev bi xeletaxaftinê sûcdar dikin. Xeletîyên ku di hêla sîyasî de hatin kirin, niha eynî xeletî di pirsra ziman de jî tê kirin.

Zimanzanên me ji bo qayîdeyên ku wan di gramera xwe de danîne, di zaravayê kurmancî de bi cî bibin, sedî 90ê gel xistine bin zixtê; û wî bi xelet axaftinê tawanbar dikin. Herwiha zimanzanên me dixwazin gel wek qayîdeyên ku wan di gramera xwe de danîne, biaxife.

Îdeologên me di hêla sîyasî de hînê van tiştan bûne. Li Kurdistanê di xebatên sîyasî de teorîyên wiha diafirandin. Hev bi xeletbûnê sûcdar dikirin. Piranîya îdeologên me li dervayê welat in. Li dervayê welat, ji sîyasetzan re kar tune; ji ber vê yekê jî piranîya sîyasetzanên me li dervayê welat sinet guhartine, tev bûne «zimanzan»!? Ji ber vê yekê jî qewimandinên wiha di zimanê kurdî de, tiştên xwezayî ne!...

Zimanzanên me di kar û barên sîyasî de serketinên ku bi destê xwe xistin, niha dixwazin eynî serketinan di xebatên zimanzanî de jî, bi destê xwe bixin!... Zimanzanên me di rêya sîyasetê ya dûr û dirêj de meşîyan û piştî zehmetîyên gelek dijwar gihîştin dawîya rê!... Di kar û barên sîyasî de temamê vatinîyên xwe anîn şûnê; gelê kurd serfiraz kirin!? Niha jî dest bi zanyarî û zimanzanîyê kirine (!?) Vê carê jî, dixwazin di hêla zanyarî û zimanzanîyê de vatinîyên xwe bînin şûnê !...

Li dervayê welat kes ji bo zimanê nivîsê yê standart hewl nade. Kes nabêje gelo em çawa zimanekî nivîsê yê hevbeş pêk bînin? Em çawa zimanê nivîsê ji bin tesîra zimanê axaftinê derînin? Em çawa di zimanê nivîsê de derbasê pêşîya tevlîhevîyê bibin? Em çawa zimanê kurdî hêsa bikin, wî bikin zimanekî hevdem (modern)? Ji dêlva vana de herkes dixwaze devoka xwe, hin kes jî dixwazin devoka gundê xwe, ji zimanê nivîsê re bikin binge.

Zimanzanên me li dervayê welat tewanga navdêr û sernavên nêr kirine astengek, xistine pêşîra rêzimana kurdî. Van kesana ji zimanê kurdî re ji xizmetê bêtir, dixwazin di zimanê kurdî de keş û îcatên nû pêk bînin. Zimanzanên me wek ku kurdan zimanê xwe ji bîr kiribin, dev ji qayîdeyên wî yê binge hîn berdabin û herwiha bi kurdîyeke nîvçe (nîvcû) diaxifin; anîne hin qayîdeyên herêmî yê kevn wek ku di zimanê kurdî de îcadeke nû pêk anîbin, raberê kurdan dikin û dixwazin kurdan ji nû ve hînê kurdî bikin.

Tewanga navdêr û sernavên nêr, di zaravayê kurmancî de li herêmeke piçûk tenê heye. Lê hin zimanzan û nivîskarên me van qayîdeyên herêmî di gramer û nivîsên xwe de, wek qayîdeyên zimanê kurdî yên gelemper raber dikin û herwiha di zimanê kurdî de tevlihevî çêdikin.

Tewanga navdêr û sernavên nêr wek ku hin nivîskar û zimanzanên me yên nû, di rojname û gramerên xwe de raberê gel dikin, li Kurdistanê ewqas berfireh nîne. Li hin qeza û bajarên ku gel navên nêr ditewîne, li wan deran jî, gel hêdî hêdî dev ji tawanga wan berdide. Hejmara kesên ku navdêr û sernavên nêr li Kurdistanê ditewînin, meriv hejmara wan bi nifûsa kurmancan re qiyas bike, hejmareke pir hindik derdikeve holê.

Ji bo zelalbûna mijarê em hinekî li ser tewanga navdêr û sernavên nêr bisekinin; em hinekî li qayîdeyên devokên zaravayê kurmancî binêrin û ji qayîdeyên devokan çend nimûne raberê xwendevanan bikin.

Tewanga navdêr û sernavên çî ye?

Kîjan herêmên Kurdistanê navdêr û sernavên zayenda wan nêr ditewînin ?

Nifûsa wan sedî çendê nifûsa kurmancan e ?

Di van sed salên dawîn de terora dewleta osmanî û terora dewleta tirk mafê jîyanê nedan gelê kurd. Di bin zixta dewletên mêtînkâr de îmkana ku li Kurdistanê dezgehekî çandî were pê; bi gelemperî li ser zaravayê kurmacî û bi tayîbetî jî li ser qayîdeyên devokên wî xebat bikin û di encama xebatên xwe de gramer û elfabeyê hevbeş amade bikin, çênebû. Ronakbîrên ku li Sûrîyê jî li ser gramer û elfabeya zaravayê kurmancî xebitîne, wan jî xebateke hevbeş nekirine. Di vê demê de jî Celadet û Kamiran Beg, gramer û elfabeya wî amade kirine. Xebatên ku niha jî li ser zimanê kurdî têne kirin, xebatên şexsî ne. Ji xwe xebatên ronakbîrî xebatên şexsî ne... Lê pirsê ziman pirsê dezgehî ye. Heta dezgeheke netewî çênebe, pirsê gramer û elfabeya zaravayê kurmacî bi xebateke hevbeş çareser neke, wê ev pirs girik jî di zimanê nivîsê de dom bike!..

Cara ewil Celadet Beg, rêzimana zaravayê kurmancî nivîsîye; wî di gramera xwe de qayîdeyên sê devokên kurmancî jî danîye. Di nava devokên kurmancî de, devoka; Cizîr, Culemêrg (Hekarî) û herêma Behdînan, navdêr û sernavên nêr ditewînin. Piştî ku rêzimana Celadet Beg di Hawarê de hat weşandin; bi vî awayî tewanga navdêrên nêr jî ket rêzimana kurdî; lê kesî, xeyn ji Kamiran Beg û hin nivîskarên ji herêma Behdînan. Kamiran Beg carna di nivîsên xwe de navdêrên zayenda wan nêr bi tîpa «î» yê tewandîye, vî qayîdeyî di Hawarê de bi kar nanîye.

Piştî rêzimana Celadet Beg, di van salên dawîn de, mijara tewanga navdêr û sernavên nêr, Mûrad Ciwan li derwayê welat anîye holê û wî xistîye rojeva zimanê kurdî yê nivîsê. Li ser mijara tewanga navdêrên nêr û sernavan em hinekî ji nêz ve li ser qayîdeyên devokên zaravayê kurmancî, gramera Celadet Beg û gramera Mûrad Ciwan bisekinin. Xeyn ji tewanga navdêr û sernavên zayenda wan nêr, em hinekî jî, li ser qayîdeyên cînavên bireser (min, tu, wî/wê, me, we, wan) û di hevokê de, ji bo xuyakirina pirhejmarîya bireseran (objektan); li qayîdeyên tewanga lêkerên têper (transîtif), ên dema bihurî û qayîdeyên veqetandeka nebinavkirî jî binêrin.

Çawa ku di zimanên hemû neteweyên dinyayê de devokên cûda hene, herwiha di zimanê kurdî de jî devokên cûda hene. Neteweyên xwedî dewlet, di nava devokên xwe de, devoka herî pêşketî, devoka ku ji xwendin û nivîsandinê re, hêsa ye; axaftina wê sivik e û ji guh re xweş e; ji zimanê xwe yê nivîsê re ji dezgehên ragîhandin û perwerdê re kirine bingeh. Devokên din jî hebûna xwe di jîyana civakî de wek zimanê axaftinê her domandine; ev devok dikarin di hin çîrok û romanên de jî xwe bipolarêzin.

Tewanga navdêrên nêr

Di zaravayê kurmancî de sê devok hene:

- 1- Devoka Behdînan, Culemêrg û Cizîrê.
- 2- Devoka Semsûr (Adîyaman), Meletye, Ruha û Maraşê.
- 3- Devoka Amed, Batman, Sêrt, Bedlîs, Wan, Mûş, Erzerom û Qersê.

Di devoka Behdînan, Culemêrg û Cizîrê de, navdêrên nêr dema di hevokê de bireser bin, di hin halan de tîpên tewandin; navdêr di halê tewandî de paşpirtika «î» an jî paşpirtika «i» werdigirin. Navdêrên mê, dema ku di hevokê de bireser bin, ew jî di hin halan de, di hersê devokan de jî tîpên tewandin û paşpirtika «ê» digrin.

Di devoka Semsûr, Meletye, Ruha û Maraşê de, navdêrên nêr, ên ku tîpa «a» û tîpa «e» yê di wan de hebin, tîpa «a» yê an jî tîpa «e» ya dawîn, werdigerînin tîpa «ê». Ev qayîde, qayîdeyekî gelemper nîne; ji bo temamê navdêrên nêr ku tîpa «a» û tîpa «e» yê di wan de hebin, derbas nabe. Ji ber vê yekê jî ferqeke mezin di nava vê devokê û di nava devoka Amedê de tune ye; ji guhartina çend tîpên navdêrên nêr nebe, tu ferq di nava van her du devokan de tune ye. Guhartina tîpên çend navdêrên nêr jî ewqas girîng nîne.

Di devoka Amed, Batman, Sêrt, Bedlîs, Wan û Mûşê de, navdêrên nêr, di hevokê de bireser bin jî nayên tewandin. Di hevokê de navdêrên nêr

bireser bin jî, wek xwe dimînin û di tîpên wan de jî tu guhartin çênabe. Dibe ku di vê devokê de jî çend awarte hebin, ew jî qayîdeyên gelemper xera nake.

Ji bo zelalbûna mijara tewanga navdêrên nêr, em ji herêma Culemêrg, Behdînan û Cizîrê, çend nimûne raberê xwendevanan bikin. Em pêşî li çend nimûneyên qayîde devoka Culemêrgê ku navdêrên nêr bi tîpa «i» yê ditewînin, binêrin:

Heval ji koni derket, li hespi suwar bû, berê hespi ziviran da rêya bajari û ajot.

Keç û xort li erdi rûniştibûn, nan û penêri dixwarin.

Ez serê sibehan zû radibim, derim kari. Sînem hê ji kari nehatîye.

Kûçikên şivani alîkarîya wî dikin û kerîyên pezi ji guran diparêzin.

Şoreş û malbata xwe sibê derin gundi.

Azad û Xebat hê ji aşi nehatine...

Devoka Cizîrê, Şirnax û herêma Behdînan jî navdêrên zayenda wan nêr, bi tîpa «î» yê ditewînin. Em niha jî li çend nimûneyên devoka Şirnax, Cizîr û herêma Behdînan binêrin:

Şivan pişta xwe daye kevirî (berî), ji pezî re li bilûrê dixê.

Havîn bû, esman sayî bû; heyv û stêrik li rûyê esmanî dibiriqîyan; giregîrên bajarî ji bo vergirtina hin biryarên girîng, hêdî hêdî li dîwana mîrî dicivîyan...

Her du jî tîfingên wan di destê wan de bûn, ji çîyayî daketin jêr û rast berê xwe dan gundî...

Heval û Şoreş biryar dane, sibê derin çîyayî, digîhin hogirên xwe; ji bo ku hogirên xwe di qada şerî de bi tenê nehîlên û herwiha bi hev re li dij dijminî şer bikin.

Buهار e, ava çemî (robarî) rabûye; meriv nikare niha li avê xe.

Zarûk li hundirî aciz bûn, wan çend deqe bibe derva!

Li van herêman navdêrên ku di hevokê de bireser bin û zayenda wan mê be, bi tîpa «ê», navdêrên ku dihevokê de bireser bin û zayenda wan nêr be jî, bi tîpa «î» yê ji hev cihê dikin. Xeyn ji vîya, tîpa «î» li van herêman wezîfeya veqetandeka binavkirî jî dibîne. Li gora qayîdeyên vê devokê, di hevokan de hemû navdêrên bireser, navdêrên binavkirî (naskirî) ne. Kesên ku di axaftinê de ne, zanin axaftin li ser çi an jî li ser kê ye. Ji bo zelalbûna mijarê em du, sê nimûneyên din jî raberê xwendevanan bikin:

Ez li hespî siwar bûm. Tu li kerî siwar bûyî.

Ez li mihîne siwar bûm. Tu li kerê siwar bûyî.

Dema ku li herêma Behdînan, Culemêrg, Şirnax û Cizîrê dibêjin; ez li kerî

siwar bûme, qesta wan kerê nêr e; dema ku dibêjin; ez li kerê siwar bûme, qesta wan kera mê ye. Li deverên ku navdêrên nêr natewînin û li deverên ku navdêrên nêr, ên ku tîpa «a» û tîpa «e» di wan de hene, tîpa «a» û tîpa «e» yê werdigerînin tîpa «ê», ew jî dibêjin:

Ez li hespê siwar bûm.

Ez li kerê siwar bûm (him ji bo kerê nêr û him jî ji bo kera mê).

Ez li mihînê siwar bûm.

Li van deveran zayenda hespê û zayenda mihînê, ne bi tîpên cihê, bi navên wan, wan ji hev cihê dikin. Em li ser vê mijarê li du nimûneyên din jî binêrin:

Alan, par xanîyekî pir xweş kirî, lê îsal destê wî pir teng e; niha dixwaze xanîyî bifroşe.

Egîd çend meh berê hespekî kumeyt î rewan kirî, lê niha jê aciz bûye; dixawaze hespî bifroşe.

Li vir xanî û hesp binavkirî ne; kesên ku di axaftinê de ne, zanin di axaftinê de behsa kîjan hesp û kîjan xanî tê kirin. Ji ber vê yekê jî xanî û hesp di axaftinê de naskirî ne.

Tewanga navdêran, halê navan (halê akûzatîf û datîf) e. Li gora qayîdeyên vê devokê, dema ku lêkerên têper di hevokê de bireser werdigrin, tên tewandin; bireser dikevin halê binavkirî. Hin bireser hene di hevokê de meneyeke taybetî, an jî halekî taybetî rava nakin; di hevokê de meneyeke gelemper rava dikin. Ji ber vê yekê jî; ne hewce ye meriv di her rewşê de, bireserê di hevokê de bitewîne; divê bireser di hin halan de, di hevokê de neyên tewandin; di hevokê de bêtewang bimînin. Lê, li van deveran gel vî qayîdeyî ji bo temamê bireseran bi kar tîne; di hevokê de temamê bireseran ditewînin. Lê tiştê ecêb ev e, ku zimanzanên me jî di gramerên xwe de vê ferqê danenîne.

Divê ferqekê di nava:

Ez xwarin dixwim û Ez xwarinê dixwim de hebe?

Ez nan dixwim û Ez nanî dixwim de hebe?

Ez nanî dixwim û Tama nanî de hebe?

Dema meriv dibêje; ez xwarin dixwim, meriv behsa xwarineke taybetî nake. Meriv nabêje; ez savar, meyîr, tirşik an kutlik dixwim. Xwarin navê hemû xwarinên ku meriv dixwe; ji meyîr û şorbê bigire heta; dolme, tirşik, dan û savar. Ji ber vê yekê jî ne hewce ye meriv navdêra «xwarin» di hevokê de bitewîne, wê bike halê binavkirî. Dema meriv dibêje; ez sêv dixwim; meriv behsa sêveke taybetî nake. Meriv behsa sêvekê dike ku ji hêla kesên

ku di axaftinê de ne, ne nas e. Sêv, sêveke ne naskirî ye; sêvek e, ez dixwûm. Lê, dema meriv dibêje; ez sêvê dixwim; sêv, sêveke binavkirî ye. Kesên ku di axaftinê de ne, zanin kîjan sêv e; ez dixwim. Nimûne: Dayîka lawik, ku meriv navdêrê bitewîne, divê meriv bêje; dayîka lawikî, ji lawik re xwarin datîne. Qasek paşê hevalên wî gazî wî dikin; lawik xwarina xwe xilas nake, ji ser xwarinê radibe. Dayîka wî dibêje; na, heta tu xwarinê xilas nekî, tu narî der!.. Li vir dayîka lawik xwarinê destnîşan dike. Nabêje; heta tu avê, zebeşê an jî petêxê nexwî, dibêje; heta tu xwarinê nexwî... Di vê hevokê de navdêra «xwarin» tewandî ye; binavkirî ye.

Li van herêmên ku navdêran ditewînin; gel di hevokan de hemû bireserên ku di bin bandora kirarê/kirdeyê (subjektê) de ne; û ji kirinên wî tesîr werdigrin, hemûyan ditewînin. Tu dixwazî bira hewce bike, tu dixwazî bira hewce neke.

Ji dêlva ku bêjin:	Dibêjin:
Tu şîr vedixwî.	Tu şîrî vedixwî.
Ew çay vedixwe.	Ew çayê vedixwe.
Hûn goşt dixwin.	Hûn goştî dixwin.
Em mast dixwin.	Em mastî dixwin.

Em ê di beşa tewanga sernavan de, dîsa li ser qayîdeyên vê devokê bisekinin û çend nimûne jî, ji gramera Mûrad Ciwan raberê xwendevanan bikin. Em niha mijara xwe bi qayîdeyên devokê ku di navdêrên nêr de tîpa «a» û tîpa «e» yê werdigerînin tîpa «ê», bidomînin.

Di devoka Ruha, Maraş Semsûr û Meletyê de, bi qasa 10,15 navên nêr ku tîpa «a» û «e» yê di wan de hene, tîpa «a» û tîpa «e» ya dawîn, werdigerînin tîpa «ê». Ev qayîde, qayîdeyekî gelemper nîne. Ji bo hemû navdêrên nêr û sernavên ku tîpa «a» û tîpa «e» di wan de hene, derbas nabe. Di zimanekî de, navdêrên ku zayenda wan yek bin, ya meriv hemûyan ditewîne, ya jî meriv hemûyan natewîne; nabe ku meriv di zimanekî de, navdêrên ku zayenda wan yek bin, hinekan ji wan bitewîne û hinekan jî netewîne. Ji ber vê yekê jî ev qayîde, qayîdeyekî gelemper nîne; divê ev qayîde tewang neyê hesibandin. Em niha; hinekî li ser qayîdeyên vê devokê bisekinin û ji qayîdeyên wê çend nimûne raberê xwendevanan bikin:

Apê Hesen westîya bû; li ser kulêv rûnişt, piştî xwe da dîwêr, ji berîka xwe qutîya cixarê derxist û ji xwe re cixarek pêça...

Zarûk çûne ser xênî. Li welêt rewş ne baş e.

Îsal ava êş kême bûye. Min êgir vemirand.

Xort ber bi çiyê de çûn. Genim têxin çewêl paşê herin!..

Di vê devokê de jî, li hin deveran, gel hin navdêrên nêr di hevokan de ditewîne. Lê, hin «zimanzanên» me, di hevokan de hemû bireserên ku tîpa «a» û «e» di wan de hebin, wan ditewînin. Ji ber ku şuxulê wan zehmet e. Hin zimanzanên me ji bo ku qayîdeyên vê devokê jî, di zaravayê kurmançî de bibe qayîdeyekî gelemper, hewl didin!.. Di vê devokê de jî;

Ji dilva ku bêjin: dibêjin:
Ez nan dixwim. Ez nêr/nîn dixwim.
Tu av vedixwî. Tu avê vedixwî.
Ew çay vedixwe. Ew çayê vedixwe...

Gelek navdêrên zayenda wan nêr hene ku tîpa «a» û tîpa «e» di wan de tunin. Ew navdêr di hevokê de wek xwe dimînin. Di hevokê de, tu guhartin di wan de çênabe. Navdêrên ku tîpa «a» û tîpa «e» di wan de tunin, gelo em çî ji van navdêran bikin?! Ji ber ku tîpa «a» û tîpa «e» di van de tunin, em wan ji zimanê xwe derxin?! An jî em di navdêran de hin tîpên din bi tîpa «ê» re biguhurînin?! Gelo zimnzanên me ji bo van navdêrên ku tîpa «a» û tîpa «e» di wan de tunin, çî difikirin?! Em niha jî çend nimûne jî navdêrên ku tîpa «a» û tîpa «e» yê di wan de tunin, raberî xwendevanan bikin:

Nimûme:	navdêrên tewandî
Tu gur dibînî, ber bi me ve tê!	Tu gurî dibînî, ber bi me ve tê!
Leşker wê gund bişewitînin!	Leşker wê gundî bişewitînin!
Jin li dîyarê gir hewar dikin!	Jin li dîyarê girî hewar dikin!
Alan dîk ser jê dike.	Alan dîkî ser jê dike.
Êşa dil zor e.	Êşa dilî zor e.
Şîr mayan bike, paşê here!	Şîrî mayan bike, paşê here!
Goşt ji wê hilde, dayne sarincê!..	Goştî ji wê hilde, dayne sarincê!
Zarûk nan û rûn dixwin.	Zarûk nan û rûnî dixwin.
Tama hingivî pir xweş bû.	Tama hingivî pir xweş bû.
Li dij dijmin yek bin!	Li dij dijminî yek bin!

Gel temamê navdêrên nêr ku tîpa «a» û tîpa «e» di wan de hene, tevan wernagerîne tîpa «ê». Ev qayîde tenê ji bo çend navdêrên ku di hevokê de, li hev tên. Di hevokê de ahengek çêdikin, ev ji bo wan derbas dibe.

Nimûne: Zayenda van navdêran jî nêr e:
Hesp, erd, ker, kar, mar, dew, dar, rez, çem, şer, bexçe...
Gel di hevokan de, di tîpên van navdêran de tu guhartin çênake.
Gel nabêje:
Ez li hêsp siwar bûm, min vîya li êrd dît.
Ew li kêr siwar bûye, ez derim kêr, Şengal mêr kuşt.

Zarûkan dêw rijand, min dêr şikand, em derin rêz.

Ava çem kûr e, qada şer fire dibe, darên bêxçe hişk bûne...

Gel dibêje:

Ez li hespê siwar bûm, min vîya li erdê dît.

Ew li kerê siwar bûye, ez derim kar, Şengal mar kuşt.

Zarûkan dew rijand, min dar şikand, em derin rez.

Ava çem kûr e, qada şer fire dibe, darên bexçe hişk bûne...

Ji bo ku Celadet Beg di gramera xwe de, di beşa tewanga navdêran de gotîye; meriv dikare navdêrên zayenda wan nêr ên ku tîpa «a» û «e» di wan de hebin, wan wergerîne tîpa «ê» û bi vî awayî wan bitewîne; hin nivîskar û «zimanzanên» me yên nû jî çiqas navdêrên nêr bi destê wan dikevin, ya «î» yek bi dawîya wan ve dikin, an jî tîpa «a» û «e» yê werdigerînin tîpa «ê». Hin kes ji wan navdêrên ku tîpên wan tên guhurandin re, dibêjin; «navdêrên di nava xwe de tewandî» û ji vê devokê re jî dibêjên; «devoka ber Firêt»!...

Di van salên dawîn de wisa bûye, kesên ku navên nêr natewînin, nikarin li ber hin «zimanzanên» ne xwedî gramer û kesên ji van herêman, biaxifin. Vên kesana hertim derûdora xwe bi xelet axaftinê tawanbar dikin. Dibêjin: «Tu xelet diaxifi! Nan dixwim, xelet e! Bêje: Nanî dixwim! Derim kar, xelet e! Bêje: Derim karî!...» Ev kesên ku wiha dibêjin jî ronakbîr in (!) Deh, panzde sal e li Ewrûpayê dijîn. Lê tişteke heye, ku her ronakbîr bi qasî pêşveçûna civata xwe pêş de dere!

Dema min tiştên wiha bihîst, rêxistinên me hatin bîra min. Min got: «Rêxistinên me ji bo yekhez, yekdeng û yekserok, mafê jîyanê nadin hev... Niha eynî tişt di pirsê ziman de jî dest pê kir (!?)» Lê mixabin li dervayê welat, di zimanê kurdî yê nivîsê de jî eynî gelşê dest pê kirîye. Em binêrin ka ev gelşa ziman wê heta kuderê here?

Di devoka Amed, Batman, Sêrt, Bedlîs, Wan, Mûş, Erzerom û Qersê de, ziman hatîye hêsakirin. Navdêrên nêr di hevokê de bireser bin jî, nayên tewandin û di tîpên wan de jî tu guhertên çênabe. Em niha jî li çend nimûneyên vê devokê binêrin:

Zarûk çûne ser xanî. Ew ji çem derbas bûn.

Herin lawik bînin!

Xort ji ber zilma neyar derketin çîya.

Tama nan xweş e; lê tama dew ne xweş e!

Agir vemirîne, paşê here! Ava çem sar e.

Sîyabend îro zû ji kar hat. Şivan duh pez bir zozanan...

Qayîdeyên devoka Behdînan, Culemêrg, Şirnex û Cizîrê, di zaravayê

kurmancî de, qayîdeyên taybetî ne. Qayîdeyên wê li her dû devokên din nayên. Nivîskar û zimanzanên me yên nû ku ne ji wê herêmê ne, lê nivîs û gramera xwe wek qayîdeyên wê devokê dinivîsîn û dixwazin van qayîdeyan bikin bingehe zimane nivîsê, li mal, li derva, bi hevalên xwe re bi qayîdeyên devoka xwe diaxifin.!?..

Li Kurdistanê, kesên ku bi devoka Behdînan, Culemêrg û Cizîrê diaxifin, hejmara wan ji sedî 10ê nifûsa kurmancan derbas nabe. Sedî 90ê kurmancan navdêr û sernavên zayenda wan nêr natewînin. Zimanzanên me pêşveçûn û xwe nûkirina ku di pêvajoya dirokê de di zimane kurdî de çêbûye li ber çav nagirin. Ew guh nadin qayîdeyên ku 30 milyon kurmanc pê diaxifin, anîne qayîdeyên devokeke ku 2 miljon kurmanc pê diaxifin, wek ku di zaravayê kurmancî de tu qayîdeyên din tunin an jî, ji derwayê van qayîdeyan, qayîdeyên din tev xelet in, raberê kurdan dikin û herwiha dixwazin berê ziman ji ser rêya wî ya rast vegehnin. Gelo hewce dike, meriv rabe li ser navê zimanzanîyê, qayîdeyên devokeke herêmî li ser sedî 90ê kurmancan ferz bike û bi vî awayî jî di ziman de tevlihevî çêke ?!

Celadet Beg di gramera xwe de behsa qayîdeyên devokan nekiriye. Wî di beşa tewanga navdêran de, minakên xwe bi sê qayîdeyên cihê ku me li jorê behsa wan kir, nîşan daye. Celadet Beg, li ser tewanga navdêrên nêr ên ku bi tîpa «î» tîn tewandin, qeneta xwe jî gotiye. Li gora qeneta wî, tewanga navdêrên nêr, ên yekhejmar, ber bi bîrkirinê ve dere. Em niha jî, li ser mijara tewanga navdêrên nêr ê yekhejmar ku bi tîpa «î» tîn tewandên, li qeneta Celadet Beg û li çend nimûneyên wî binêrin.

«Şanek: Ji raveka jêrîn dixuye ko di navdêrên nêr de meyildariya zmên ber bi terikandina tewanga wan a yekhejmar e: nemaze şiklê pêşin. Ji lewre her sê şiklên jêrîn rast in.»

«Soro kevirî tavêje. Soro kêvir tavêje. Soro kevir tavêje.

Gurgîn çû aşî. Gurgîn çû êş. Gurgîn çû aş.

Balefir ber bi esmanî firî. Balefir ber bi esmên firî. Balefir ber bi esman firî.

Em ji xaniyî derketin. Em ji xênî derketin. Em ji xanî derketin.» (5)

Celadet Beg nimûneyên xwe bi van qayîdeyan didomîne. Di nimûneya «Em ji xaniyî derketin» de, navdêra «xanî» ji xwe bi tîpa «î» xîlas dibe. Gelo hewce dike meriv tîpa «y» bîne pey tîpa «î» û î yeke din jî pê ve bike; navê xanî bike «xaniyî»? Çi ye ku meriv di hevokê de navdêrên nêr ditewîne (!?)

Her çiqas, Celadet Beg di gramera xwe de, qayîdeyên devoka Behdînan û Cizîrê danibe jî, ji ber vê qeneta xwe, wî di nivîs, werger û «îzehetên» xwe

yên di gramer û elfabeya xwe de, navdêrên nêr netewandîye. Wî, carna navdêrên nêr û sernavên ku tîpa «a» û tîpa «e» di wan de hene, wan wergeradîye tîpa «ê». Baş e ku Celadet Beg di gramera xwe de ji qayîdeyên hersê devokan re jî gotîye rast in. Ku wî jî wek Mûrad Ciwan ji qayîdeyên du devokan re bigota «rast in» û ji ê yekê re jî bigota «xelet e», me yê çî bikira ?!

Em li vê derê hinekî ji mijara xwe dûr bikevin. Hemin me behsa gramera Celadet Beg kir û ji gramera wî çend nimûne raberê xwedevanan kir; ez dixwazim li vê, li ser du, sê tiştên din jî bisekinim û jî gramera wî çend nimûneyên din jî raberê xwedevanan bikim. Berya ku em dagerin ser mijara xwe, ez dixwazim hinekî li ser veqetandeka nebinavkirî û di hevokan de, ji bo xuyakirina pirhejmarîya bireseran, em li qayîdeyên tewanga lêkerên têper, ên dema buhurî û li ser qayîdeyên cînavên bireser bisekinin û paşê em disa vegerin ser mijara xwe û wê bidomînin.

Veqetandekên nebinavkirî dikevin paşîya navdêrên ku ji wekhevên xwe hatine veqetandin, lê nehatine binavkirin. Em li vê derê behsa hemû şiklên veqetandekên nebinavkirî nakin; ji veqetandekên nebinavkirî em ê li ser veqetandeka pirhejmar, ên her du zayendan tenê bisekinin. Di zaravayê kurmancî de du veqetandek hene:

1- Veqetandeka ji bo navdêrên yekhejmar, ên her du zayendên ku di hevokê de bi serê xwe ne û di hevokê de hê bireserek nedaye dû wan.

2- Veqetandeka ji bo navdêrên pirhejmar, ên her du zayendan.

Nimûne:

ek ji bo zayenda nêr.

ek ji bo zayenda mê.

hin ji bo pirhejmarîya her du zayendan.

Ev veqetandek ji bo navdêrên ku di hevokê de bi serê xwe ne ; di hevokê de hê bireserek nedaye pey wan; ji bo wan e.

Nimûne:

Waye lawikek di wê de dere.

Waye keçikek ji wê de tê.

Binêre, waye hin xort ji wê de tîn!..

Tu dibînî ? waye hin leşker ber bi me ve tîn.

Wek ku di nimûneyên jor de jî dixuye, navdêrên jor di hevokan de bê bireser in; di hevokan de tu bireser bi wan ve nebûne.

Celadet Beg di beşa veqetandekên nebinavkirî de, ji bo navdêrên pirhejmar, ên her dû zayendan, veqetandeka «in» danîye. Em niha li ser vê mijarê li çend

nimûneyên wî binêrin:

«Hespek hat. Hespîn hatin.
Mehînek hat. Mehînin hatin.
Min hespek dît. Min hespîn dîtîn.
Min mihînek dît. Min mehînin dîtîn.
Ëv hespek e. Ëv hespîn in.
Ev mehînek e. Ev mehînin in.» (6)

Ev veqetandeka nebinavkirî ji bo pirhejmara navdêran, li herêma Behdînan, Culemêrg û Cizîrê jî tune. Dibe ku ev qayîde li hin gundan hebe ?! An jî Celadet Beg bi xwe çêkiribe. Li Kurdistanê, kes vî qayîdeyî bi kar nayne. Ev qayîde jî zaravayê kurmancî re xerîb e.

Piranîya kurmancan wiha dibêjin:

Hin hesp hatin.
Hin mihîn hatin.
Min hin hesp dît/dîtîn.
Min hin mihîn dît/dîtîn.
Ëv hin hesp in. Ëv hin mihîn in.

Ji bo ku Celadet Beg vî qayîdeyî di gramera xwe de danîye, Mûrad Ciwan jî vî qayîdeyî girtîye, di gramera xwe de, hê jî bi pêş xistîye û di hêla nimûneyan de jî, wî dewlendamî kirîye! Em niha li ser vê mijarê, li çend nimûneyên Mûrad Ciwan jî binêrin:

«berfîne çiyayîna/çiyana ...qîjînine pitikînan/pitikîna
birînine xencerînan/xencerîna şêrîne çiyayînan/çiyayîna
derîne xaniyînan/xanîna tûrîne şivanînan/şivana ...» (7)

A rast, meriv meraq dike! Gelo ev qayîde li kîjan herêmên Kurdistanê heye ?! Qayîde ku di ziman de tunebe, an jî gel wan bi kar neyne, hewce dike jî bo ku Celadet beg di gramera xwe de van qayîdeyan danîye, meriv jî bi texlîte wî bike ?!

Di devoka Behdînan, Culemêrg, Cizîr û Semsûrê de, qayîdeyek ji bo bireserên lêkerên têper, di demên buhurî de, heye. Li gora vî qayîdeyî di hevokê de, yekhejmar û pirhejmarîya bireserê di lêkerê de didin xuya kirin. Lêker di demên buhurî de, ji bo bireserên pirhejmar, forma rader (înfînîtîf) digre. Herwiha dixwazin bi alkarîya lêkerê pirhejmarîya bireserê rava bikin.

Nimûne:

Sîyabend sêv xwarin.
Heval sê name nivîsîn.
Bavê min ji min re çar pirtûk kirîn.

Ku meriv di hevokan de, ji bo xuyakirina pirhejmarîya bireseran, vî qayîdeyî bi kar bine, wê gavê meriv di hevokê de têkilîya kirar û lêkerê ji hev dibire. Di hevokê de têkilî, yekser, di navbeyna lêker û bireserê de çêdibe. Di nimûneya «Siyabend sêv xwarin» de, hejmara sêvan ne dîyar e. Bi alîkarîya lêkerê dixwazin pirhejmarîya sêvan bidin xuyakirin. Bi gotineke din, dixwazin bêjin ku Siyabend çend sêv xwarîye. Di nimûneya «Heval sê name nivîsîn» de, hejmara nameyan dîyar e. Ê ku nameyan dinivîse, Heval e; ne hinên din in. Lêker li gora yekhejmar û pirhejmarîya bireserê nayên tewandin; ew li gora yekhejmar û pirhejmarîya kirarê tên tewandin. Dibe ku ev jî di qayîdeyên van devokan de tiştekî awarte be !?

Ji bo ku Celadet Beg vî qayîdeyî di nivîsen xwe de bi kar anîye, gelek kesên ku li dervayê welat hînê xwendin û nivîsandina kurdî bûne, di nivîsên xwe de vî qayîdeyî bi kar tînin. «Zimanzanên» me jî, li ser van qayîdeyan tiştek negotîne. Bê lêkolîn, bê lêgerîn û bê fikrandin, wan jî dane ser vê şopê, dimeşin. «Zimanzanên» me, ji dêlva ku yekser bidana ser vê şopê, divîyabû hinekî li ser vî qayîdeyî bisekinîyana, bifikirîyana. Gelo, her çi qas di ziman de li mantiq neyê gerîn jî, ev qayîde bimantiq e, an bêmantiq e? Pirsra ziman jî nekirana wek sîyaseta bîst, bîst û pênc sal berê; ku milletê digot «Hz. Îsa wiha gotîye ! Marx wiha gotîye! Lenîn wiha gotîye! Xilas! Ji bavê kê zêdebû, êdî bi karibûya tiştekî din bigota!..

Mûrad Ciwan jî, vî qayîdeyî di gramera xwe de danîye. Him ji bo bireserên yekhejmar û him jî, ji bo yên pirhejmar nimûne rava kirîye. Ji bo ku gramera wî bi îzeheta tirkî ye, di nava kevanekan de tirkîya wan jî nivîsîye. Em niha li çend nimûneyên Mûrad binêrin:

«Min kitêb nivîsî. (Ben kitâbî yazdîm.)

Min kitêb nivîsîn. (Ben kitaplari yazdîm.) »(8)

Li gora vî qayîdeyî, divê bireser ne gelhejmar û ne tewandî bin. Di minaka «Min kitêb nivîsî» de, kitêb ne kitêbeke binavkirî ye; nebinavkirî ye. Lê, di tirkîya wê de, kitêb binavkirî ye. Hingê divîyabû tirkîya wê: «Ben kitap yazdîm» bûya. Di nimûneya «Min kitêb nivîsîn» de, pirhejmarîya pirtûkan di lêkerê de, daye xuyakirin. Kitêb disa nebinavkirî ne. Lê di tirkîya wan de, kitêb binavkirî ne. Ku meriv vê hevokê wergerîne tirkî, tirkîya wê dibe: «Ben kitaplar yazdim. Di her du nimûneyan de jî, bireser (kitêb) nebinavkirî ne. Lê, qesta nivîskar li vê pirtûkên binavkirî ne. Bi gotineke din kesên ku di axaftinê de ne, zanin behsa kîjan kitêbê an kîjan kitêban tê kirin. Lê, li gora qayîdeyên devoka me pirtûk nebinavkirî ne.

Celadet Beg, di mijara cînavên kirar û cînavên bireser de, qayîdê devoka

Behdînan, Culemêrg, Cizîr, Ruha û Semsurê danîye. Di zimanê kurdî de qayîdeyekî taybetî heye; di hevokê de, kirarên lêkerên transîtiv, di dema buhurî de, dibin bireser, tên tewandin. Li gora qayîdeyên vê devokê, di dema buhurî de, cînavên bireser dibin kirar, di hevokê de, netewandî dimînin û cînavên kirar jî dibin bireser, di hevokê de tên tewandin. Bi gotinek din, di dema buhurî de, navdêr û sernav di hevokê de, dema bireser bin jî, nayên tewandin; ji dêlva wan de, kirar tên tewandin.

Ev jî qayîdeyekî ecêb e! Lê em nikarin ji qayîdeyên ziman re tiştek bêjin. Ji ber ku ziman jî hebûneke civakî ye. Gel, wî di pêvajoya dîrokê de, di nava berhem û pêwendîyên civakî de pêk anîye; îcada çend aqilmendan nîne!

Em niha li ser mijara cînavên kirar û cînavê bireser li çend nimûneyên Celadet Beg binêrin:

«pronavên kirar	pronavên bireser
ez - min	
tu - te	
ew - wî, wê	
em - me	
hon - we	
ew - wan	

Zîne Sîsin dît.	Wî ew dît.
Hespan ceh xwar.	Wan ew xwar.
Cîranan em dîtîn.	Wan em dîtîn.
Mîn qelem ji destê xwe xist.	Mîn ew ji destê xwe xist.
Soro ez xapandim.	Wî ez xapandim.» (9)

Di pey van nimûneyan de, em niha jî li çend nimûneyên tewanga cînavên bireser ku li hêla: Xarpêt, Amed, Batman, Sêrt, Bedlîs û Wanê bi kar tînin, binêrin. Wek ku me li jor jî gotibû, ev devok navdêr û sernavên zayenda wan nêr, di hevokê de, natewîne. Lê dema ku ji dêlva navdêr û sernavên bireser de, cînavan bi kar tînin, cînavan di hevokê de ditewînin. Cînavên bireser dixin şûna navdêr û sernavên bireser. Di hevokê de, cînavên kirar naxin şûna navdêr û sernavên bireser. Lê dema navdêr û sernavên zayenda wan nêr dixin şûna cînavên bireser, wan natewînin. Ew di hevokê de bêtewang dimînin. Ji bo zelalbûna mijarê, em li çend nimûneyên jêrîn binêrin:

Azad Bêriyê bir hêlînê.	Wî wê bir hêlînê.
Mîn duh Şîyar dît.	Mîn duh wî dît.

Baş e ku Xezalê Çîya bir. Baş e ku wê wî bir.

Jêhat min bir.

Wî min bir...

Celadet Beg di gramera xwe de, behsa cînavanên ku bi vî awayî tên tewandin, nekiriye. Li ser vê mijarê bêdengmayîne çêtir diye. Lê, Mûrad Ciwan di gramara xwe de, behsa bi vî awayî tewanga cînavan kiriye. Di gramera xwe de dîmen (tablo) çê kirîye. Ji qayîdeyên her du devokan jî nimûne nîşan daye.

Mûrad Ciwan, piştî 40 salan gîhîştîye qeneta ku heta niha zimanê kurdî xelet axifîye. Ji ber vê yekê jî, wî biryar daye, ku rojek berya rojê kurdîya xwe rast bike; ji bo rast axaftin û rast nivîsandinê jî, alîkarîya gel bike (!) Ji bo vê yekê jî gramera zaravayê kurmançî nivîsîye. Wî di gramera xwe de, xêz kişandîye ser qayîdeyên devoka ku 40 sal pê axifîye; hê jî pê diaxife! Dema Mûrad di heqê devokên zaravayê kurmançî de biryar daye, wî diroka zimanê kurdî ya dûr û dirêj, pêvajoyên ku têde derbas bûye, tunebûna dewleta kurdan û çêbûna civakaborî ya Kurdistanê li ber çavan, negirtîye; biryar daye. Wî di gramera xwe de gotîye: «Ev qayîde xelet e.» Lê ji bo çî xelet e, negotîye.

Ji ber ku Mûrad gramera xwe li ser bingehê qayîdeyên devoka Behdînan û Cizîrê ava kirîye, ne tenê ev qayîde li gora qayîdeyên gramera wî «xelet» e; temamê qayîdeyên devoka ku navdêrên nêr û sernava natewînin, «xelet» in (!) Ev qayîde tenê bûya, tişt nedibû! Li gora qayîdeyên rêzimana Mûrad, divê sedî nodê kurmançan, herin ji nû ve kurdî hîn bibin! Mûrad, vê problemê wê çawa hel bike ?!

Em niha li ser tewanga cînavên kirar û cînavên bireser, ji gramera Mûrad li çend nimûneyan binêrin:

«Rast	Xelet
Te ez dîtîm.	Te miñ dît.
Te ez dîn kirim.	Te min dîn kir.
Min tu birî.	Min te bir.»(10)

Li gora qayîdê devoka me, di nimûnên «Te ez dîtîm, te ez dîn kirim, min tu birî û Soro ez xapandim» de, kê kî dîtîye, kê kî dîn kirîye, kê kî birîye û kê kî xapandîye, ne dîyar e! Lê, wek ku me li jor jî got, ziman îcata çend filozof, çend zimanzan û çend ronakbîrên jîr nîne. Gel, wî çêkirîye. Heta ziman gihaye şiklê îro bi sed hezar salan dem derbas bûye.

Komikên merivan di erdnigarîyên (coxrafyayên) cihê cihê de jîyane. Di erdnigarîyên cihê cihê de ziman, zarava û devokên cûda cûda pêk anîne. Ma ku di destê zimanzanan de tu alavên (aletên) pîvanê jî tune, ku meriv li gora

wan pîvanan binêre gelo, kîjan ziman, kîjan zarava û kîjan devok xelet in, an jî kîjan rast in. Nîvê nifûsa kurmancan cînavan wiha bi kar tînin. Divê meriv vîya xweş bibîne. Meriv biryara mirina qayîdeyên devoka ku li gora qayîdeyên devoka meriv «xelet» bin jî, nede! Di sîyasetê de kurdan xeletiyên wiha kirin. Kurdan xesarên mezin jê dîtin. Diviyabû ev tişt di mijara qayîdeyên devokên kurmacî de nehatana dubarekirin!

Têbinî:

Nivîsa min a ku di kovara Çira, hejmara 15-16an de, bi navê; «Di Pêvajoya Dîrokê de Zimanê Kurdî», derket de hin xeletiyên teknîkî hebûn. Ew çend xeletiyên ku hatine kirin, ez dixwazim wan serast bikim. Û ez wisa bawer dikim, ji destê vê kompîtora min, digel alîkariya hevalên redaksyonê jî, wê dîsa hin xeletiyên teknîkî bibin. Ji nihade ez lêborînê dixwazim.

Nimûne: Rûpel 82, paragraf yek; ... Şeref Xan Beg. Rûpel 83, rêz yek; ... wan disa danîyan di odê de li hemberê xwe didan rûniştandin. Rûpel 88, paragraf 3. Ê kurdan ne dewleta wan... Eynî rûpel, paragraf 4, rêz yek; ... ,bi pîrsa çareserkirina mafê kurdan ê netewî ve girêdayî ye. Rûpel 90, paragraf 5; ... , piştî destpêka şerê gelê kurd ê netewî... Rûpel 92, paragraf 3, rêz 4. Ên ku zanibûn jî... Bi vî awayî zimanê wan ê zikmakî qels bû. Eynî rûpel, paragraf 3, rêz 5. Ev her sê «ê» yên dawîn di hevokan de bûne «î». Di nivîsê de, «dewleta osmanî» jî li hin cîyan bi tîpa mezin û li hin cîyan jî bi tîpa piçûk derketîye.

Newroz

Ibrahîm R. Zaxoyî

Kawe kurdek bû, hebû cergê şêr
Dest da mirqutî, ew ê destik zer
Milet lê kom bû, pêk ve jin û mêr
Rahêlan xwîn(xuîn)mêjê, çu ca ne dibû têr
Bi mîrqutekê ser lê pelixand
Agir hilkirin, gel pê bûn şad
Îro Newroz e serê biharê
Îro Newroz e bû serê şal ê
Newroz bo kurdan şahî û xoşî ye
Newroz bo kurdan cejn û şadî ye
Zemîn xemilî, kiras kir ber xwe (berxu)
Kirasekî kesk bi kulîlkan geş bû
Kulîlkên reng reng, hemî reng hebûn
Dirext xemilîn, belgêt wan kesk bûn
Gundiyan pêk ve, dest dane mêran
Wan zevî kolan, dane ber rezan
Piştî réz çêbûn, nemam bi wan înan
Wan nemam çandin, li milkêt rezan
Piştî çandinê, ewan rez kolan
Paşî dest dane, zibara kalan(khalan)

Newroza îsal, millet digeş kir
Ew bîrhatine millet hişyar kir
Derdê me kurdan gelek giran e!
Derdekî pîs e, ne hind asan e
Nezanîn e ew, bê pakî li gel
Zanîn derman e bo we kurên gel
Miletên nezan, ne bûn serbixwe (serbixu)
Kevtin bindestê, yêt girtin hev du
hev û du bigrin hûn bibin zana
Da hûn rizgar kin welatê kurda

Têbînî: Helbet nivîsa ku li hesabê me ne hat, em jî dikarin wê çap nekin. Kongrê ew heq daye me. Nivîskarê şîhrê endamê Komelê ye. Em pê re peyivîn ku di şîhra wî de çewtiyên gramerî hene. Lê birêz Zaxoyî ji ser a xwe ne hat xwar; xwe wek gramerzaneyekî tamam pêşkêş kir û pir xwest ku em vê şîhra wî jî biweşînin... **Redaksiyon**

Qirkirina Şirnexê

Xidirê Ūso

”Ev qirkirin li nivê meydanê, heşkere bû.
*Cihê ku xwîna bêgunehan lê tê rijandin, ne li daristanê,
ne li ser kuma pampa ya tîh ku her tiştî vedişêre.
Ji bo ku vê bûyerê veşêre hewldan rê neda tu kesî.
Tam di dilê welat de bû ev qirkirin!”*

Pablo Nerûda

Bi sergêjaniyek dilî derbas dibû jiyan.
Kunkunî bûbû dilê me, ji nikilandinên sîsalkan.
Bi dîwarekî ji pola hatibû pêçan, çarhawîrî me,
zindan di hundir zindanê de hatibû pêçan.

Di tariyê de êrîşî bedena me dikirin gornebaşan.
Di bin çovan kiribûn defa hewarê çermê me.
Zimanê me daliqandî mabû, bi diranê koremarê ve!
Her dem qêrînek kovî bilişd dibû, ji gund û bajaran.
Her kortek çiyar, avek xemgîn û kevîrekî lal,
sîrek tirsehêz vedişart di nava xwe de.

Li Şirnexê biryara meşînê hat dan bi çek û liberxwedan.
Bêwezn û pîvan, dîsa serî hilda gel, mîna hûtekî kevnar;
mîna kevokên hêviyê meşîn kirin keç û xortên ciwan;
di nav pêtiyên agir, di gewriyên maran re;
bi viyanên aşitiyê, bi durîşmên azadiyê meşiyar.

Ewran zik da bû, ji dûmana barûdê û hêstirên xwînê!
Pêjina mirinê, mîna mijek sar pêçabû bajar!
Gurên boz, kemîn danîbûn li devê her kolanê;
ji xwînmijên Çankaya hatibû fermana rûxînê.

Lûle verşiyar, ezman hejiya, bû gurmîna dilê bajêr.
Dengê mirovan, di bédengiya barûdê de fetisî!
Li şûna her alekê laşek dirêj bû;
li qada Newrozê,
xwîn û dohn bi hev re diherikî;
dohnê mejiyê mirovan;
mrovên bi viyana çirûskek azadî!

Kitêbeke nû "Autobîografîya Ebdurrizaq Bedirxan"

Malmîsanij

Autobîografîya Ebdurrizaq Bedirxan,

Wergêr ji rûsî: Celîlê Celîl, Weşanên Havîbûn, Berlin, 1999, 72 rûpel

"Autobîografîya Ebdurrizaq Bedirxan" wek kitêbeke piçûk derket. Evdirezaq Bedirxan (1864-1918) yek ji mensûbên malbata Bedirxaniyan e ku di destpêka sedsala bîstan de di nava tevgera welatperwerî ya kurdî de aktîf xebitîne.


Ew kurê Necîb Paşayî û nebiyê Bedirxan Begî ye. Demekê di nava burokraşiya Împeratoriya Osmanî de xebitiye. Salekê wek sekreterê sisiyan li balyoźxaneyê osmaniyan a li Petersburgê kar kiriye. Çarde salan li Seraya Sultanê osmaniyan Evdillhemîd, karê "mabeyn" û "teşrifat"ê kiriye. Piştî kuştina

Ridvan Paşayî li Îstenbolê, hatiye girtin û sirgûnê Trablusêxerbê (Trîpolî) bûye. Dû re ceza dardakirinê dane wî û hin merivên wî. Ew çend salan li wir di zindanê de mane lê paşê hatine efûkirin û vegeyane Îstenbolê.

Piştî vegeyane Îstenbolê Evdirezaq bi berpirsiyarên Îttîlîad û Tereqqiyê re li hev nake, bi dîplomatên Rûsya re têkiliyan datîne, ew di sala 1910an de wî dişînin Tiflîsê (Tilbîsê).

Evdirezaq Bedirxan ji wê salê, heta ku di 1918an de bi destê berpirsiyarên osmaniyan bête kuştin xebata xwe ya piralî li Tiflîsê, Qafqasyayê û Kurdistanê didomîne. Ew û hin kurdên demekê li Xoyê dibistanekê kurdî vedikin. Ew dinivîse:

"Saya alîkarya hêja Çîrkov me li Xoyê bingeha dibistanekê bi 30 şagirtava danî. Dibistan bi kîsê kurda dihat xaykirin û di bin bandûra parastina



konsûlxana rûsada bû. Li wêderê zimanê kurdî û rûsî derbaz dibûn. Hêja Çîrkov baş wan namenivîsandîna, yên di orta min û serokên kurdada, ji Makuyê destpêkirî heta bighîje wîlayeta Mûsilê û tevî şêxê Barzanê çêbibû, hebû.” (r.33)

Di dema Şerê Yekem ê Dinyayê de, Evdirezaq tevî orduya Rûsyayê, li Kurdistanê li hemberî orduya osmaniyan şer dike. Ew bi xwe dibêje:

”Daxwaza mine bingehî azadîya Kurdistanê ye di bin bandûra Rûsyayê da, ji ber ku nava wan dewletan da, yên ku cînarê me ne, tenê Rûsya ye dewleta pêşveçûyî û kûltûra wê ji hemûya hêsatir dikare bi dergê wê va derbazî nav me bibe. Bona pêkanîna vê proyêktê ji her tiştî pêştir, divê em nîrê turka wêda bavêjin. Eve ew xal, ku ser wê întêrêsên me û Rûsyayê dighîjin hev” (r.33)

Ev kitêba 72 rûpelî, ji du belgeyan pêk tê. Her du belge Evdirezaq Bedirxanî ji berpîrsiyarên Rûsyayê re nivîsandîne. Eslên wan nehatine dîtin lê wergerên wan ên rûsî di arşîva Rûsyayê de hatine parastin. Tarîxnasê navdar Celîlê Celîlî ew peyda kirine, ji rûsî wergerandîne bo kurdî (kurmancî) û gelek not lê zêde kirine. Herweha jibo navên kesan û ciyan du îndeks jî amade kirine (r.62.72).

Di van belgeyan de Evdirezaq Bedirxanî kurtejiyana xwe nivîsiye, bi taybetî li ser xebata xwe ya 1910-1916an sekiniye. Jibo kesên ku elaqe wan ji vê babetê re û tarîxa Kurdistanê re heye ev kitêb gelek balkêş e. Çi heyf ku ji alî ziman ve gelek kêmasiyên vê kitêbê hene. Bi taybetî ji alî rastnivîsandîne (ortografîyê) ve. Bo nimûne, divê ku postpozîsyon ji kelîmeyên din cihê bihatana nivîsîn lê bi wan re hatine nivîsîn. Herweha kar (verb) û kelîmeyên din carna bi hev re hatine nivîsîn.

Mamosta Celîlê Celîlî bi wergerandîna van belgeyan karekî hêja kiriye. Me hêvî heye ku xebatên wî yên din jî bigihîjin destê xwendevanan.

Gawestî

Huseyin Kişniş

Wergera ji tirkî: M. Lewendî

Navê Bertolt Brecht her tim Kurdên me yên **"wir"** tîne bîra min. Ji xwe me heta îro gelek tişt û kes şibandine yên xwe. Lolo yên di stranên Laponan de, rengên di cil û bergên meksîkayîyekî de, hemû yên me ne. Ma ew sahneya berrîyê ya di filmê Parîs-Teksasê de jî ji xwe li **"wir"** li ba me hatibû kişandin.

Brecht qaçax e, reviyaye Fînlândiyayê. Li gor gotina hinekan ji ber *"îskana mecbûrî"*. Û mîna Gawestîyan fersend nedîye ku xatir bixwaze. Lê wek wan bi rik û înad *"Mîxek jî bi dîwêr de nekutaye, tenê çakêtê xwe danîye ser kursîyê."*

Dema ku Gawestî hatin Anadolîya Navîn her der *"gul û gulistan"* bû. Ji bo bicîhbûnê her tişt bi rêk û pêk bû. Lê dîsa jî ew ji **"wir"** in, ne ji **"vir"** in. Û tew bi ser de li hember alemê rezîl û ruswabûn jî heye. Paşê nebêjin ku xerîbên çiyayî hatin li deştê bi cîh bûn. Ji ber vê gotinê çûn xanîyên xwe li qûntara wan çiyayan avakirin. Xwe wek pêgir dîtin û fedî dikirin. Heft tebeqe ketin binê erdê. Ma ew ji bo vê yekê hatibûn? Na, wê piçekî bêhna xwe vedana û pişt re ewê dîsa bi riya xwe de biçûyana.

Ma ji çiyê hatin qey berra yên deştê nadin. Ji xwe, li xwe jî danaynin. Û ji ber wê ye ku darek jî neçandin. Lê muhtacî pîvazên hişk bûn. Û ji yeka xwe jî neman ku ji cîranên xwe re bibêjin *"tirkê soxancî"* (tirkê pîvazfiroş). Li ba me li wê derê navê çerçîyan *"tirkê soxancî"* bû.

Çerçîyan ne tenê pîvaz, her tişt, ger bixwestana kevir jî difirotin. Ji ber ku yên me, bêyî genim û ceh tu tiştêkî din nediçandin. Çimkî li xwe danedianîn, eyb û şerm bû. Karên weha ne ji wan re bû, ne karê mîr û began bû. Gava ku çerçî dihatin gund, zarok bi banga *"tirkê soxancî, tirkê soxancî!"* diçûn pêrgî wan. Diyare ev ne eyb û qerfkirinek bû ku çerçî bi xwe jî her bi vê yekê re dibişirîn û dikenîyan. Û tiştên ku ji bo firotinê dianîn di demeke kurt de xelas dibû û li mala *"nasîkberekî"* (nasekî) bi xwarinên herî xweş dihatin ezimandin.

Her çerçîyek nasekî xwe hebû. Tiştêkî wek kirîvatîyê. "Nasikberê" me jî gûzfiroşek bû. Lê salê tenê carekê dihat, ew jî di meha rojîye de. Di sihoran de mirov jî tahma nanê bi gûz têr nedibû.

Ez nizanim ji ber çî ye, lê ji îmam re jî digotin "tirkê nêr".

Îmamekî din î nû hatibû gund. Îmam efendî li gel pîremêrên gund ezimandibûn xwarinê. Dîsa beranekî kel serjêkiribûn. "Tirkê nêr" li serê dîwanê rûniştibû. Piştî xwarinê çayên giran hatin. Muxtêr dest bi axaftinê kir: Û gotin bir û anî û hat ser Îmam efendî ku goya Îmam efendî do bi rê de bazdaye ser kerê xwe. Kenê civatê li gund belav bû. Yê ku ne li wir bûn fêhm kiribûn ku sohbet gehîştîye kîjan qonaxê. Îmam hê di şoka bûyerê de ye. Feqîro di jiyana xwe de îkram û ezimandineke weha nedîbû. Û "Çi bi van hatibû?" jî xwe re digot. Bi çavên wekî ku li ber wan bigere û lavayîyan bike û bibêje: "Weha mekin Kurdino! Ez qurban, weha mekin!" Îmam roja din jî gund direve.

Muftîtiya Kirşehîrê êdî di ber re nedigihand ku îmaman bişîne gundê Tabûran. Gotina "Li gundê xwe jî xwe re îmamekî bibînin!" yek ser bi paş de vegerya. "Ma tirkê nêr jî çî re ye? Hem jî li gundekî sed û deh xaneyî û sed û deh axayî. Ma qet hatîye dîtin ku axayek li ber axayekî din serê xwe xwar bike, axa jî axayî re xulamtîyê bike!" Lê îmamê ku li ber xwe dabe û li gund sekinîbe, ew bi rûnê ni vîşk û şîr û mast hatîye xwedî kirin, tene û zadê wî yê salane hatîye amadekirin, zekata wî jî berî salekê hatîye berhevkin.

Mamoste yê herî resmî ye. Kes naçe mala wî, wî dawetî malan jî nakin. Ger li gund pêrgî hev werin jî tenê silavê didinê, hal û xatir jî nayê pirsîn. Û jî alî mast û penêr û sergînan ve jî tu carî wî bêpar nahêlin. Yê ku bi zimanê wî bi axife tê şermezarkirin û li heft gundan tê rezil û riswa kirin. Nizanim lawê kê jî Îstenbolê hatîye û bêhemdî xwe jî devê wî gotina "maalesef" derketîye. Hê jî poşman e. Feqîro hê jî dibêje: "Bi Xwedê min negot maalesef, min got Mala Sêvê!"

Heta Îstenbolê çûn. Derya jî dîtin. Lê ji bo biçin bajarokê cîran, erebeyeke wan tunebû. Çawa be "tirkê zort zort" hebû. Gundê mestî mezin û hewqas gundî, her bi peyatî diçûn û her tim jî muhtacî erebeyekê bûn. Lê qet jî xwe re nekirin xem û derd. Çawa be wê rojekê biçûyana. Ji ber ku mîxek jî bi dîwêr de nekutabûn û çakêtên wan jî hê li ser kursîyan bûn.

(Ji kovara Bîrnebûn, no:5/1998, r. 80)

”Bi haweyê tirkî!..”

Laleş Qaso

Ji dawiya sala 1980î heta îlona sala 1983an, mehmetçîkan di Zindana Diyarbekirê de wilo ecêb bi serê kurdan de anîn bê bêlome be!.. Ji ber ku girtiyan jî di literetora kurdî de ji wan ecêban re nikarîbûn nav peyde bikirana, her navê ku peyde dikirin lê ne dihat, îcar wê bigotana ”bi haweyê tirkî bû!..” Gava ku yek ji me dibirin êşkenceyê û vedigerandin û me jê re digot li te çawa êşkence kirin? Eger bigota ”bi haweyê tirkî li min êşkence kirin”, ji xwe nema pêwîst dikir ku me lê guhdarî jî bikira. Me hema yekser fêm dikir ku çî afatî pê de anîne!

Ew tiştên ecêbane çibûn?

”Dadgeran ez bi haweyê tirkî ceze kirim!”

Ev dihat maneya ku dadger te ji kuştina sê-çar mirovan berpirsiyar girtiye, idam daye te û ne hiştiye ku tu bersiva xwe jî bidî.

”Mehmetçîkan li korîdorê bi haweyê tirkî çixareyek dan min!”

Tefsîra wê ev bû:

Mehmetan bi darê zorê çixare xistine destava wî û çixare di destavê de pêxistine. Bêguman di nav temamê miletan de wek hev tiştin exlaqî û kulturî hene. Îcar gava ku di nav temamê miletên cîhanê de kişandina çixareyê a ji qûnê, bi tenê di kultura tirkî de hebe, li gor min jî divabû girtiyan ji wê wahşetê re ”bi haweyê tirkî” bigotana.

”Bi haweyê tirkî îfadeya min sitandin!”

Neh-deh rojan xwarin ne dane wî û temamê canê wî bi lêdanê mîna hejîrê nermijandine. Dû re li erdê vezilandine, sê-çar mehmetçîk bêkeys li ser rûniştine, yekî pê li situyê wî kiriye û yekî jî di devê wî de mîztiye. Dû re jî îfadeya wî li gor dilê xwe nivîsîne û ewraq pê dane imzekirin.

”Bi haweyê tirkî girtin ser qawîşê!”

Seet li dor dudu an sisêyên şevê ye. Ji bilî girtiyên ku nobedarên qawîşê ne, herkes razayiye. Îcar tam di vê demê de bîst-sih mehmêtên wek bîst-sih beştan bi dar û zincîr ji nişkê ve dikevin qawîşê û xwe zer dikin girtiyên!..

”Bi haweyê tirkî qawîşa dehan êşkence kirin!”

Qawîş piçûk e. Sih-çil girtî tê de dimînin. Li dor heystê mehmetçîkên bi dar û zincîr dikevin hindurê qawîşê û ketûber li wan dixînin. Û dû re jî bi ser wan de dimîzin...

”Xelê bi haweyê tirkî li ser qeşê meşandin û ceze kirin!”

Şemitandin qedexe bû. Mehmetek li Xelê siwar hatiye, Xelê bêsenede li ser qeşê meşiyaye û şemitiye; dev û ruyê xwe bi xwîn kiriye û tiliya xwe a girdikê jî şikenandiyê. Cezeyê şemitandinê bi giştî bi lêdanê diqediya.

”Mele Şêxmûsê diyarbekirî Bi haweyê tirkî girar xwar!”

Bi Mele Şêxmûsê yextiyar qerwaneyek girara rijî dane xwarin! Mele ji hawhaw de ketiye û li ser çementoyê bêlept veziliyaye. Û bi ser de jî pê li zikê wî kirine! Girarê di jêr û jora Melayê me re diavêt!..

”Me îro li mehkemeyê bi haweyê tirkî destava mezin kir!”

Mehmetçîk pênc-şeş girtî xistine qedemgehekê, derî li ser wan vekirî hiştiye û gotiye hûn ê li ser pêyan destavê bikin!..

”Firavîna me a îro tam bi haweyê tirkî ye, ha!”

Ev dihat maneya ku di nav xwarinê de pîsî, mişk, xwê û hwd. heye.

”Bi haweyê tirkî dîlekçeyek bi min nivîsandin!”

Mehmetçîk dixwaze wî bi êşkenceyê bikuje. Îcar berî ku wî bikuje, pê dîlekçeyeke ku nexweşiya dil pê re heye dinivîsîne û dilekçeyê dişîne dadgehê.

”Bi haweyê tirkî rûvê min kur kirin!”

Rûvê wî şewitandine û jê re gotine ”Temena xwe xerab neke û nebêje ay ûy ay ûy!..”

”Mehmetçîk bi haweyê tirkî pirsê zewacê ji min kir?”

Ev dihat maneya ku mehmet dixwaze ya wî berde ser xwe û ya jî xwe

berde ser wî.

”Bi haweyê tirkî ez verşiyam!”

Ev dihat maneya ku bi lêdanê ji hinavên xwe xwîn beliqandiye.

”Bi haweyê tirkî ez diêşim!”

Pir êşkence xwariye. Canê wî ji êşa lêdanê dilerize, xwe li ber nagire û dixwaze xwe bikuje.

”Celalo bi haweyê tirkî mir!”

Li girtîgehê piştî ku mirov dikuştin, îcar kaxetek dianîn û digotin ”imze bikin ku hevalê we ji renzê ketiye û miriye”

Renze ji erdê bihustekê bilind e.

”Yaho mehmet, ma hevalê me hêk bû ku bişike, yaho!”

”Xwarina me bi haweyê tirkî li êgir kirine!”

Mazot xistine nav xwarinê û dibêjin ”Ûbneler, ava Diyarbekirê bi mazot e!..”

”Bi haweyê tirkî bikene!”

Ev dihat maneya ku divabû tu biziriya. Di vê zirandinê de ên nuhatî ji her kesî bêtir lêdan dixwarin. Dema ku mehmetên misilman li devê deriyê qawîşê bi mircaqan disekinîn û digotin ”tiro bikenin!” girtiyên ku nuh hatibûn, bi meseleyê nizanîbûn û dikeniyen. Mehmetan jî bi mircaqan êrîşî ser wan dikirin.

Ev tiştên ku min li jor rêz kirin, bi qasî têgihiştina min, ilm hemiyan wek ”kultur” qebûl dike...

Li girtîgehê di warê xerabiyê de tişteke belê tişteke ne mabû ku dewleta mehmetçîkên tirkên misilman ne fikirîbe û di girtiyên de ne kiribe!

Û bi ser de jî şêxên me ên bêşaşik, ”bi haweyê tirkî” li ber mehmetçîkan bûne lûlik ku mehmetçîk, ”birayetiya” kurdan qebûl bikin.

Ji ber ku derwêş jî selewat û tekbîran fêm dikin, ez ê jî di vir de bi haweyê derwêşan jî derwêşên bêerbane re, li ser kultura kurdan bi çend rukûban rabim. Lê berî vê ez dixwazim ku bi kurtî serpêhatîyeke xwe bibêjim.

Min bi salan feqetî kiriye û li ber destê şêx û meleyan xwendiyê. Ji van şêx û meleyên ku min li ber destên wan xwendibû şêxekî jê, pir bawerî bi

dewleta tirkan anîbû. Li gor wî tirk bi miletî ne dijminê kurdan bûn; di rojekê de wê hedayet bûbana û birayetiya kurdan qebûl kiribana. Şêxê min ê qosarî jî ber wê baweriya xwe, bêyî ku bizanibe bê çi dike, bi tevger û dan û sitendina xwe tam bûbû nûkerê dewletê jî.

Kêfa şêxê min tişteki zêde zêde ji siwarbûna keran re dihat. Di sala ku min li balê dixwend, hema hema her roj me ê digel kera wî a şînbozî xwe berdaba binya Qosarê (Kiziltepe); min ê bi hefsarê kerê bigirta, ew ê siwar bihata û em ê têketana ser rêya Birehîmyê. Di wê navê re jî çîrokên li ser keran ji min re digotin...

Piştî feqetiya xwe bi gelekî, li gor rîwayeta ku ez jî di wê demê de bûme 'sosyalîst -efndî', ez ê bi mêhvanî herim mala şêxê xwe, li ser dan û sitendina wî a bi mehmetçîkan re vê serpêhatiya xwe jê re bibêjim û ew ê jî pir bifikire.

” Şêxê min ê delal, di sala 1974-1975an de li qeza Îzmîrê li Ayvalikê ez û grûbeke hevalên xwe ên şoreşger em li nav darên zeytûnan bûn; me dixwar û vedixwar û em li ser şoreşgeriya kurdî dipeyvîn. Hevalên min hemû tirk bûn. Bi kurtî, di wê dema ku me tam daye hev û me li hev sincirandîye û hema min dît ji nişkêve kerekî wek ên bismiliyan mezin, rikêbî ser min kir. Ez jî ber reviyam. Kerê ku diranê xwe qîç û guhên xwe jî miç kiribûn, digel ku hevalan jî êrîşî ser wî kirin, ji ser min venekişîya û da ser piştî min. Bêmefer min xwe avêt ser dara zeytûnê. Ker li dora darê çû û hat û dev li newqa darê kir. Dar kevajt; kêlekên xwe di darê de bir û anîn û dar hejand. Eger hevalên min nehatana bi min ve, miheqeq wî kerî ez li wir dikuştim û dû re jî ez dixwarim...”

- Yanî tu dibêjî gava ku ker ewqasî dijminê kurdan be, wî çaxî jî gerek mirov bizanibe bê xwediyê kerê çendî dijmin e, ha?

- Erê.

Piştî derbeya îlona sala 1980î, mehmetçîk wê şêxê me li ser ku bi kurdî ders daye feqeyan bigirin, li Tûgaya Mêrdînê bi ser şaşîk û cubeyê wî de bimîzin, têra wî lêxin û dû re jî rêyî girtîgeha Diyarbekirê bikin!..

Şêxên me ên bêşaşîk û cube ji bîr dikin ku gava mirov bi exlaqê xwe, terbiye û qeweta xwe bi ên li himber xwe ne bû wek hev, wê ew birayetî jî koletî be. Îrlandî û inglîzî, baskî û spanî jî ber ku dişibin hev, dikarin bibin 'birayên hev' jî. Lê kurd hîn jî bi destan û tirk jî bi kevçî xwarinê dixwin. Kurd "lolo bira" û tirk jî "lan zirto" dibêjin: Kurd dilkeçîkî û mêşînî û tirk jî aqilşeytanî û şemûsî ne. Kurd berê xwe didin Mihemed û tirk jî berê xwe

didin Atatirk û limêj dîkin. Dengbêjên me wek eskerên ku qomandar di ber wan re derkeve, di temenê de û ên wan jî wek qomandarên ku li Kurdistanê şer dîkin, di ber sitiranên xwe re dansê dîkin. Kurd eniya jina xwe û tirk jî lêvên jina xwe maçî dîkin. Kêfa me ji meyrê, îsotê û pîvaz û sîrê re tê û tirk jî ji van tiştan îlallah dîkin! Hema li ser pîvaz û sîrê jî mabe em ê nikaribin bibin birayên hev. Kurd xwe li ser piştê û tirk jî xwe li ser zik pal didin. Û li gor dînê islamê jî paldana ser piştê pêxemberî û a ser zik jî şeytanî ye. Gelo ev şêxên me ên bêrîh, hîç fikirîne ku dinya jî rabe, wê pêxember û şeytan nikaribin bibin birayên hev! Ew qebûl bikin jî Xwedê wê qebûl neke. Dînê serhediyên bi çûrtên û îmana botiyên jî bi penêrê sîrikî ve ye. Baş e, gava yekî ku bêhna sîrê jê bê, ma mirov dikare li ba rûne, hi? Dapîra min şahreke botanî girêdide û tirk jî qebûl nakin ku pîrê bi wê şahre li Beyoxlû û Tarlabasî bigere. Îcar ka em çî bikin ji pîrê? Ma em wê jî bikujin û wek xwediyên '33 imzeyan' xayîn ilan bikin? Ez ê bi tirkan re tu carî nikaribim 'tîvîste gel' bibêjim. Navê keça min Pelda û navê a wan jî Tansû ye. Ê ne êz ê navê Pelda nekim Tansû. Sitiranên me li dor nîv seetê û ên wan jî li dor sê-çar deqîqeyan digirin. Hema berî hertiştî wê tirk di televizyonê de rê nedin ku em bikaribin heta bi dawiyê li sitiraneke xwe guhdarî bikin. Em divê bi çend programan derkevin televizyonan. Goyî û mamxurî û herwekî din hîn jî bi çarox in. Û tirk jî nahêlin ku mirovên bi çarox bînan meqamên wan. Gelo ev şêxên me ên ku habela feqeyan diricimînin, wê bikaribin ev ên me bi qundere bikin? Ez naxwazim ji tirkan re eskeriyê bikim; lê gava wan birayetiya we qebûl kir, îcar hûn ê jî ji bo neçûna eskeriyê, min 'murtud' ya jî 'muxerebîn' ilan bikin. Tirk li zirnê naxînin û kêfa kurdan jî ji zirnê re tê. De ka şêxên mino, hûn ê vê yeka ha çawa safî bikin? Tirk ji mirîdiyê aciz in û kêfa me kurdan jî ji mirîdiyê re tê. Ma em ê bê hucetulislam an pêxemberulzeman bikaribin bijîn, gelo? Tirk kitêbên pornoyî dinivîsînin; ê me yekî di neqeba wê û wî de kitêbek nivîsand me ew dîn kir. Xwe hazir dike ku ji ber me bireve Emerîkayê. Lê min jê re got here Efrîkayê. Yanî li cîhekî wek Swêdê jî jê re sitar ne maye. Kurd di dawetan de dilîlînin û tirk jî difikînin. Cidên me, hema ku we lîlandina me kire fikandina tirkan, em ê bi tirkên we re xweş bikaribin bibin birayên hev jî. Di govendê de tiştêkî kilêt e ku kurd tilmîqûnên xwe biricifînin; lê tirk jî vê tilmîqûnê wek kodika êş dilerizînin. Şêxên mino ez bi qurban, wê qîma tirkan neyê ku em jî wek wan lê nexin. Hema ji serî de li ser vê meselê jî mabe wê lihevhatina we bifeşkile. Ez baş baş kurdan û Kurdistanê nas dikim. Ji bilî çend serxweçûyên rihayî, ez bawer nakim ku kurd bikaribin ji navîkê û berjêr de xwe bikilên. Dinya jî xerab bibe, cizîrî

dev ji pênerê sîrikî bernadin! Em wek hev nagirîn, nakenin, napeyivin, naxwin û venaxwin û em ê bibin birayên hev, ha(!) Wilo birayetî nabe hezret im. Bibexişînin, hûn xwe dixapînin û serî li milletê me jî digerrînin!

Şêxên me ên ku di bin girarê de goştê mirîşkê nabînin, hertiştên me serûbinî hev kirine. Hertiştên ku di kultura me de, me wek rûmetê dizanîbû, hemû bi hawayê bêrûmetiyê rave kirine! Derew bûye rastî, tirsonekî bûye mêrxasî, rev bûye liberxwedan, daxwaziya serxwebûn û azadiyê bûye îxanet, berdoşekî bûye maqûlî, efûxwestin û serîdanîn bûye mezinahî; cihê bêbextan di civata me de tunebû, bêbext li cihê herî bilind rûniştine. 'Eşek oxlu eşek' bûye aslan oxlu aslan, 'zirto' bûye beyefendî, 'rezîl' bûye wezîr, 'zuppe' bûye efendîcixim, 'soytarî' bûye şahim û hwd. Îcar gava tu li himberî 'Eşek oxlu eşek' û 'Rezîl' û 'şerefsîz' derdikevî, ji te re jî "bergîlî ye fê m nake", dibêjin. Dû re jî zir pelxemekê di te de werdikin "ew siyasetê dike yaho, tu çima ji teqîkan fê m nakî haho!.." pê ve dizeliqînin û bi masmedya xwe re êrîşî ser te dikin. Di kultura me de 'ji bo siqêfekê heft mêr dihatin kuştin!' Lê îro?.. Kultura me talan bûye!

Hinekî jî li gelê me guhdarî bikin bê gel çî dibêje. Gel wilo dibêje:

"Di nav xwarina tirkî de jahr, di nav vexwarina wî de zîro û di nav livînên wî de jî mar heye! Îcar em ê çawa bi hev re bixwin û vexwin û razên!" De şêx im, bi wan re bibin yek ku hûn tiştên me ên mayî jî di Pira Selatê de werin.

Wê çawa bibe?

Bi vê lihevhatina şeqlovîzkî, dewleta tirkî dibe ku ji herkesî bêtir navê kurd û Kurdistanê di nav dinyayê de bîne zimên û li wan xwedî derkeve. Lêbelê ew ê vê yeka ha jî bi hawayê tirkî bike. Yanî ew ê bibêje ku "Kurd hene, lê fizîkî tune ne! Kurdistan heye, lê kes nizane bê li ku derê dinyayê ye!" Bav û kalan bi derewan ne gotine "çov ji çov vedigere!"

Mehmetçîk dibe ku bi vê lihevhatina şêxên me ên bêper û bask, di rojekê de rê bide zimanê kurdî. Lêbelê ew ê jî bi hawayê tirkî be. Yanî wê kurdî bi kurdan li gor hejmara tîpên elfabeya xwe bi kar bîne û destûra ku kurd ji welat re velat, ji êvarê re evar, ji qutiyê re kutî, ji Qelşo re Kalşo û hwd. bibêjin, bide. Mehmetçîk û xelkê xwe dibe ku di rojekê de bibin sosyalîst-efendî. Lêbelê sosyalîzma wan jî wê bi hawayê tirkî be. Yanî ew ê hertiştî berevajî hev bikin û bimeşin. Bav û kal dibêjin "Dîn dîn dibîne, debûzê xwe di bin qêpût de vedişêre" Îcar tew dijminên milletê me ne dîn, zir dînin, cidên me! Disa ez ê bibêjim ku ne îrlandî ji kurdan û ne jî tirk ji ingilîzan bi hêztir

bûn. Lê ÎRAYê pišta ingilîzan tewand. Dewleta Spaniyayê ji a tirkan bi qewetir bû û ETAYê jî ew deverû bire erdê. Hema demeke kurt be jî serê xwe ji dêvla birayetiya bi tirkan re, li ser nebirayetiya bi wan re biêşnin, hûn ê bibînin ku heta bi Emerîkayê jî wê nikaribe bi miletê kurd.

Miletê misilman nikare bibe humanîst û dû re jî sosyalîst -efendî. Îcar nexasim ku ev milet tirk be! Lê şêxên me kirine serê xwe ku bi çi hawayî mabe jî divê kurdan bikin birayên tirkan. Ji bo ku hûn bigihên meqseda xwe:

Heta ku hûn jî bi qasî tirkan bi hêz nebin, wan jî bi qasî ku em hatine kuştin nekujin, pîs û talan û bêşexsiyet nekin hûn ê tu carî bi wan re nikaribin "wek bira" bijîn. Li gor min, rêyên wê qonaxa pozbilind jî ev in: Pêşî bibin miletperwer û dev ji her tiştên bi tirkî berdin. Li xwe vegerin. Di mala xwe de bi zarokên xwe re bi kurdî bipeyivin. Bi vê yekê hûn ê karekerekî kurdî bi dest bixin. Ji ber ku karekerekî we bûye ê tirkan, tirk di çavên we de mezin û kurd jî piçûk bûne. Ew zir mezinahiya tirkan(!)hiştiye ku hûn miletê kurd qels û di doza xwe de jî kewaşe bibînin. Li xwe vegerin û bibin kurd; hûn ê bibînin bê hûn ê çiqasî nefretê ji mehmetçîkan bikin û ji xwe fedî bikin ku bi tirkî bipeyivin. Mesele ji ber ku ez wek kurdekî dihizirim û tirk jî her roj sê-çar insanên me dikujin, ez ji xwe fedî dikim ku ez bi tirkî bipeyivim. Li xwe vegerin ku hûn bi qeweta hêza xwe bizanibin! Li xwe vegerin; bi qasî ku hûn ê li xwe vegerin hûn ê ewqasî jî nefretê ji mehmetçîkan û bi qasî ku hûn ê nefretê ji mehmetçîkan jî bikin hûn ê ewqasî jî ji miletê xwe hez bikin. Kurdî hîn bibin ku hûn exlaq û karekerekî kurdan zêft bikin û ji tirkan netirsin. Miletê kurd, miletêkî henûn e û li gor ilmê psîkolojîyê jî karekerekî henûnan, pozîtîv e. Eger vî karekerekî henûn heta niha bi miletî tiştêk bi dest ne xistibe, ev sûcê nezaniya me ye. Karekerekî pozîtîv gava zane bibe, dikare gelek tiştên hêja bike. Kurd bi vî aliyê xwe miletêkî pir mezin e! Lê mixabin şêxên me ên tarikselat, hîn jî ew mezinahiya wî fêhm ne kirine. Ev yek. A duduyan jî ji ber ku wê mijar ji guhera kulturê derbasî guhera siyasetê bibe, ez ê nebêjim. Eger masmediya terîqetiyê rê bida, min ê jî bi kêfxweşî dîtînen xwe bianîna zimên.

Perçeyek ji kitêba min a ku sê-çar sal in min li ser Zindana Diyarbekirê nivîsiye û çapxaneyên kurdan jî ji tirsê şêx û mirîdan newêrin çap bikin

27) Razan

Li girtîgeha Diyarbekirê razan jî bi hawayê tirkî bû.

Girtiyên piştî ku şîv dixwarin, hema ne bi gelekî, divabû raketana. Seeta raketinê bi giştî li dor heyştan bû. Gotina ku dibêjin "xew û mirin yek e", li

girtîgehê derbas ne dibû. Girtî divabû şiyar-razayibûna. Yanî him razayî û him jî şiyar bûna. Wilo çawa dibe nebêjin, wilo gava bi haweyê tirkî be, dibe!

Li gor qanûnên mehmet, herkes divabû li ser piştê di temenê de (esasduruş) raketiba. Mirovê gava ku di xew de temene xerab dikir û xwe diqulipand ser tenîstekê, lêdan dixwar.

Di dîwarên qawîşan de zeraqe hebûn. Mehmetçîkan di van zeraqeyan re nahtorî li xewa girtiyan dikirin. Mirovê dema pixe pix jê bihata, di xew de bixaxiviya, çongên xwe têxistana zikê xwe, lingên xwe bilebitandana, xwe bixuranda, bêvila xwe paqij bikira, bikuxiya, tir kiriba û hwd. divabû sibehê hesab bida gardiyanê qawîşa xwe. Lê mehmetçîkan bi giştî bêyî ku hesab ji gardiyanê qawîşê re berdana, her şev diketin hindurê qawîşan û wan bi xwe ew hesab distendin.


Min jî wek gelek kurdan ji destê mehmetên ku rojî digirtin û limêj dikirin hawe bi hawe êşkence kişand. Lê bi rastî du haweyên êşkenceya mehmet ne dihatin kişandin! Yek, gava ku hişk bi gunê mirov digirt û badida! Te digot qey em nêrîbûn... Dudu, gava ku mirov di xew de bû û wî bi dar mirov ji xew şiyar dikir! Belkî jî ji ber wan sebeba ye ku ez ê tu carî nikaribim mirovekî 'îtîrafçî' mehkeme bikim. Me kurdan gotinek heye dibêjin, "Dîtin û gotin nabe wek hev." Hema xwe bikujin û nebin hêsîrê destê tirko!

Ji destê wê wehşetê hin girtiyan ji bo ku temena wan xerab neba û mehmet ew saqoçermî ne kiribana, xwe bi renzeyan ve gindorkî girêdidan. Di qutîk û kîsikên naylonî de dirîn û dimîztin. Û digel wê pîsiyê jî radizan. Qeryoleyên hêsîran di salên wehşetê de eskerî û du qatî bûn. Kesekî ne diwêrîbû li qata jêr raketa. Ew jî ji ber ku ji jor de mîza hevalê wî ne herikîba devê wî. Lê mixabin digel wêqas tedbîra me a herî mezin, dîsa jî me mîz diherikand devê hev. Û heta pîsî jî...

Ji komelê

Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê, di çarê meha nîsana sala 1999an de, li ser standardîzekirina zimanê kurdî semînerê amade kir. Gotarvanê semînerê Maykil Çayed bû. Maykilê kurdolog û sernivîskarê beşê kurdî yê radyoya Dengê Emerîkayê, digel tecrûbeyên xwe û bi haweyekî têgihîştî li ser herçar zaravayên kurdî rawestiya. Li gor Maykil, her roşenbîrê ku bi zaravayê xwe dipeyivî, divabû pêşî baş bi zaravayê xwe bizanîbûya û digel vê yeka ha jî di hindurê zaravayê de ji zaravok an devoka xwe bireviya û zaravayê xwe pêşî standardîze bikira. Û dû re jî ber bi standardîzekirineke miletî bimeşiyana.

Semînera ku li Federesyona Kurdî a li Swêdê pêk hatibû, bi 60-70 kesî ve li dor sê seetan dom kir. Maykil, li semînera xwê bi pirs û bersivan dawî anî.



Ji weşanên nuh

Integration i mângafald

Osman Aytar piştî ku li universîta Stockholmê beşê sosyolojiyê diqedîne, teza xwe jî wek kitêbekê amade dîke. Aytar di vê kitêba xwe de bi rêya bikaranîna anketekê ku ji şeş grûbên penaber (kurd, latînerîkî, îranî, polonî, asûrî/suryanî û tirk), 1026 kesan himbêz dîke, pîrsa întegrasyona penaberan ji aliyê teorîk û emprîk ve rave dîke. Ev kitêba ku di nav weşanên Jîna nû de delal hatiye çap kirin, ji 117 rûpelan pêk tê.



Li Mala Mîr Celadet Alî Bedirxan

Firat Cewerî bi vê kitêba xwe xwestiye ku bibêje, eger li vê dinyayê ji bo kurdan tiştekî miqedes hebe, ew jî zimanê kurdî ye; bi hinera wî zimanî ye ku ew mîletê kevnar ji qada dîrokê ne ketiye. Di sala ku Fîrat li Sûriyê dibe mêhvanê Rewşen Xanimê, hizir dîke ku bi Mîr re bi haweykî hevpeyvînî kitêbekê binivîsîne. Cewerî di hevpeyvîna xwe de bi serketiye û tiştê ku xwestiye bide, tam jî daye. Lê xwezîka di sûretê ku li himber Mîr de çongên xwe avêtine ser hev, Mîr jî bi sûretekî çongavêti pêşkêşî me kiriba. Kitaba wî a ku ji teref Nûdemê ve sîpêhî çap bûye, 128 rûpel in.




Sê Şev û Sê Roj

Laleş Qaso di vê romana xwe a civakî de, biravekirina zilma dewleta tirkan re pîralî civaka kurdan daye ber xwe û bi civakê daketiye. Ji dawiya romanê xuya dîke ku wê hîn çend romanên girêdayê vê romanê bên. Sê şev û Sê roj di nav weşanên Nûdemê de hatiye çap kirin; 328 rûpel in.

Çiroka Malbata Evdo

Firat Cewerî di vê kitêba xwe de, serpêhatîyeke ku ew bi xwe jî tê de jiyaye wek helbest nivîsiye. Li gor normên helbestê kitêb bi serketiye. Ji bal Nûdemê ve hatiye çap kirin û 120 rûpel in.



Hejmara nû ya Havîbûnê derket

Havîbûn kovareke ku bi herfên erebî li Berlinê derdikeve. Nivîsên wê bi kurdiya bakûr û başûr in (kurmancî û soranî), beşê kurdiya bakur zêdetir e. Ev kovar "Kovara projê kurdologî ye li Zankoya Azad a Berlinê". Ji rûpelê pêşîn em van agahdariyan dixwînin: Semivîser: Salimê Casim Rêveberê nivîsînê: Kerîme Biyanî Rêveberî: Muhsên Osman Derhênaana hunerî: Guhdar Bezaz Piştgirên kovarê: D[r]. Emîr Hesepûr (Keneda), D. Burhan Yasîn (Swêd), D. Dilşad Seîd (Nemsa), D. Umer Şêxmûs (Swêd), D. Memo Osman (Elmanya), D. Nûrî Talebanî (Bîrîtanya), D. Ordîxanê Celîl (Ermînya), D. M. Ebdurrehman Mizûrî (Elmanya), D. Ferhad Îbrahîm (Elmanya), D. Nezend Begêxanî (Bîrîtanya), D. Yûsif Zengene (Bîrîtanya)

Hejmara pêncan a Havîbûnê (1999) 224 rûpel in. Hin nivîsên vê hejmarê ev in:

-D[r]. Celîlê Celîl, Kurd Li Serdemê Ciwanturka (1908-1909)

-D. Ferhad Îbrahîm, Hevrikiya Êtnî, Texên Civakîyên Têpeser û Tundrewî: Li Dûr Projê Rizgarîxwazê "Partiya Karkerên Kurdistan" PKK

- Salimê Casim, Rewşa Siyasî û Civakî Li Kurdistana Osmanî Di Nameyên Hêlmût Fon Moltkê da

-Mihemedê Mele Ehmed, Bedirxan Beg û Filehê Tiyarî

-D. Zorabê Bodî, Jiyana û Dînnasîya Şêx Adî Bîn Misafir

-D. Nûrî Talebanî, Binemaley Şêxanî Talebanî

-D. Mihemed Mukrî, Meseley Donaydon û Kewlgorrîn Le Lay Ehliheqekan

-Muhsên Osman, Nuyxazî Di Xelek û Çaxên Xêlekîyê da

-Mihemed Ferîq Hesên, Mergî Taqaney Duwemim Xwêndewe

-Seîd Dêreşî, Hêşetê Di Felsefa Feqiyê Teyran da

-Kerîme Biyanî, Rêguhurk

-Ebdulayê Cindî, Çar Kurteçirok Şêrzad Heynî, Hewlêr Ta Dîblin




Adresa Havîbûnê: Freie universität Berlin, Havîbûn

C/O Kurdistan AG

Kiebtzweg 23

141 95 Berlin



Kurmancî, hejmar 1-20, Ferhengoka kurdî, tirkî,

fransîzî û îngilîzî (Berhemên civînên Kurmancî yên

Enstîtuya kurdî ya Parîsê), Weşanên Apec, 1999

Ji vê navnîşanê hûn dikarin vê kitêbê peyda bikin:

Apec Förlag

Box 3318, 163 03 Spånga/Sweden

Tel: 08-761 81 18 * Fax: 08-761 24 90

e-mail: apec@swipnet.se

Ji Weşanên Apec'ê
çîroka folklorî ya kurdî bi swêdî û kurdî

Kitêb bi wêneyên
rengîn hatiye
xemilandin.

Gumman och räven

Kurdisk folksaga

återberättad av

Bilal Görgü

Illustrerad av

Ulf Löfgren



Pîrê û Rovî


(Çîrokeke gelêrî ya kurdî)

Berhevkar:

Bilal Görgü

Wêne:

Ulf Löfgren



*Hûn dikarin li vê
navnîşanê peyda bikin:*

Apec

Box: 3318

S-163 03 Spånga

Sweden

Tel: 08-761 81 18

Fax: 08-761 24 90

e-mail:

apec@swipnet.se